- Komela me gava pêşî avît, ku înformasyon (agahdarî) û nûçe liser dînê Êzîdîtiyê li sala 1996 di Internetê de, ya ku teknîka pir pêsketî ye, werin weşandin. Îro li her çar anîşkên dinyayê pir mirov liser ola me tiştên dirist û ji devên me dibhîzin.
- Xebata ciwanên me û guhdana wan jibo parastina ol, çand û beşên civakî roj bi roj bi pês ve diçe.
- Ji me re serbilindî ye, ku mafên jina Êzîdî her tên parastin û ew ciyê xwe di nav komîta birêvebira giştî de digre.

www.arsivakurdi.org

Guhdan û lêxwedîderketina komela me jibo çareserkirina pirsgirêkên mirovên me yên penaber ji hemû beşên welat. Bi giranbihabûna Komela me ji aliyê mehkima û dayîrên dewletê ve karê gelek Êzîdiyan çûye serî.

Her zehmetiya mezin di rêya berdewamiya karê me de ev bû, ku berî niha em mecbûr bûn civîn û cejnên xwe her car li ciyekî din pêk bînin.

Jibo ku em bikaribin xebata xwe bi serfirazî bimeşînin me berî 2 salan biryar stand, ku malek were ava kirin. Û her wiha komelên din jî ciyên xebatê, yanî mal ji xwe re kira kirin.

Bi dîtina me bê hêlîn û mal emê hin bi hin bi hêla hundabûnê ve herin. Bi sedan xort û keçên me dê pista xwe bidine me û berê xwe ji ola xwe biguharin û ev jî mirina ola me ye. Ji me giştan re diyar e, ku zarokên me pêşeroja me ne, xort û keçên me çira û ronayia rêya me ne. Em ji welatê xwe dûr ketine û em tev di gemiyekê de ne. Ev gemî ketiye bahreke pêl bilind. Heke em destên hev negirin, emê liber pêlên avê herin.

Lê em ji we naveşêrin, ku piraniya gelê me û heya hindek dost û endamên me digotin, ev karekî pir zor e, dê pir mesref lê here.

Lê me di nav dilê xwe dida û digot, ev kar çiqasî zehmet be jî, nayê beremberî dilopek xwîn, yaku bav û kalên me di ber ol û axa xwe de rijandine. Pêwist e, em zanîbin, bê bav û kalên me çiqas cangorî dane û 72 ferman bi serê wan ve hatine. Gelek caran mecbûr bûn, ku ew ciyê xwe berdin, lê her dem dînê xwe parastin û serên xwe ji xêrnexwazan re netewandin û xîret her dem al û bayreqa wan bû.

Pişta me bi gelê me germ ye, ku tifaq û xîretê dikişîne, û xwe di ber vî karî de diwestîne.

Bi vê eynetê me plana kar danî û qesta miletê xwe û dezgehên elman, yên perpirsyar kir. Gelê me tu kêmasî nexist beşê darayî û bi eşq û destvekirî alîkarî dane vê malê. Xwedê û Tawisî-Melek xêra wan qebûl bike. Gelekan jî lêvên xwe li me xwar kirin û em dikarin bibêjin astengî jî li me kirin. Dîsa em ji wan re jî dibêjin "Her mala we ava be". Hêna jî dergehê ardimetiyê vekirî ye. Em bi hewceyî alîkariyê ne.

« Ev Mala Êzîdiyan dê her dem di xizmeta parastin û pêşvebirina Êzidiyatiyê de be. Em hêvîdarin ev navend dê bibe mîsal û mînak jibo avakirina Malên Êzîdiyan li bajarê din, dê bibe nîşana tifaqa Êzîdiyan. »

Me di vê avakirinê de zehmetî kişand. Heya em dikarin bibêjin, ku xewên şervan li me hisret bûn û her dem di xema vê malê de bûn. Heke ne bi alîkariya xemxwarên gelê me û pistgirya wî be, ticar me nikarîbû vî karî bibine serî. Li vir û di hizûra we de em careke din sipasiya wan xîretkêşan dikin, yên hem bi xêran û hem jî bi krêdît alîkarî kirin.

Disa jî em sipasiya wan kesan dikin, yên bi xûdana eniya xwe alîkariya avakirina vê malê kirine. Heke em navên hemiyan bibêjin û ev jî mafê wan e, dê pir nav werin ser ziman. Bi destûra we emê du navan bibêjin:

Yek ji wan mihendizê me yê delal û hêja Hikmet Tolan e. Yê din jî Îrfan Yavuz, bavê Canê ye. Van herdo xortên çeleng sinorê alîkariyê derbas kirin û bûne pêşeng ji me giştan re.

Disa jî sipasiyeke mezîn jibo endamên me re. Bi xêra We vaye Mala Êzîdiyan temam bû.

Ev bûyereke tarîxî ye, û dê me bi ruyekî sipî û bi serbilind derbas bike sedsala 21. Em di vê baweriyê de ne, ku ev mal dê bibe hêlînek anjî sitarek jibo me, dê bibe ciyê Di`ayên me, Biskhilînên me, Terqîn û Nasîn û Seremerga me, dê bibe ciyê zarokên me, dê bibe navendeke rewşenbîrî jibo Çand û Ola me. Ev Mala Êzîdiyan dê her dem di xizmeta parastin û pêşvebirina Êzidiyatiyê de be. Em hêvîdarin ev navend dê bibe mîsal û mînak jibo avakirina Malên Êzîdiyan li bajarê din, dê bibe nîşana tifaqa Êzîdiyan.

Gelî xuşk û biran, erê me hêlîn ava kir lê belê ev hêlîn divê ji mirovan were dagirtin, çi xort, çi keç, çi kal û çi ciwan. Lewma em hevî û gaziya xwe dighînin dê û bavan, ku zarokên xwe bişînin qurs û semînarên zimanê kurdî, naskirina Êzîdîtiyê û irf û edetên me.

Em bihevre bi qewet in.

Navnîşana têkiliyê

Mala Êzîdiyan
Eidechsenstr. 19, D-26133 Oldenburg, Germany
Tel:+49-441/4850555,
Fax: +49-441/4850557
E-Mail: info@yezidi.org
Malper: www.yezidi.org

www.arsivakurdi.org

Ji me re diyar e: Avakirina Mala Êzîdî li Tirkiyê, Sûryê û merkeza Îraqê de tucar pêknayê

IRINA WIESSNER

Seroka gistî ya Civaka jibo Parastina Mafên Gelên Bindest û Kêm li Almaniyayê.

Jibo cejna vekirin û xebata Mala Êzîdiyana yekemîn li Ewropayê ya civata Êzîdiyan, ya ku kevir bi kevir bi destên Êzîdiyan hatiye avakirin, li bajarê Oldenbûrgê di 22.06.2001 de.

Ew dilxweşiya mirovên beşdar û bendewariya wan jibo vekirina vê Malê li bajarê Oldenbûrgê, ciyê ku endamên komîta Birêvebir silav li mîvanên xwe dikirin, tam ligorî vê bûyerê bû: Bi rastî jî ev cara yekemîn e û weke wê tinine, ligorî gotinên serokê komîta birêvebir Telim Tolan yên di hevokên pêşîde ji gotina xwe ya bixêrhatînê hatin ser zimên. Her wiha serokê Malê digot: "Ez weha bawar im, ku ev vekerin, bûyereke lêhêjaye, jiber ku me Êzîdîyan ligel kêmbûn û hindikbûna xwe jî bitifaq û tevayiya xwe ev tişt pêk anî.

Ji vê baweriya hêja û rawestandina rind û bingehîn, gotina serokê komîta birêvebir hatibû nivîsîn û xwendin: Bi serbilindî serokê vê Malê Telim Tolan dabû xwiya kirin, ku çawa endamêm Malê (Êzîdî), dost û dilxwazên vê Malê yên Ne-Êzîdî bi xwêdana pêçavên xwe ev Mal ava kirin. Serok spasî hemû mirovên destên xwe avêtibûn karê avakirinê û alîkariya wê bi mal û xwedanê xwe kirin, biteybetî serokê bajarê Oldenbûrgê birêz Alfrêd Nêhrîng, endamê parlamentoya federal birêz Dietmar Schütz, şêwirdarên serokatiya bajêr, berpirsyarê besê çandî Dr. Ekkehard Seeber û endamên partiyên di parlamento de, yên bi hejmareke mezin amade bûn.

« Tiştekî ecêb lê di eynî dem de tiştekî bi rûmet me li wir dît, yê dihêle ku beşdarbûna li semînaran lê hêja be: Vê Mala Êzîdiyanê Dêra Katolîkî û Protestantî vexwendî vê Malê kir û sembola herduyan li milê çepê û rastê ji nîşama Tawîsî-Melek daleqandin. »

Di gotara serokê Malê hate diyar kirin, ku Êzîdî yên di welatê xwe de her bendestî, rebenî û çavsorî ji aliyê xêrnexwazan dîtibûn, tucar qenciya vî welatî - Almanya - vî bajarî û van mirovên ew hewanden ji bîr nakin û dê her dem di bîra wan de be û westandîna tu mirovî winda nabe.

Di vê derheqê de navê malbata (jinûmêr) Prics û Lêhmann hatin ser ziman ji bedêla wan mirovên hêja, yên bi hemû kar û xebata xwe histin, ku Êzîdî mafê mabûn û penaberiyê bistînin. Serokê Malê sê (3) nav ji warê lêkolin, mafê mirovan û siyasetê anîn ser zimên: Gernot Wiessner, ew profesorê jibo dîroka olan û yê di sala 1999 çuyî dilovaniyê. Vî mirovê hêja bi rapora xwe liser Êzîdiyan kir, ku baweriya dezgehên berpirsyar baweriya xwe ji kok ve biguhêrin û pêwîst bibînin, Êzîdiyan li vir behêlin û mafê penaberiyê bidine wan. Ew rapora wî, ya di sala 1982 ji dezgeh û parêzgeran re hate şandin, bû weke bingehekê jibo qebûlkirina Êzîdiyan. Her wiha birêz Tolan navê Civaka jibo Parastina Mafên Gelên Bindest û Kêm û berpirsyarê wê birêz Tilman Zülch û mirovên li dorê anîn ser ziman.

Lê berî hemû kesî navê wezîrê hundir yê komara herêma Nordrhein-Westfalen Dr. Herbert Schnoor û alîkarê wî Hans Engel bilind kir. Biryara vî wezîrî bûbû weke kevirê bingehîn di dîroka Êzîdiyan de ya demkurt li Almaniyayê. Ev wezîr ligel alîkarê xwe çûbû warên Êzîdiyan li welat û derdora Midyad û Beşêriyê. Wî zilm û zora liser Êzîdiyan bi çavên

www.arsivakurdi.org

serê xwe dît, wî dixast hînbibe, ka gelo ev raporên liser rewşa Êzîdiyan hatinbûn amde kirin, rastin anjî na. Pistî vegera wî ya Almanyayê, derxistinan Êzîdiyan ji Almanyayê hat seknandin, Schnoor ji bidestxistana hekê sekinandina Êzîdiyan li Almanyayê û jibo naskirina zulm û zora liser Êzîdiyan ya wek grubek olî xebat kir. Qebûl kirina mafên penaberiyê jibo hemû Êzîdiyan li vî welatî bû encama vê xebatê.

Ew xweşiya di hemû gotarên mêvanan de, heya bi gotarên siyasiyên cudabûna vê bûyerê ji bûyerên din dabû xwiya kirin. Berî niha her şevên wisa tije lom, kul û gazin bûn. Ligel ku kit kit hevokên bi rexne ketin guhên me û bi teybetî zehmetkêşiya di pêla pêşî de ya ku Êzîdiyan ji destên berpirsyarên alman jibo plana avakirinê û kirîna erda vê Malê dîtibûn û Êzîdî her biser diketin, ev vekirin dê bibe dîrok ji me gistan re.

Bajarê Oldenbûrgê bi rastî jî bûyê warê çanda gelan: Hebûna Mizgefteke misilmanan, kinişteke (Dêreke) Cihûyan, Mala Bûdiyan, Mala Behaîyan û niha Mala Êzîdiyan didine xwiya kirin , ku ev bajar roj bi roj di warê çandî de gavên mezîn davêje û her ji hemû ol, bawerî û çandên din re vekirî ye.

Di gotara serokê komita berêvebir hate diyar kirin: "Avakirina Mala Êzîdî li Tirkiyê, Sûryê û merkeza Îraqê de tucar pêknayê û dûrî raman e". Ji nava çalakiyên vê Mala Êzîdiyan: Semînarên liser perwerdebûna zarokan anjî liser ol û çanda Êzîdiyan û pezindana mêrxasan - her roja yekşemê ji heftîyê. Ev dê warê Êzîdiyan yê nû perçe bi perçe û hin bi hin nêzîktir bike.

Tiştekî ecêb, lê di eynî dem de tiştekî bi rûmet me li wir dît, yê dihêle ku beşdarbûna li semînaran lê hêja be: Vê Mala Êzîdiyan Dêra Katolîkî û Protestantî vexwendî vê Malê kir û sembola herduyan li milê çepê û rastê ji nîşama Tawîsî-Melek daleqandin. Ev dide xwiya kirin, ku Mala Êzîdiyana Êzîdiyan dixwaze pêwendiyên xwe bi piraniyê kûrtir, berfirehtir û xwirtir bike.

« Bê zêdebûn karûbarên ku ev Mala Êzîdiyan li bajarê Oldenbûrgê pêk tîne, pir giranbiha ne, ligel ku Êzîdî kêm in û heke em van karên han bidine ber karên rêxistinên misilmanan yên hejmara wan ne hindik in. »

Û herwiha ev Mala Êzîdiyan mêvandarê seveke danûstandinê (axiftinê) liser pirsgirêka mirovên welatê xwe berdidin û têne welatên biyanî û hesanîkirina jiyana wan di warê wan yê nû de. Ev şev ji aliyê Dêra Protestantî û Katolîkî ve hat çêkirin. Di vê civînê de metranê berê yê herêma bakurî Elbê birêz Kohlwage jî besdar bû. Endam û berpirsyarên vê Komelgehê her seminar û gotar liser ol, çand û biserîhatinên Êzîdiyan didan, weke Seminara li belediya bajarê Verden, besdarbûna di civîna Akadêmiya Evangelî li Arnoldsham liser "Ciyê olên biçûk yên mirovên welatê xwe terk kirine, û rewşa wan li welatê wan yê berê û li Almanya Federal."

Û her wiha pêwendiyên wan bi pir lêkolînvanên olê, dîrokvan, lêkolînvanê îranistik û beşê gelên kêmketî re baş in, ew jî xêra çalakiyên komita birêvebir. Êdî ne pêwist e, ku mirov careke din bibêje, çiqas pêwendiyên hêja û biratî yên di navbera Civaka jibo Parastina Mafên Gelên Bindest û Kêm û vê Mala Êzîdiyanê de ne, baş in.

Bê zêdebûn karûbarên ku ev Mala Êzîdiyan li bajarê Oldenbûrgê pêktînc, pir giranbiha ne, ligel ku Êzîdî kêm in û heke em van karên han bidine ber karên rêxistinên misilmanan yên hejmara wan ne hindik in. Wekî din jî hem komîta birêvebir û hemjî serokê wê karekî hêja dikin û dihêlin, ku mirov mecbûr bibe û rûmetê bide wan. Pêwendiyên wan bi wezîran re, bi dêran re, bi siyasiyan re, bi lêkolînvanan re û bi lêkolînvanên zimanan re hêja ne. Karê wan roj bi roj xurtîr dibe û ev kar jiyana Êzîdiyan xwestir dike û çanda wan diparêze.

Ev rawestandina Êzîdiyan ya nêzîkbûna bi tirs, bê heqaret, bê zikreşiyê û ya ku naxwaze kesên din bi zorê weyne ser ola xwe, ji mirovên olên din re nabêje "bê Xwedê ne", ya ku bi xaçparêzan û " bi ateyîstan" re li girêdanê digere, ya ku dixwaze ola xwe biparêze û ciyê wê civata Almanan çêdikê, bêyî ku çand û ola xwe winda bike, ya ku derê xwe ji her kesî re vedike, divê ku ew ji me Almanan re bibe wek mînakeke ku em jî pêkbînin.

Navnîşana têkiliyê

Geselschaft für bedrohte Völker
D - 37010 Göttingen
Tel.: +49-551-49906-0
E-Mail: info@gfbv.de

Wergerandin ji zimanê Almanî: Şewqî Şemo Îsa

www.arsiwakurd.org

Hevpeyvin bi Mîrê Êzîdiyan re

KEMAL TOLAN Û TELIM TOLAN

Di sala 1999 de kovara Dengê Êzîdiyan bi Mîrê Êzîdiyan Tahsîn Seîd Beg re hevpeyvinek çêkir.

DÊ: Birêz Mîrê Êzîdiyan, Hun kengî hatin dinê û di wî wextî de çend zarokên dê û bavê We hebûn ?

Mîr: Dema ez di sala 1933 de hatime dinê, hingê hest zarokên dêya min Meyan Xatûnê û bavê min Seîd Begê hebûn. Em pênc bira û sê xwusik bûn. Ez birê navîn im. Mîrza û Xêrî ji min mezintir in. Celal û Farûq jî ji min piçûktir in.

DÊ: Birêz Mîrê Êzîdiyan, Hun di kîjan salê de bûn Mîrê Şêxan (Êzîdîxanê)?

Mîr: Çaxê bavê min di sala 1944 de emrê Xwedê kir, ez hingê 11 salî bûm. Di wê demê de Meclisa Ruhanî, mezinên eşîretan û Meyan Xatûnê bîryara standin, ku ez bibim Mîr. Ji 11 saliya min heta emrê min bûye 18, Meyan Xatûnê heft salan wekaletiya min kir û hemû kar û barên Êzîdiyan wê bi rê ve dibir.

DÊ: Birêz Mîrê Êzîdiyan, Hun dikarin bi kurtî giranbihabûna Mîr ji xwendevanên me re bidine naskirin?

Mîr: Mîr serokê Meclisa Ruhanî ye. Ew bi hemû kar û barên mîletî ku ligel dewlet û eşîreta bixweşî û nexweşî berpirsyar e. Mîr serokê dînî û dinayayî ye. Mîr yekî tenê ye û kesên ji malbeta min yên din ne Mîr in.

DÊ: Birêz Mîrê Êzîdiyan, Gava Hun bûn Mîrê Êzîdiyan, We çi dixwast jibo miletê xwe bikin û Hun îro gihîştin wan mexsedên xwe?

Mîr: Armanca min ya ewil ev bû, ku mîletê me zarokên xwe bisînin medresa. Çinkî tenê bi vê rêyê emê bigihêjin armancên xwe. Jibo ku mekteba li gundên Êzîdiyan bêtir bihatina avakirin, ez diçûm gel dewlet û waliyê Musilê (Sed Qezaz) û wan hewil dan, jiber ku di vê demê de xwasteka xwendinê li nava xelqê me kêm bû. Heta hinek kalemêrên me lidijî xwendinê bûn û digotin: "Mekteb ji me re heram e." Min gelek zahmet ji destê kalemêr û dewletê kisand. Di salên 1952 - 1953 de hinek avayiyên mekteban li çend gundên Êzîdiyan hatin avakirin. Bi xêra vê xwandinê îro miletê me hinekî pêşketî ye, niha dixtor, mihendîs, mamoste û xwandevanên me hene.

« Ev çêkirina vê Mala Êzîdiyan li Oldenburgê, tiştekî jibo xizmeta Êzidiyatiyê ye û gelekî başe. Va ye, hun di vê Malê de dersa Êzidiyatiyê didine Êzîdiyan. »

DÊ: Birêz Mîrê Êzîdiyan, Hun bi çend zimanên xerîb dizanin?

Mîr: Ez bi Erebî û Ingilîzî dizanim û Farizî baş fahm dikim. Kurdî zimanê dê û bavê ye.

DÊ: Birêz Mîrê Êzîdiyan, Hun kengî û jibo çê cara yekemîn derketin derveyî welat?

Mîr: Ez cara ewil di sala 1951 de bi birê xwe rahmetî Mîr Xêrî re çûm Lûbnan û Sûriyê. Hingê wek Mîr çûm nav Êzîdiyên li Hesekê û Qamîslo geriyam. Wekî din jî ez gelek caran diçûm Lubnanê û dîsa di sala 1962 de di vir ve derbasbûm çûm Londonê. Hingê ez ses mehan jibo tendûristiya xwe li Londonê mam û di pey re hatim Almaniyayê. De wî wextî de hîna Êzîdî li Almanyayê û Awropayê tine bûn. Pistî Almanyayê dîsa vegeriyam Beyrutê û li virê jî mam heta sala 1963, ku li Iraqê komployek çêbû û Ebdil Kerîm Qasim ji ser hukmî rabû û Ahmed Hesen Bekir û hevalên xwe hatine ser hukim û sûnde hêja vegeriyam Iraqê. Dîsa gava di sala 1970 de komployek lidijî hukumeta Iraqê çêbû, hingê rola dostê min yê Qeymeqamê qeza Şêxan, di vê komployê de hebû. Ev Qeymeqamê dostê min ji aliyê dewletê ve hate girtin û pê îşkence kirin. Wî di îşkencê de îfade liser min dan û got: „Tahsîn jî hevalê me yê vê Komployê ye". Lewra hukumeta Iraqê xwast min jî li bajarê Êsifnê dilbigire, lê min xwe neda destê wan û ez reviyam û çûm gundê xwe Baedirê. Min li Baedirê pêwendî li gel Kurdan çêkir û jibo ku hukumeta Iraqê tadê li Êzîdiyan neke, ez çûm nav Kurdan. Wî çaxî rahmetî Mele Mustefa Barzanî şoreş dikir. Ez heta peymana Cezayirê ku

www.arsivakurdi.org

di sala 1975 de di nava Iraq û Iranê de çêbû û soresa Kurdî têkçû û sûnde neçar bûm, çûm Iranê. Ji Iranê jî çûm Londonê û li wirê bi cî bûm.

DÊ: Birêz Mîrê Êzîdiyan, Hun çewa zanîbûn, ku Êzîdî li Almanyayê hene û Hun kengî hatin nav Êzîdiyên Almanyayê?

Mîr: Kurê min Seîd di sala 1975 de hatibû Almanyayê. Hingê çûbû Berlînê mala Mihemedê Salih. Wî û Mihemedê Salih di telefonê de bi min re xeberdan. Min ji M.Salih pirs kir, ka Êzîdî li wir hene? Wî got: "Belê em Êzîdî dora sed malî li Almanyayê hene." Lewra ez cara ewil di sala 1975 de hatim bajarê Berlînê û dûre çûm Cellê nav Êzîdiyên li Almanyayê. Ez li nava van Êzîdiyan pir bextwer û kêfxweş bûm, dûre wan camêran gelekî qedir û qîmet dane min. Ez spasiya wan tevan dikim. Ez ji 1975 heta 09.09.1981, ses sal û nîvan, li derveyê welat mam û di nav wî wextî de çu siyan(mecal) û perê min tune bû, kesî wekî dinê jî alîkarî ne dida min. Lê camêrên Êzîdiyên li Almanyayê zêde zêde alîkarî bi min re dikirin û ne dihîstin ez hewceyî tu kesî jî bibim. Ez ji wan camêran re dûbare bi can û dil spas dikim û dibêjim bila Xwedê û Tawisî-Melek xêra wan qebûl bike.

DÊ: Birêz Mîrê Êzîdiyan, gerek e Êzîdî çi bikin jibo Îlm, Qewl û Di'ayên me Êzîdiyan werin berhev kirin û werin nivîsandin?

Mîr: Belê, ez jî weke we dixwazim ku Îlm, Qewl, Di'a û Beytên me werin nivîsandin û weşandin, daku mîlet bixwîne. Berê em zayîf bûn û ditirsiyan, lê niha bê xwendin û nivîsandin çênabe. Lewra jî dîsa bangî hemû Îlmdar û Qewlzanê me dikim, dibêjim tiştên li ba we heye, bidin nivîskaran.

DÊ: Rêxistin û kovarên Meclisa Ruhanî hene?

Mîr: Na, heta niha rêxistin û kovarên Meclisa Ruhanî tunin.

DÊ: Dibe ku endamên Meclisa Ruhanî ji aliyên Êzîdiyan ve werin hilbijartin?

Mîr: Hilbijartina endamên Meclisa Ruhanî bi dilê milet û reza Mîr e. Endamê Meclisa Ruhanî divê li gorî sed û hedên me ji aliyê milet ve bên hilbijartin. Çênabe ku her kesê Êzîdî ji derve were û bibê endam. Nimûne divê Bavê Şêx ji Şêxên Fexra be û Mezinê Qewala ji bine malên Qewalan be û hwd.

DÊ: Hun zanin ji malbeta We kî kare mîrantiyê bike û We yek vêga berçavî xwe kiriye?

Mîr: Heta niha ez nizanim, ka kiyê ji malbeta min bibe Mîr û min kesek jî berçavî xwe nekiriye. Jixwe ev biryara ka kîjan ji kur, bira û biraziyên min kare bibe Mîr, li cem milet e.

DÊ: Birêz Mîrê Êzîdiyan, Hun karin wê Tawisa welatê Xaltiya ya kevin, bişînin nava Êzîdiyên Almanyayê?

Mîr: Belê, ew Tawisa welatê Xaltiya hêja li cem me amade ye. Heger Êzîdî bixwazin, em karin vê Tawisê, Def û Şibaban tevlî Qewalan bişînin nava wan.

DÊ: Birêz Mîrê Êzîdiyan, Hun damezirandina van komelên Êzîdiyan li Almanyayê çewa dibînin?

Mîr: Kêfa min pir ji damezarindina van komelên Êzîdiyan re tê. Ew tev ji me re hêz û qewet in. Em dixwazin ev komel xizmeta Êzîdiyan bi rastî bikin. Ez dixwazim ew bi başî liser hev binivsînin û ne lidijî hev bin. Em tev yek in û çi problem di nava me de nînin. Ez li hemû civîna de hêviya ji xwuşk û birayên xostivî û dilsozên xwe dikim, dibêjim destê xwe bidin destê hev û vî dînê pak û temîz biparêzin. Me hêvî ji Xwedê û Tawisî-Melek heye, ku bi xêra xizmeta van mal û komelan, dê Êzidiyatî bimîne. Ez weke Mîrê Êzîdîxanê nikarim bibêjim, ev mal anjî ev komela ji ya dinê çêtir e. Ez naxwazim firq û mêliyê bixime nava mal û komelên Êzîdiyan, çimkî em tevde Êzîdî ne.

Min dît, ku li Almaniyayê gelek pirsgirêk di nava civatên Êzîdiyan de hene. Her civatek xwediyê fikrekî ye û gelek zahmet e, ku mirov bikarîbe van bigîhne hevûdinê. Pêwîst e em, Meclisa Ruhanî, Komel, Mal û dilsozên Êzîdiyan hemû, liser van nebaşiyan rawestin û bihevre vî dînî biparêzin.

Ez dîsa jî dibêjim, ez bixwe ne hevalê çi partiya me û ne jî lidijî çi partiya me. Wisa jî ne hevalbendê çi komela me, ne jî lidijî çi komela me. Bes Tistek wê he heye, ew komela ku xizmeteke safî ji Êzidiyatiyê re bike, ez wê komelê pîroz dikim. Kî li derekê şuxleke baş jibo Êzîdiyan bike, kêfa me bi vî tê, ewê ku şuxila nebaş jî dike, em jê re ne diwacî ne û heta ji me bê jî em gilîçiyê wî bin.

Ev çêkirina vê Mala Êzîdiyan li Oldenburgê, tiştekî jibo xizmeta Êzidiyatiyê ye û gelekî baş e.

www.arsivakurd.org

Va ye, hun di vê Malê de dersa Êzidiyatiyê didine Êzîdiyan. Ez pîrozbahiyê didim we hemûkan, qeweta we xweş û rahme li miriyên we hemûkan be.

Tabî her civîn û Maleke Êzîdiyan ku ez lê runistime min gotiye, miletê me yê Êzîdî û hemû komela, birênin va ye, Komela Oldenburgê Maleke Êzîdiyan avakirine û hêvîdar im, ku hun jî berê xwe bidine vê komelê. Ez hêvîdar im, ku hemû Komelên me yên dînî, ew jî çavê xwe berdine ser Komela Oldenburgê, ew jî jibo xizmeta xwe Malên Êzîdiyan çêkin û mektebên Êzîdiyan zêde bikin. Ev jibo mana Êzidiyatiyê tiştên baş in.

Gerek gava yekî Êzîdî kete nava xizmeta Mala Êzîdiyan, ewê di wê malê de xizmetê ji partiyan re neke. Hinga ew ji mala Êzîdiyan derdikeve derve û ew hemûkê malê xwe jî bide partiyan, tû heqê kesekî lê tûne, bêjê çima bi partiyan re kardikî anjî çima tu malê xwe didî partiyan. Mesele vaye Pîr Xidir Suleyman, di vê Mala we de dersa dînê Êzidiyatiyê dide zarokên we û xizmeteke hêja jibo Êzîdiyêtiyê dike. Vêca gava ev derkete derve, ew diçe digîje kîjan partiyê, em ne lidijî wî û partiya wî ne. Ez hêvî dikim, ku serê partî û komelan ne keve nava xebata Êzîdiyan, çimkî Êzîdiyên safî ne lidijî çi partiya ne.

Hun duruma Almaniyayê ji me çêtir dizanin. Eger hun dizanin, ka çi jibo parastina Êzidiyatiyê pêwîst û ferz e em bikin. Derê min jibo kesê xizmetê dikin, her vekiriye. Werin em bihevre niqaşe bikin. Hun dibînin, dinya bi xêra niqaşê pêşketiye.

DÊ: Pêwendiyên komelên Êzîdiyan bi Meclisa Ruhanî re çewa ne?

Mîr: Pewîst e, ku pêwendiyên komelên Êzîdiyan bi Meclisa Ruhanî re hebin. Em niha hewil didin, ku em karibin van komelan bigihîjînin hev û programekî herî baş ji wan re deynin.

DÊ: Dibe ku Êzîdî bikaribin fitoyê xwe bitenê bidine Komelên Êzîdiyan û nedine dunavên xwe?

Mîr: Nexêr, divê Êzîdî fitoyê xwe bidine Şêx , Pîr û dunavên xwe. Heke yekî dunav sasî û xirabî kiribe, wî çaxî bila Êzîdî fitoyê xwe nedine wî kesî û bidin yekî baş. Li welat hun dizanin, ku guhartina dunavan bi ray û şêwra Mîr tê kirin.

DÊ: Ev hatina We û Civata Ruhanî ya di destpêka sala 2000 de liser çi bû û Hun gihîştine mexsedên xwe?

Mîr: Hatina me ya vê carê jibo konferensa me ya dînî bû. Me dixwast Êzîdiyên li hemû welatan bigîjin hevûdin û dînê xwe bi mîletê dinyayê bidin naskirin.

DÊ: Birêz Mîrê Êzîdiyan, em dixwazin, ku hun nêrîn û daxwaziyên liser jiyana Êzîdiyan li Almanyayê bibêjin.

Mir: Em Êzîdî ji dewleta Îraq, Sûriyê, Tirkiyê, Ermenistanê û Gurcistanê hatine nav Almanyayê. Ez dibêjim, em hatine û ketine nava bahrê. Ev bahra jibo me gelekî zahmet e. Ka emê çewa ji nav vê bahrê derkevin? Derketina me girêdayî şixul û karê jibo parastin û xwedîkirina Êzidiyatiyê ye. Divê hun xûşk û birayên ezîz her wextî şîretan li zaroyên xwe bikin û bi tifaq bin. Pêwîst e, em Êzîdî timî ji zarokên xwe re bibêjin, ku em Êzîdî ne, Tawisî-Melek, Şîxadî, Şêx, Pîr û gelek milyaketên me henc. Eger em van şîretan ji zarokan re ne bêjin û zarok tenê bi zimanê Almanî biaxivin, dê zarokê dîn û zimanê xwe yê Kurdî ji bîra bikin.

Rast e, min gelek tiştên Êzîdiyan baş û nebaş dîtin. Pêwîst e, em van tiştan jihevûdin cûde bikin. Ez dixwazim çend mîsalan bidim:

Xirabiya herî mezin li Almanyayê ew e, ku îro hêjî Êzîdî zarokên xwe, keç anjî kurê xwe bêyî dilên wan û bi qelenekî gelekî zêde dizewicînin. Jiber ku zarok ne bi dilê xwe dizewice, doma vê zewacê li Almanyayê tûne. Jiber vê timaya dê û bavan gelek ciwan dev ji kulfet û dergîstiyê xwe berdidin û ji hêrsa re diçin digîjine xerîb û Almanan. Vêca ev sûc ne sûcê qîzê anjî yê kur e, ev sûc û guneh yê dê û bavê ye. Ev xisareke miletî ye.

Ez tucar naxwazim, ku ciwan bêdiliya dê û bavên xwe bikin, bes hinga ku dê û bav bêdiliya zarokên xwe bikin û keç û kurên xwe bi cebr (zorê) bizewicînin, hingê bila ciwan bi gotina dê û bavên xwe nekin. Hêvîdar im, dema ciwanek bitenê nikaribe lidijî vê zordariya dê û bav û malbeta xwe derkeve, hingê ew jî şaştiyan neke û biçe xwe bavêje bextê mirovên Êzîdiyên dilsoz anjî were derdê xwe ji rêvebirên komel û Malê Êzîdiyan re bibêje.

Şîn û sayîyên Êzîdiyan li vî

www.arsivakurdi.org

welatî gelekî baş in, lê hinek tistên zêde ketine nava urf û edetên wan. Nimûne: Gava yekî Êzîdî emrê Xwedê dike, gelek xwarin zêde jibo xêra yê mirî didin û gelek kes bi cenazê wî mirî re diçin Tirkiyê. Ez dibêjim, ev mesrefekî zêde ye, ne pewîst û durust e. Wekî din jî dibêjim, Êzîdî dikarin miriyên xwe li hêra (li her derî) vesêrin û ev tistekî zor normal e.

« Gerek gava yekî Êzîdî kete nava xizmeta Mala Êzîdiyan, ewê di wê malê de xizmetê ji partiyan re neke. Hinga ew ji mala Êzîdiyan derdikeve derve û ew hemûkê malê xwe jî bide partiyan, tû heqê kesekî lê tûne. »

Ez jibo hemû Êzîdiyan dibêjim, em tevde Êzîdî ne. Heke Êzîdiyekî bixwaze zerarê bigihîjine Êzîdiyan, bila ji kîjan bavikî û eşîrê be û eslê xwe ji kur be, pêwîst e, em wî bi nav û nîsan bikin û wî werînin reya rast û dirist. Bê guman em Mala Mîran ji vê rêbazê ne derketî ne, cûdabûna me û gelê me Êzîdî di vê derheqê de çênabe. Belê, em mala Mîran jî ne ji ezmanan hatine xwarê. Em jî weke we beşer in. Ez ji we hêvî dikim, ku hun wî kesê xirabî kiriye bitenê û ne tevaya eşîr anjî malbetê pîs bikin. Gava hun vî kesê pîs kufş nekin û bibêjin mirovên filan eşîr anjî bîvan eşîrê pîs in, hingê hun guneha ji xwe re çêdikin û hun dixwazin Êzîdî bi hevûdinê bikevin.

Dema em bêjin Xaltî ne baş in. Xaltî jî bêjin Iraqî ne baş in. Sûrî jî bêjin Êzîdiyên Ermenîstan û Gurcîstanê ne baş in. Pa Mala Mîran, Mala Bavê Şêx û h.w.d. jî ne baş in. Vêca ka kî ji me baş ma, dêmek em tev pîs dibin. Ev ne tistekî rast e. Cardin dibêjim, eger yekî pîs be, eşkere bêjin, filanê kurê filankesî wê pîs e. Jibo wek hatî gotin "dibê bizin bi piyê xwe û mî jî bi piyê xwe beye dalqandin." Wexta em weha eşkere jihevûdinê cude nekin, hingê mirovê pîs di nava başan de wenda dibin û yên baş jî bi yê pîsîtî kiriye re, pîs dibin.

Lewra jî dibê em tev bihevre liser vê nuqtê bisekinin. Eger tifaqa we hebe, hun karin gelek tistên baş jibo Êzidiyatiya me ya li welat jî bikin. Hun li virê hurr (azad) in û hun karin daxwaziyên xwe eşkere bibêjin. Wexta hun tistine Êzidiyatiyê binivisînin, Êzîdî jî bi xêra we bixwînin. Em nabêjin, ku em û Êzîdiyên li Almanyayê jihevûdinê dûr bibin. Pirsgirêkên me ji yê we Êzîdiyên li Awropayê gelekî mezintir in. Hun Êzîdiyên li Almanyayê gelekî di pêşiya me de diçin. Em hêvî dikin, heta ku hun karibin hewqas bilez neçin û hinekî li benda me jî bisekinin. Jibo em jî bigîjine we, emê piçekî acele bikin.

Me divê dan û standinên me bihevre hebin. Tiştên hun ji me dixwazin ji me re binivisînin. Her tişt bi dan û standinê hal dibe. Va ye, çend caran dibêjim, îro ev xebata hun dikin û ev Mala we jibo parastina Êzidiyatiyê ava kiriye, ne tistekî piçûk e, kî dikare bêje ev şuxila we ya li Oldenburgê ne baş e?

DÊ: Birêz Mîrê Êzîdiyan, şîret û gotinên We jibo ciwan û xwendavanên Êzîdiyan çi ne?

Mir: Beri her tistî gelek silavên min jibo hemû xwandevan û ciwanên Êzîdiyan hene, hevidar im, ku ciwanên me dînê xwe biparêzin û her dem dilsozen Êzidiyatiyê bin. Li ba min tu cudebûn di navbêna keç û kuran de tûne. Çiqas ciwanên me bikaribin zêde biçine Unîverstan bixwînen û biserkevin, hewqas jî ez bi wan kêfxweş dibim. Hêvidar im, ku ciwanên me dîn û çanda xwe ji bîra nekin. Ez di wê baweriyê de me, ku ciwanekî xwandevanê zanîngeha bilind, çêtir dikare ji milet, dîn û çanda xwe fahm bike û biparêze. Min gelek caran li gelek deveran gotiye û dîsa jî dibêjim: Hêviya min ji dê u bavên ciwanên Êzîdiyan ew e, ku heçiyên bixwazin, em pêşbikevin bila zarokên xwe bidine xwendin û sîretan jibo Êzidiyatiyê jî li zarokêen xwe bikin.

Çiqas xwendevanên Êzîdiyan zêdebin, hewqas jî zêde Êzidiyatî tê naskirin û parastin. Jiber nexwendinê Êzîdî pês nakevin. Xwendin her pêsketin e û ne paşketin e. Wekî ku em dizanin dema em kalepîr ji ortê biçin, hingê parastina Êzidiyatiyê dikeve ser milên ciwanên me yen vêga. Şîreta min ev e: Bila xwendevan jî zanîbin, mîletê dinê tev bi xêra xwendin û zanebûnê pêsketin. Lewra xwendevanên me jî karin bi dilekî paqij xizmeta Êzidiyatiyê bikin. Bila ji heftiyê şes rojan jibo xwe û rojekê jî jibo Êzidiyatiyê xizmetê bikin. Rolekî sereke û mezin di destê xwendevanan de heye. Ew karin pêwendiyên xwe bi gelê xwe re berfireh bikin.

DÊ: Birêz Mîr Tahsîn Seîd Beg, Mîrê Êzîdxanê, em dixwazin ji te re pir spas bikin, ku Te îmkan da me vê hevpeyvînê amade bikin.

Mîr: Bila Xwedê û Tawisî- Melek bi We û akarê We re be!

Ev hevpeyvîn Kemal Tolan û Telim Tolan amade kirin.

www.arsivakurdi.org

Kurd û dijmin bihevre û weke hev şa dibin - Gelo ew çawa dibe?

TÊMÛRÊ XELÎL

Hejmare rojnama we ya 43 de gotara Canpola "Erê xemsariya me çi kir û çi ne kir?" çap bûye liser pêwîstiya hajpêhebûna hûrgiliyên derheqa ola kurdan ya here kevnar: Êzidiyatî. Canpola ev pirsa giring bi dilê koven û xemgîn pêşde dikisîne û hîvîdar e, ku yek bersîvê bide. Bila ev nivîsara min bibe xeleqek ji zincîre wan bersîvê, ku wê rûpelên "Hêvî"yê de bibine têmayên gotûbêja.


Temûrê Xelîl

Hîç şika wê yekê tune, ku hemû dîn, nav wan de Îslam û Êzidiyatî jî, meriya hînî paqijayê, restiyê, dilremiyê, nazikiyê, bedewiyê dikin. Pirs tenê di wê de ne, ku çima îslam ber dilê pireniya kurdan ji Êzdîtiyê ezîztir e. Ew jî wî çaxî, ku Êzîdî dînê kurdayî kevnare ye, lê musulmanî bûye dînê kurd. Û eger herdu dîn jî paqij in, çima emê dest ji yê xwe bikisînin û hune yê xwe biparêzin. Ev têma jî hewcî minaqeşê ye.

Eger dewleta me kurdan hebuya, wî çaxî dînê Êzîdî wê bi paqijayî, dewlemenditiya fikir, şîret û temiyên xwe ve deng bida. Dua-dirozge, qewil û telqînên me de filosofiya jiyanê ya kur heye. Ew yek hetanî îro jî di nav erf-edet, rebûn-rûniştin, sîn-şayên me de têne ber çav e.

Eyan e, ku du pirtûkên dînê Êzîdiya "Cilwa" û "Meshefa Res" berî çend sedsala bi tîpên taybetî hatine nivîsandin. Wek em zanin, di cihanê de bi sedan milet hene, lê cûrê herfan her tenê ses in-latînî, erebî, ermenî, gurcî, çînî û îvrît. Tîpên Êzîdiya jî dikaribûn bibûyana yên 7, lê kes xwedî lê derneket.

Tiştê herî ecêb ew e, ku dîrok dibêje ola kurden ya here kevnar Êzîdîtî ye, lê musulmanî ji ereba hatiye û bi darê zorê bi me dene qebûlkirinê, û gelek kes jî vê restiyê qebûl dikin, lê 99% kurdan dîsa musulman in û 1% tenê Êzîdî ne. Em jî ji Canpola re dibêjin:"Parastina Êzîdîtiyê parastina kurdiya dirust e", lê bi mîliyonan kurd bûne musulman, hetanî îro jî dibin, û yek ji wan venegeriya ser dînê kal-bavê xwe. Xwedêgirevî dînê wan fire ye, dînê me jî teng e. Heyran ew tengbûn li me qebûl e, hîn tengtir be, çêtir e. Hinek ji wan jî nanê me naxwin, jiber ku destê Êzîdiya lê ketiye. Lê nanê destê hemû musulmana, hemû dijminan, heta bavkuştiyê xwe jî dixwin. Car dijmin ne kafir e, em kafir in! Mesela kurde cîwar dibêje: „Ga nanale, bar dinale". Wek dibêjin, ev xweş bazar e!

Em bixwazin-nexwazin, îslam îro bûye ola kurde jî. Di dînparestinê de her yek aza ye. Lê îcar em binihêrin, ku îslamê çi da kurdan û Êzdîtiyê çi da? Ez tenê nimûna kurdên Sovyêtistana berê bînim: Sala 1923 hukumeta Sovyetê li Azirbêcanê, bi merkeza Laçîn autonomî da 41 hezar kurdên musulman. Wan sala li Ermenîstanê 15 hezar kurdên Êzîdî hebûn.

Ji sala 1930 vir de li Azirbêcanê ne avtonomî heye, ne jî kurd. Û tenê sebebeke wê heye - jiber ku kurdên wire musulman bûn, nav aziriya de heliyan, bûne bav-bireyê hev. Û gave ji wan dipirsî "Tu kurd î?", dibêjin: "Na, apê min, anjî kalikê min kurd bû". Lê îro tenê li Ermenîstanê 56 hezar kurd hene û hetanî van salên dawî navbende pêsketina ziman, dîrok, folklor, êtnografiya kurde li temamiya cihanê li wir bû. Û tenê sebebeke wê pêsketinê heye - jiber ku pireniya wan kurdên Êzîdî ne.

Kurdên musulman li Ermenîstanê him tevî azeriya diman, him jî di nava ermenya û êzîdiya de. Yên di nava azeriya de diman, hîç pês ne ketin, hinek jî helyan, lê yên di nava ermeniya û êzîdiya de diman, pês ketin û

www.arsivakurdi.org

hîç kes ne heliya.

Canpola bi nehayaderiya xwe ronakbîrên kurdên Êzîdî bêhurmet dike, dibêje: "Ez mizgîniyê didim, ku êdî nivîskar di nav kurdên êzîdiya de peyde dibin". Bireyê delal, gunehê te nîne, jiber ku haya te pê tune. Gave bi deh salan berê di sala 1936 de Heciyê Cindî û Emînê Evdel bi tîpên kurdiya latînî li Yêrêvenê "Folklore kurmanca" çap kirin bi 500 rûpelî (û navde gelek qewl, dua-dirozgên êzîdiya jî hene) û serokkomarê Kurdistanê Qazî Mehemed digot "Qurena me ev e", wan sala hema bêje li hemû perçên Kurdistanê hîç behsa nivîsîna bi kurdî jî tunebû. Bilî wê me bi sedan pirtûk çap kirin. Deka tu bêje, jibo çi îro li Kurdistanê û Awropayê bi sedan pirtûkên kurdî çap dibin, yên sist û xireb jî nav de, hinek ji wan care çarepênca, lê ew "Qurena" me, ku wê de hemû nimûnên folklora me ya zengîn hene, çap nebûye. Û netenê tu, gelekên wek te xebata kurdên Êzîdî ya 60 salan jibo kurdcyatiyê çawa lazim e ne şêkirendine. Bedirxaniya û "Hawar"'a wan ser çavê min, lê bi deha pirtûkên me yên ilmî, dersa, helbesta, serpêhatiya, romana, 1700 stiran û 40 piyês-şanoyên redyoya me, rojnama me "Rêya Teze", ku ji sala 1930 ve derdikeve, li ku man? Heger ser dînê Êzîdîtiyê kêm tişt ronahî dîtibin jî, sûc ne yê me ye, Sovyetê de propagande kirina dîn qedexe bû.

Berî çend sala li Moskova konfêrenseke kurdzaniyê pêk hat, li wê derê fikir hate gotin, ku zimanê kurdên Sovyetistanê bikine bingeha zimanê kurdî (zarevê kurmancî) yê lîtêretûriyê. Gelek kurdên Kurdistanê xwe aciz kirin. Çima? Jiber ku nizanin, ku zimanê me çawa hatiye helkirinê û şimşatkirinê. Ez nimûnekê bînim: Vê dewiya 15-20 zimanzanên kurd berev bûn, ku kurda gotina "prodûktiyon" bibînin, anjî çêkin. Nikaribûn. Û kesî jî nizanibû, ku me ji zû ve ew gotin çêkiriye, ew ketiye nave qalibê kurmancî û bûye "derenîn". Niha em vê gotinê û gelekên wek wê (wek "bîskilêt" me kiriye "çerxesiwar") bi zorê jî ji nav ziman derxin, dernakevin.

« Gava Heciyê Cindî û Emînê Evdel bi tîpên kurdiya latînî li Yêrêvenê "Folklore kurmanca" çap kirin bi 500 rûpelî (û navde gelek qewl, dua-dirozgên êzîdiya jî hene) serokkomarê Kurdistanê Qazî Mehemed digot Qurena me ev e. »

Ev pêşketina me li Sovyetistanê, xwesma li Ermenîstanê qet li dijminan xweş nedihat. Wan sala jî tirka dixwest ku redyoya me bê dedenê, jiber ku kede wê di hişyarkirina kurdên Kurdistanê de jî pir bû, lê destê wan nedigihîşt, milê wan renedibû, jiber ku Moskova li pişta me bû. Pistî hilweşandina Sovyetê dijmin kete nav me û bi destî "tûzîkên" me kurdan her tişt rûxand. Gave Ermenîstan serxwebûn îlan kir, di nav kurdan de sê komik hatin çêkirin. 1) "Yekîtiya Êzîdiyan", ku dibêjin em ne kurd in. Dewletê jî ji rediyoya me ya kurdî sehetek birî (ji sehetnîvekê nîv sehet hîşt) û satelîta (antên), ku Kurdistanê pê guhderî dikir jî derxist û nîv sehet da Êzîdiyan; jibo wan rojnama "Dengê Êzîdiyan" derdixe. Û bi wan milet re dibêjin, ku kurdan Ermenî û Êzîdî qir kirine. 2) Hinek lawik jî hatin, ketine nav milet, propagande kirin, ku xudêgirevî Kurdistanê çêdikin (Kurdistana sor jî, ya mezin jî), ha îro, ha sibê, tişt ne maye, ha...Û ev çend sale dibêjin, ku tişt ne maye, ha, 2 meh maye, ha. Carekê min ji kalekî gundê me pirsî: Çawa ne, bas e-xirab e, ku lawik we "hişyar" dikin? EW fikirî û gelek cîwar got: "Heyran, ji me re gotin hişyar bin, em jî hişyar bûn, îcar nahêlin em rezên". Ez dibêjim ji van gotinên lawika her tenê "tişt ne maye". rast e. Gava nîvê gundên Kurdistanê bêne xirab kirin, şewitandin, şêlandin, kavil kirin, vela kirin, îdî çi dimîne? 3) Me jî bi 9 hevelan ve li Ermenîstanê "Yekîtiya Ronakbîrên Kurdan" ave kir û çûne nav milet, ku xeletiyên ven komika rastkin. Me digot, ku haj xwe hebin, li vir karê we çêkirina Kurdistanê, siyasetê ne ketiye. Yên xwe Êzîdî dihesibînin, bire bêjin em Êzîdî ne, lê her nebêjin em ne kurd in. Me got, ku ji me tê xwestin em zimanê xwe biparêzin, çande û edebiyata xwe pêşxin, komikên strana û reqsê çêkin. Pareke milet ji me re digot "Îro-sibê Kurdistan çêdibe, hun jî pey reqsê ketine", parekê jî digot sêx-pîrên me dibêjin, em ne kurd in, parek jî digot, em bêjin em kurd in, wê me ji vir derxin.

Derdê nayê kişandinê jî ew e, ku hukumeta Ermenîstanê alîkî ve dibêje, Êzîdî bireyê me ne, kurdên musulman dijminê me ne, aliyê dinê ve jî hevelên koma 2-a (ku piraniya wan kurdên musulman in) hizdike, lê camêrên koma 3-a (ku hemû jî kurdên Êzîdî ne) hiznake. Gelo ji vê yekê bîna kerrîtiyê, qurrederê û golegeniyê nayê?

Em dijî van herdu komika

www.aasiyaweb.org

derketin, wan jî bi ermeniyan re teveyî êrîs anîne ser me. Çare me hate birînê, wek dibêjin "îdî gihîste serê poz", em ji Ermenîstanê derketin. Ji "Yekîtiya Ronakbîrên Kurdên" akadêmîk Şekroyê Xudo û Prof. Şerefê Eşir çûne Moskova, nivîskar Wezîrê Eso û helbestven Eskerê Boyîk jî li Bêlçîkayê bi cî bûn, dixtor Tosinê Resîd Austreliyayê, ilimder Celîlê Celîl li Austriyayê, mamosta Aslîka Qadir li Almanyayê, zimanzan Çerkezê Reş kes nizane li ku ye, ez jî li Swêdê.

« Ez ne dînder im, ne hişk Êzîdîparêz im û ne dijî îslamê me, lê ez dibêjim, ku kurd hemû Êzîdî bûna, belkî zûde dewleteke me ya zor û zengîn hebûya. »

Anko dijmin çi dixwast? Wi dixwast kurdên Ermenîstanê bê xwedî û bê serî bike. Û kir! Di nava her miletekî de jî xweyê milet ronakbîr in. Di dawiyê de çi bû? Par Kurdzaniyê li Akadêmiya Ermenîstanê hat dedenê, rojnama "Rêya Teze" dewsa heftê du caran, melhê du care dertê, wextê rediyoya kurdî sê care kêm bûye, pirtûkên dersa, bedewetiyê çap nabin. Îcar Êzîdî lawikên Kurdistanê çêdikin, tirk û dijminên mayîn bihevre û weke hev sa dibin. Gelo ew çawa dibe? Hela serde jî serserî ji çelengên kurd re dibêjin xayîn. Ji xwe tirk jî wisa dibêjin.

Ermenî jî ditin, ku ronakbîrên kurd çûn, ji xwe kurdên musulman jî berî çend salan ji tirsa revîbûn, gotin, ku bal me kurd ne mane, her Êzîdî ne, ew jî ne kurd in. Canpolayê payebilind, tirsa me ji îro sûnde ye, jiber ku ronakbîr ne man, ku Êzîdîtiyê û kurdîtiyê li Ermenîstanê pêşxin. Lê karê berî wê, ku bi sala hatiye kirinê, dikare bibe milkê gel. Wan pirtûkên me (tenê yên bas) li Awropayê û Kurdistanê carek din çap kin, strana bikine kasêt, pirtûkên zanyarên rûsî, yên ku ser kurden e, wergerînin.

Bi kurdî dibêjin: "Şûrê milet fêza sûrê dîn de ne". Ango pêşî milet û welat, paşê dîn. Lê kurdên me eger musulman bin, ji tirk, faris û ereba musulmantir in, eger Êzîdî bin, hinek jî digihîjine wê derecê, ku dibêjin em ne kurd in.

Ez vê gotarê li kampeke Swêdê dinivîsim. Li vir kurd gelek in. Piraniya kesên kampê jî miletên din in û musulman in. Sibê zû seheta li 7 dengê azana melle, ku Qurenê dixwine (bi kasêtê), ji du ode tê û herdu ode de jî tenê kurd dijin. Yên ku berî giska diçine nimêjê, dîsa kurd in. Hevelek jî serê Kurdistanê de milekî xwe winde kiriye, çend ciya de jî birînder bûye, lê olperestekî wisayî fanatîk e, ku tu dibêjî, qey kilîta bihuştê di berîka wî de ne, lê hîç nafikire, ku Quren dibêje, musulman gerek musulmanan neêsînin, hîç nafikire, ku ew çawa hemû miletên musulman bûne dewlet, kurd her wisa man. Hinek ji wan jî gava çav min dikevin, ji hevdu re dibêjin-"ew Êzîdî ye", ew ne ji me ye. Îcar were vê ecêbê! Wek bi kurdî dibêjin, „Ezê vê kulê bikime kîjan qulê?"

Xulese wek min got, ez ne dînder im, ne hişk Êzîdîparêz im û ne dijî îslamê me, lê ez dibêjim, ku kurd hemû Êzîdî bûna, belkî zûde dewleteke me ya zor û zengîn hebûya. Berî çend sala min meqalek di "Azadî"yê de çap kir ser herdu pirtûkên dînê êzîdiya - "Cilwa" û "Meshefa Reş". Vê carê ezê miqalekê binivîsim, ku Cegerxwînê mezin liser dînê êzîdiya çi gotiye. Wî di 1982 de, dema hevdîtina me li Lênîngradê, mala Qanatê Kurdo de, ser vê meselê ji min re got û min dengê wî girtiye dengnivîsokê.

Eger "Hêvî", anjî weşancke din wê çap bike, zanebûnên we liser Êzîdîtiyê wê hîn zêdetir bin. Lê berî wê hun dikarin pirtûka Eskerê Boyîk "Duaya serê sibê" bixwinin, ku wesanxana "Roja Nu" vê dewiya çap kiriye. Di dawiyê de dixwazim duake Êzîdiya reberî we bikim, ku diya min her sibe dibêje. Lê çawa tê bîre min, wisa jî dinivîsim.

Ya serê sibê

Tu bêyî heware nevsên nav tengiya,

Rêwiyên serê riya,

Hêsîr û jar e, bê cî, bê war e,

Bêyî heware 72 mileta,

Hêja bêyî heware der û cînare,

Komî-kulfeta, hemû neferc...

Me pêşî ji hemû mileta re xwest, paşê ji xwe re. Belkî dengê me jî gihîste cî, hemû pare xwe stendin, lê em man. Belkî dore me hêja ne hatiye. Dorê sekinandin jî ne çare ye. Bi kurdî dibêjin: "Ya dest dike, dê-bav jî nake."

Navnîşana têkiliyê

Email:temur_xelil@hotmail.com

www.arsivakurdi.org

Heciyê Cindî û romana wî Hewarî

ESKERÊ BOYÎK

Wextê mirov li pala çiyakî dijî, li nav qûç û newal, gelî, mêrg, zozanê wî digere (îlahî xortaniyê de), tê bêjî bilindeyî, reng û rewşê wî ewqas navîne. Her tişt jê re sade û tebyetî tên xûyakirin. Bêxem jî li ber xisûsî, nexs û nîgare re derbaz dibe, gelek tiştî jî navîne.

Lê gave ji çiyayê xwe dûr dikeve, di nave dest û quçên xerîb de li pey xwe dinhêre, nû bilindeya çiyê, bedewiya mêrg-çîman, gelî-gebozê wî, tem û zelaliyê avên kaniyê sar, xwesî û basiyê zozanê xwe texmîn dike... Bîre wan dike û tê derdixe, ku ew jî pirîk ji wî axê ye...

Ez vî warê xerîb rûnistime, pey xwe dinhêrim û nû texmîn dikim, ku ez di nava malbatek rewşenbîrên çawa de mezin bûme: Kê bûne mamostayê min? Min pismamtî, hogirî û heveltî bi kê re kirye?

Ez bi navê wan xwe kubar û serbilind dibînim: Erebê Şemo, Heciyê Cindî, Emînê Evdel, Qanatê Kurdo, Şikoyê Hesen, Fêrîkê Ûsiv, Qaçaxê Mired, Nado Maxmûdov, Casimê Celîl, Mîkayêlê Resît, Eliyê Ebdilrehman, Sehîdê Îbo û Ûsivê Beko.

Nav pir in, bîrênin kûr, dûr û sîrin. Min tek navê hinek rehmetiya da. Her yek bilindeyîk, maqûlek, sîr helal û karkirê kultura gelê xwe.

Eger Kurdê Ermenîstanê, Gurcistanê, repûblîkên Asya Navîn û parek ji yê Azêrbaycanê nehîştine, mane, ziman, çand, deba kal-bave neyê ji bîr nekirine, di wî warî de emekê van rewşenbîrê me pir e.


Heciyê Cindî

Kar û barê Kurdê Ermenîstanê yê kulturî-çandî bi redyoya Yêrevenê yê zimanê kurdî, ji gelê welat re jî bû bîr û bawerî. Wana jî ruhê kurdîtiyê demekê ji wir standin.

Ez ked û karê rewşenbîrên me yê din, nimz nakim. Lê heqî ew e, ku ciyê Heciyê Cindî di nav giska de cude bû. Ew, te dê bigota malxê wê malbata rengîn bû, xemxur û birêvebirê giska.

Ew havîna timê dihate gundên me yê pala çiyayê Elegezê, ji devê kal-pîre zargotin dinivîsîn. Dema ew dihat, di nav gel de bela dibû, digotin Heciyê Cindî hatiye. Em zarok, liser hev komî dibûn û me ji dûr ve lê mêze dikir. Gel pir his lê dikir, qedirê wî zanibûn. Giska bi serbilindî û kubarî cem gelê cînar navê wî didan.

Di sala 1961 de wexta ez li bajarê Yêrêvenê ketim xwendina bilind, rojeke payîzê bû, min deftera xwe ya helbesta hilda, çûme Akadêmya Ermenîstanê ya Zanyariyê cem Heciyê Cindî. Ew resthatin qet ji bîra min naçe.

Naha dilê min diavêje, şerm dikim, gavekê pês de diçim, gaveke paş de. Ha dixwazim paş de vegerim, çûyîna xwe ji rojeke din re bihêlim, ha jî difikirim: „Vê rojê çêtir tûne."

Xulese, ha min culet da xwe, ha poşman bûm, gîhîştim ber derê ode wî. Wî çaxî ew serokê Sêksiya Nivîskarê Kurdan bû rex Yekîtiya Nivîskarên Ermenîstanê û di Beşa Rohilatzaniyê ya Akadêmiya Ermenîstanê de serokê koma Kurdzaniyê bû.

Ez liber derê ode wî sekinîme, şerm dikim, dêrî bikutim, herme hundur. Min derî kuta. Ji hundir deng hat: „Mitêk!" (Yanê warne hundur).

Min derî vekir. Di odê de ew tenê bû. Bi besereke xweş li min nêhêrî. - Tu Kurd î? - Min serê xwe hejand. - De pês de warê, şerm neke! Ware liser vî kursiyê rûnê. - Ez liser kursiyê ku wî nîşan dabû, rûniştim. Min xwe da naskirin. -- Erê, erê tu ew xortê Belî yê ji Qundexsazê. Ez te liser vê xwendina bilind pîroz dikim. Qundexsaz, -ewî navê gundê me wekiland, demeke kete nave mitala,- gundê

www.arsivakurd.org

we de 30 sal berê min dersderî kiriye. Kurmaciya gundê we xweş e. Li wire min him dersê zimanê kurmancî dida zarokê gund, him jî ji wan hînî kurmancî dibûm. Wextekî dijwar bû. Lê heta naha çima nayêyî xanê, pismam! Xwendekarê me gişk tên-diçin. Ji min re gotin yekî Qundexsazê jî Înstîtûtê hatiye hilden. Bela dibûrîne, ha!

Min tê derxist, wekî ew îdî derheqa min de zane.

Guhê ronakbîrên me liser her qewimandinekê bû, ku jiyana gel de dibû. Wan qîmetekî mezin didan xwendin û pêşdeçûyînê. Her sal çi ji destê wan dihat dikirin, wekî ji cîwanê Kurd gelek zanîngehê Ermenîstanê de qebûlbin. Diçûne cem dersbêj, profesor û serokên zanîngeha, navçîtî dikirin; ji wan hîvî dikirin, dostaniya xwe ji wan re didane kêranînê. Pey întihamê qebûlbûnê, êdî Yêrêvenê de civaka Kurde teve zanibûn çend xort û keç ketine xwendina bilind. Dest pê kir hinek xwesî û laqirdî derheqa qebîla û gundê me de gilî kir. Em tev kêfxweş bûn. Jiber birbûna wî, min jî bîre kir, ku ew Heciyê Cindî ye, nivîskar û ilmdercekî mezin e. Pê re ketime xeberdenê.

« Heciyê Cindî Cewarî, di sala 1908 de li Qeza Qersê, gundê Emençayîrê ji dayika xwe bûye. Di sêwîxanê de gelek telî-tengiya dibîne, heta zimanê diya xwe jî winde dike. »

- Wisan e, tu nebê serokê êla Heseniya Ûsiv Begê yî. Tu zanî xwendiyê ewil li nava Kurdê Ezîdiyê Ermenîstanê de kalkê te bûye. Paşê bû endemê parlamênta dewleta Ermenîstanê. Bavê wî: Hesen Axa serokê Êzdiyên Rusêtê bû. Care ewil wî lawê xwe şande xwendinê û wî edetê bêkêr, ku digotin: „Xwendin ji Êzdiya re herem e" ji nave gel rekir. Bi navçîtiya wî, di sala 1900 de dewleta Rus li sê gundên me Êzdiyên Kurd de (Zor, Qundexsaz, Bacelû) mektebê zimanê Rusî vekirin û kire liser xelqê, ku zarokê xwe bişînine mektebê.

Rast bêjim min ew melûmetî nû dibihîstin. Ez seba gilîkî din çûbûm, lê wî serecema axaftinê wisa guhestibû, ku min nizanbû, çawa mena (sebebê) hatina xwe jê re bêjim. Waxt jî derbaz dibû. Wî jî derheqa gundê me, mala kalkê min de digot, ha digot. „Heyran ew evqas tişt ji ku zane, -ez difikirîm û min qerar kir, ku mena hatina xwe ji rojeke din re bihêlim, xatirê xwe jê bixwazim, herim. Min ew pir mijûl kir, şerm e."

Ew bû ezê rebûma, jinişkêve navbirî da axaftina xwe û pirsî: Em ketine xeberdenê, min nepirsî xwendina te çawan e? Çawa cî bûyî? Em çi dikarin alî te bikin? - Min razîbûna xwe got û deftere helbesta nîşan dayê. - Ha, şiêran jî dinivîsî? - defter ji destê min girt. Demekê lê nihêrî û got,- hela evê bixwîne. - Min xwend. - Ya peyê re jî. - Min 6 heya 7 helbestê biçûk jê re xwendin. - Na, nivîsarê te de pirîsk hene -got - heftiya tê, li mala nivîskarên Ermenîstanê êveriya me ye. Tu jî were, him tê nivîskare nasbikî, him jî li wir şiêrekê - dude bixwîne. Çiqas şayîrê me çi dibêjin? Wisa ez ketime nave refê wan maqûla.

Ji wê rojê heta sala 1990, wextê çû ser diloveniya xwe, 30 salî, bawerkî heftê tunebû ez rastî wî maqûlî nehatama. Bîranînê pir xweş bi wî ve girêdeyî ne. Ne ku ez tenê, guhê wî liser rewşenbîrê me ye wê demê teva bû. Bi destanînê me ve şa dibû, tengasiya de digîhîşte me.

Di mala xwe de jî aliyê xweyîkirina ziman, erf-edet, rabûn-rûniştandinê miletiyê de nimûne bû. Wextê diçûyî mala wî, tedê bigota ketî maleke esîrê qedîmî.

Keda wî pir e. Ez pir tiştî jê hîn bûm. Xwedî merîfeta bilind bû.

Heciyê Cindî Cewarî, di sala 1908 de li Qeza Qersê, gundê Emençayîrê ji dayika xwe bûye. Wê demê Qers di bin bandore dewleta Rus de bû.

Di sala 1914 de dest bi şerê Hemdinyayê Ewlîn dibe. Cîhan lihev dikeve. Dewleta Osmaniyê berê şûrê xwe dide gelê Êrmenî.

Ji Kurdê Êzîdî re jî rojên reş tên. Li Rûsyayê jî dest bi Şoreşa Oktobrê dibe. Leşker û qewatên Rûsa dikşin, diçin. Ew war dimîne di devê „Roma reş" de. Leskerê Osmanî û Alayên Hemîdiyê mîna pereniya gure dikitine heremê. Dewleta Tirk Kurdê misulman û Êzîdiyên wir jî rêdikin dijî hev. Êzîdiyê Wanê, Surmeliyê, Qersê, gund, mal û milkê xwe dihêlin, ber bi Ermenîstanê ve direvin.

Mala bavê Heciyê Cindî jî direvine Ermenîstanê, gundê Elegezê. Ji xelayê, nexweşiya, zulm û qana Tirka qira teva tê. Ji şeş neferê mala bavê Hecî, tek ew û birayê xwe dimînin. Ew jî di sala 1919 de dikevin sêwîxana Amêrîkayê ya li bajarê Alêksandirepolê (Gumriyê).

www.sivakurdi.org

Di sêwîxanê de gelek talî-tengiya dibîne, heta zimanê diya xwe jî winda dike. Nivîskar derheqa wan sala û serhatina xwe bi ilmdarê mezin Qanatê Kurdo, ku wê demê ew jî sêwiyeke mîna wî bû, wisa dinivîse:

„Di Sala 1926 de ez ji paytexta Gurcistanê, ji Tiflîsê vedigeriyame Ermenîstanê; êtîmxana bajarê Lênînakanê, li kîderê dimam. Apê min Têliyê Esed, ku îdî li bajarê Tiflîsê dima, ez verêdikirim. Li îstasyonê, hema pêşberî me niskêve dengekî wa bihîst: ´Oro, ro-ryo.´ Hinekî ji me wêdetir yekî soltemizkir, li kincên min yên cî dinhêrî û dikir, ku bi min re xeberde. Bextê xireb, îdî ew çend sal bûn min kurmancî jibîrkiribû, nizanbû bi pakî xeberdim. Gava, ku min dengê xwe nekir, wî bi laqirdî çend xeberê dinê gotin, çika çire „xwe nagirim" pê re xeberdim. Apê min wê demê ha-hanga nêzîkî wî bû, çiqas min tê derxist gotê, wekî ´kurmancî nikare xeberde.´ Hêja wî zilamî halê min fêm kir. Wê lezê me bi teherekî nasya xwe da hevdu. Ez pê hesiyam, wekî navê wî Qanat e, di mekteba Apo de (Hakob Xazaryan) dixwîne û pê re jî tê wê derê sola temiz dike, ku çend kapêka qezenc bike. Wî çaxî te digot me herdu cahila halê hevdu fêm kir û wextê xatirxwestin, rêketin, qe nizam çawa bû, em rebûn çûne dest û rûyê hevdu."

Bêguman nabe, dixwîne, gelek ronakbîrên Ermeniya paswextiyê re, ku ew jî mîna wî sêwîxanê de bûn, dibe nas, heveltiyê dike û qirar dike, xwe pêşkêşî pêşdeçûyîn û çande gelê xwe bike. Bona mîaserkirina wan merema xwe pêwîst dibîne, zimanê xweyî dê careke din hînbibe.

Di salên 1929-1930 de li gundên Qundexsaz û Elegezê dersderiyê dike. Di wextekî kin de hînî zimanê kurdî dibe. Paswextiyê em tev şade bûn, ku zimanê wî çiqas delal û xweş bû.


Şekroyê Xudo

Wê demê Yekitiya Sovyêtê hewl dide xwe, ku li welat di problêmên pasdemayînê, nexwendîtiyê de gavên girîng bavêje; wan çareser bike. Li Ermenîstanê xebatên girîng di nave Kurdan de jî dihatine kirin. Di gunda teve de mekteb vebûbûn, bajarê Yêrêvenê de Têxnîkûma Kurdî ya dersderhazirkirnê vebû, dest bi weşana rojnama Rêya Teze û axaftina rediyoya Yêrêvenê bi zimanê kurdî kirbûn. Gerek e, bê gotin, ew kar li ciyê vela pêk dihat. Kurdên jêhatî, xwendî pir kêm bûn. Gel di halê koçeriyê û nîvkoçeriyê de bû; haj çand û kulture xwe jî tunebûn. Di vê pirsê de dostên Kurdan, ewladê gelê Ermeniya pir alîkarî dan.

Di salên 1930-1931 de Heciyê Cindî di têxnîkumê de dersê zimanê kurdî dide, rojnama Rêya Teze de serokiya beşê çandî dike, tevî kevaniya xwe, Zeyneva Îbo wisa jî rediyoya Yêrêvenê de xeberbêjiyê dike.

Ewladê gelî hêja tê derdixist, ku eger paswextiyê de karibe kêrî pêşdeçûyîna çand û kultura gelê xwe bibe, pêwîst e, zanebûnên kûr bên kirin. Di sala 1933 de jibo xwendina doktoriyê dikeve aspîrentûreyê; beşa lêkolîna zargotinê dibijêre û temamya jiyana xwe pêşkêşî berevkirin, çapkirin û lêkolînkirna wê ye zanyariyê dike.

Saya rûnermî, xebathizî û zanebûnê pirelî li nave dinya Ermenîstanê, ya zanyariyê de tê naskirin. Hema wê salê jî dibe endem û hîmderekî Yekîtiya Nivîskarên wê Repûblîkê. Salek di pey re li bajarê Moskvayê kongereya Nivîskarên Sovyêtê derbaz dibe. Ew qewmandineke mezin bû di nave jiyana wî welatî de. Nivîskarê dinê eyan tevî kongrê dibûn. Heciyê Cindî jî tevî çend nivîskarên Ermenî yên bi nav û deng diçe kongrê. Li wir restî gelek nivîskaran tê, bi geleka re dibe nas. 30 salî zêdetir ew endemê serokatiya Yekîtiya Nivîskarên Ermenîstanê bû, serokê beşa nivîskarên Kurd.

Sala 1937 de Yekîtiya Sovyêtê dest bi rojên giran, zulm û rêprêsiya bûn. Çibûka Stalînîzmê serê bi mîlyona evdên bêsûc xwar. Neqenca re meyden vebûbû. Hepis û lagêr tije girtî bûn. Evdên dihatine girtin, gulekirin, zar-zêça ve winda dibûn. Sîbîre sar bi sedc, hezar evde re bû goristan. Kurd jî bêpar neman; hatine girtin, sirgûn kirin, gelek bê ser-berete çûn, winda bûn, venegeriyan. Gelek rewşenbîrên Kurd, yê wê demê jî ketin devê wan rêprêsyan.

Destpêka sala 1937de di rojnama Komûnist de miqalek çap bû. Sernivîsa wê bû „Cesûsa ji Yekîtiya Nivîskarên veqetînin". Li wir di derheqa Heciyê Cindî

de jî dihate gotin. Çendekî şûnde wî jî ji kar derdixin û 18. Aderê 1937 dikin hepisê.

Ew dihate gunekarkirin bona bîr û baweriyê miletçîtiyê, bona ku Xalit Celîl Zade, yê „kontrrêvolûsyonêr" di maka xwe de xweyî kiribû û xebatê cî kiribû (Xalit Celîl Zadê Kurdê musulman bû, ji zulma Tirkan revyabû Ermenîstanê), jibo pistgirtina Erebê Şemo yê „kontrrêvolûsyonêr", jibo namê wî tevî Celadêt Bedirxan hene (Heyf, ku ew name hema wê salê hatine sewitandin), jibo ku ew serokatiyê Êzdiyan dike dijî Yekîtiya Sovyêtê û sersiltaxên din.

Salekê di hebsê de dimîne û bi pistgirtina hinek rewsenbîrên Ermenî tê efokirin. Pey efokirinê re jî demeke dirêj kar nadinê. Bi navçîtiya nivîskarê mezin ya Rwisa, Alêksandir Fadêyêv, hildidine xebatê.

Di 1940 de Heciyê Cindî, dîsêrtasiya doktoriya ewlîn, bi têma „Kêr û Kulikê Silêmanê Silîvî" xweyî dike. Pey salên rêprêsya re temamiya ocaxên çand û kultura kurdî, ku di Ermenîstanê de hatibûn demezirendin, têne dedan. Kar û bar nîvcî dimînin. Xebatkarê wan ji hev bela dibin. Ronakbîrê hêja bêguman nabe, kar-barê xwe bi hêviya rojên ron berdewan dike.

Miqala xwe ya derheqa Heciyê Cindî de Prof. Şekroyê Xudo wiha dinivîse: „Di vê dema giran de Heciyê Cindî xebata xwe, ya zanyariyê û lîteratûryê ve bû berbînî, taqet bona çande me, xwe da ber giraniya mezin, wekî ocaxên çande me netemirin, bigîhîjne rojên fireh."

« Di vê dema giran de Heciyê Cindî xebata xwe, ya zanyariyê û lîteratûryê ve bû berbînî, taqet bona çande me, xwe da ber giranya mezin, wekî ocaxên çande me netemirin, bigîhîjne rojên fireh. »

Di 1941 de hukumata Ermenîstanê bi spartina hukumata merkeziyê qerar kirt, ku Elfabeya Kurda ya Latînî biguhezin ser hîmê Kirîlî. Ew kar sipartin Heciyê Cindî. Wextekî kin de wî ew kar pêk anî û Elfabeya nû aliyê hukumatê de hate qebûl kirin. Elfaba nû bi tîpê Kirîlî seba dibistanê gundê Kurde hazir kir di 1946 dida çapkirinê. Bi vê Elfabê, ku heta naha deh care çap bûye, ne ku tenê zarokê Kurdê Ermenîstanê, lê wisa jî yê Gurcistanê, repûblîkên Asiya Navîn xwendin û hînî nivîsandina zimanê deyîkê bûn.

Nîvê salên 50 de di Ermenîstanê de dîsa rojên xwes seba pêşdeçûyîna çand û kultura Kurdan hatin. Dîsa dest bi çapkirina rojnama Rêya Teze, axaftinên Rediyoya Yêrêvenê herrojî bûn. Têxnîkûma Kurdî ya dersdar hazirkirinê vebû. Heciyê Cindî tevî karê xweyî ilmî barê van ocaxa jî hilgirt. „Gava di 1955 de Rêya Teze dîsa destpêkir derket, Heciyê Cindî tevî hogirê xwe, êtnograf û şaîrê Kurd Emînê Evdel dersderiya me, xebatçiyên Rêya Teze kirin; wekî em zanebûna xwe ya zimanê kurdî kûr bikin." -katibê rojnamêyî wê demêyî cawder Prof. Şekroyê Xudo bîr tîne. Di 1959 de li Akademiya Ermenîstanê ya zanistiyê de Beşa Rohilatzaniyê tê demezirendin. Li wir Heciyê Cindî 8 sala serokatiyê Koma Kurdzaniyê dike. Akademiya Ermenîstanê jî jibo emekê wî yê mezin dereca Kurdzaniyê de û zanebûnên piralî bêyî xweyîkirina dîsêrtasyayê navê Doktorê Ulmê filologiyê didine wî. Zûtirekê navê Profesoriyê jî distîne. Salê 1968-74 de di Fakûltêta Rohilatzaniyê de ya Unîvêrsîtêta Yêrêvenê ya dewletê demekê beşê Kurdzaniyê vebû. Profesor Heciyê Cindî li wir lêksiya ziman û edebyeta Kurde dixwend.


Emînê Evdel

Profesor Heciyê Cindî, temamya jiyana xwe pêşkêşî folklore gelê xwe kir. Bi hezare nimûnê wê berev kir; ji windebûnê xilaz kir, derheqa pirsgirêkên wê ye tevliheve-ne eyan de lêkolîn û îzgeriyê girenbaha ji me re hîşt.

Di 1936 de wî û Emînê Evdel Folklore Kurmanca çap kirin. Ev berevoka çavkanîke zargotina Kurdî ya nemirî ye û çiqas diçe qîmetê wê bilindtir dibe. Ev berevoka, hela dema Komare Mahabadê aliyê Qazî Mehmed de bilind hatiye qîmet kirin.

Folklorzanê eyan bi 5 cilden hikyatê gel (salê cude), berevoka Mesele û Xeberokên Cimeta Kurde, ku 800 rûpel e, di sala 1985 de neşir kir. Lêkolînê wî ye girenbiha derheqa êposa Dimdimê, tevgirêdenên afrendinên Şêkispîr biryarên folklore Kurde re, veryantên Rostemî Zal û

www.arsivakurdi.org

Koroxlî li nav zargotina Kurde de, mêtodolojiya çêbûna stran, efsane, çîrokên mêreniyê, sîn û sayê û hwd.

Heciyê Cindî xebatên berbiçav kirye di dereca zimanzaniya Kurdî de, wisa jî gelek helbest û kurteçîrok nivîsîne.

Wextê mirov kirina folklorzanê mezin re dibe nas, ecêvmayî dimîne, ku mirovekî çawa karibûye hunereke (mîreteke) ewqas mezin pey xwe bêhêle:

- 15 kitabên folklorzaniyê û edebyatzaniyê
- 2 berevokên zargotinê
- 7 kitabên zanistiyê yê pêdegogiyê
- 33 kitabên dersa
- 19 berevokên tercuma
- Romana Hewarî (Kurdî, Ermenî, Rusî)

Kar û barên wî ji aliyê Yekîtiya Sovyêtê û hukumata Ermenîstanê bi layîqî hatin qîmet kirin. Ew hêjayî navê Şu-xulven û Zanistiyê Emekder bû, kîjan didene zanyarê mezine bi nav û deng. Wisa jî bi gelek ordên û mêdela ve hatiye rewakirin. Lê qîmetê her mezin ev hurmet û nav e, ku wî dilê gelê xwe de hîştiye.

Liser romana Hewarî

HEWARÎ kul û jana gelê Kurd e, êsa bi dewr û zemana. Bi jiyana êlekê nivîskar temamya nakokî û problêmên nava gel de, sebebên bêtifaqî, bindestî û hejariya wî tîne holê û liber xwendevena redixe.

Roman liser qewimandinên bûyî hatiye nivîsar. Nevs û nîgarên romanê tev jî mirovên eslî ne, qewm-pismamên nivîskar in. Ew bûyêr çawa derbas bûne, çawa qewîmîne û çawa hebûne, wisa jî bê zêdekirin, reng û awazên zêde rokirye ser kaxêz. Wî, mîna çîrokbêjekî oden, bi zimanekî delal, di derheqa kal-bavên xwe; êla Sîpka de gilî kiriye. Heta navê evde, cî û ware, sal û dem jî neguhestiye. Mirov bê saşî wê romanê dikare hesavke dîroka Kurdên Êzîdî, yên êla Sîpka, di dema nîvê sedsaliya 19 de heta nîvê sedsaliya 20 bibîne.



Romana Hewarî

Bi nûçekê derheqa soresgerekî Şoresa Oktobrê, yê eslê xwe Kurd, Fêrîk Polatbêkov de roman dest pê dike.*

Fêrîk, dema Şoresa Oktobrê Rus tên herema Sîbîrê, bê ser û berete winde dibe. Xwiska wî, Nûrê Polatbêkove û xizmê wî derheqê de tutistî nizanin. Pey gelek salan re serokatiya repûblîkê Ermenîstanê namekê ji Rusan distîne. Nivîskarê namê, hevelê Fêrîkî berê, nivîskarekî Rus e; hêvî dike derheqa kal-bav, qewm, gund û warên soresgerê mezin de melûmetiya jê re bişînin.

Nivîskar wê cawê dike firêta romanê û dîroka kal-bavên Polatbêkov ya êla Sîpka li ber xwendevena vedike.

Sedsaliya derbazbûyî de êla Sîpka, ku eslê nivîskar jî jê tê, dibe du parçe. Malmezina wan, malbata axa perçekî ve diqulibin ser ola Musulmanyê, xwe dispêrin dewleta Osmaniyê û bi hêlandeyîna dewletê, birepismamê xwe ye ser ola kevn têne xezevê. Dest bi neheqiyê, zulmê û tiregêdiya êlê dibe. Qewm-pismam hev temûl nakin, dikevin qirka hev, dibine neyar.

Yên ku berê li sîn û sayê hev bûn, xal-xwarzî, ap-birezî bûn, keçê wan di malê hev de bûn, serê xwe li ber hevde didin, nanê hev heram dikin, heta xêre bavê hev jî naxwin, dibine „dîn dijmin"... Gilî digîhîje qirkirinê. Tev leskerê Osmaniyê, bi serokatiya mala axê êrîsê dibine ser Êzdiyên Sîpkî, ku qirkin. Jinek diçe pêşiya wan laçka serê xwe vedike devêje ber piyê wan. Xîreta miletiyê dilê axê de siyar dibe, gure zapitê Osmaniyê nake, ji xwestina xwe posman dibe.

Êzîdiyên Sîpkî dibînin êdî li wire jiyan nabe, boy parestina ol û heyîtiya xwe, bi zehmet direvin wî warê Qersê, ku di bin hukumê dewleta Rus de bû. Wire ji xwe re gunde sên dikin, dijîn.

Dewleta Rûs aliyê hinek xalên heqê îsaniyê de ji dewleta Osmaniyê pêsdetir û dêmokretîtir bû. Wire zulma liser evde ya seba dîn, mezheban, miletiyê û ziman tunebû. Her kesî karibû aza, serbest ola xwe bihebande, îyd-erefatên xwe derbazbikire. Ev qewlana, bi heqî jî Êzdiyan re xilazbûn bû. Lê vire jî zorderî û neheqiya çînovnîk-quluxçiyên dewletê, axa û begên Kurdan liser xelqê zêde kêm nîbû. Vire jî ruswet, talan, dizî û xirabî hebûn.

www.arsivakurdi.org

Dewleta Rûs mala Emerîkê Polat dike malmezina wan, Eliyê lawê Emerîkê jî dike axê wê êlê, pêre jî quluxçiyê dewletê. Egît axayê birayê Elî axê, keçeke dergîstî bi destê zorê direvîne. Dema revandinê xwîşka keçikê tê kuştin. Seba wî sûcî Egît û du hevelên wî sirgûnî Sîbîrê dikin. Hevalek li wir ji qewlên sirgûniyê û serma Sîbîrê dimire. Halê Egît axê jî giran dibe, mecbûr dibe qewlên Êzîdîtiyê biterikîne û jineke Rus re bizewice. Du law û keçek wan re dibin: Fêrîk, Baso û Nûrê. Egît axa jin û zarokê xwe ve vedigere gundê xwe, Dîgorê. Civaka Êzdiyan jinika xaçparêz qebûl nakin. Jinik zarokên xwe hildide carke din paşde diçe. Li wirê dê û zarok dikevne halê xirab. Egît axa dizewice. Namê ji Fêrîk distîne, ku diya wan miriye, zarok bêxweyî mane. Egît diçe Nûrê û Baso tîne. Fêrîk, çimkî xwendinê de bûye, li wirê dimîne. Ew jî havîna tê cem bavê, paşê diçe xwendinê.

Dest bi şerê Hemdinyayê yê Ewlîn û Şoreşa Rus dibin. Qewatên Rusa ji heremê dikşin, diçin.Ew dimînin devê leşkerê Roma reş û alayên Hemîdiyan de. Rojên res tên. Êzdî dîsa cîşihitî dibin, direvine Ermenîstanê, li gundên Êzdiyaye pala çiyayê Elegezê. Di rêve de qire wan tê. Lê bi revê ew xilaz nabin. Xwînxwar digîhîjine gundên Elegezê. Çem bi xwîna evdan dikise. Elî axê bi cesaret dikujin. Koka Êzdiya tê. Bi hezaran zarok sêwî dimînin, nava wanda wisa jî xudanê vê romanê. Tave Şoreşa Oktobirê dide Ermenîstanê jî. Êla birînder dîsa ser xwe de tê, lê Fêrîk Polatbêkovê şoreşger wisa jî venagere. Ev tiregêdiya kal-bavê xwe, ku sadekî wê jî nivîskar bi xwe bûye, bi hostatî tîne li ber çavên xwendevenan. Bi keser derheqa axa, beg, serokeşîrên qure, nezan, qafseqet, erf, edetên gele bêkêre ziyander û nezanî, xizaniya gelê Kurd de dinivîse. Mirov dema pirsgirêkên romanê de hatine bilind kirin dinhêre, tê bêjî yê îroyîn in; dîsa ew neyarê xwînrêj in, dîsa nav Kurde de bêtifaqî, qebîlatî, nakokî, nezanî, dîsa rev û bez, koçberî, penabirî. Di romanê de tê gotin, ku xilaziya gel tifaq û yekîtiyê de ne.

Weşanên ROJA NÛ

Zimanê romanê xwes û gelêrî ye. Bi mesele, metelok, xeberok û strenên gelêrî roman hatiye xemilandin. Her gotinek li ciyê xwe de ne, bê şirovekirin, şîret, temî û sipartinê zêde, ew jî qîmetê romanê hê bilind dikin. Dîdem, sifetê romanê wisa rind hatine nîgarkirin, reng û rewş wisa baş hatine kişandin, tê bêjî wêneyên çiya, gelî, geboz, zozan, guhêr û gundên Kurdan e. Ev romana delal destanîneke edebyata Kurdê Sovyêtê ye. Pêwîst e, her Kurdek wê bixwîne.

Navnîşana têkiliyê

Romana Hewarî
Heciyê Cindî
Ji weşanên Roja Nû
ISBN 91 7672 045 4
Gustavslundsv. 168 A, 1 tr
165 51 Stockholm/Schweden
Fon: +46 (08) 262375
Fax: +46 (08) 253857
E-Mail: info@rojanu.org

Mala mezin

MECÎD KURDO

Lihev kombûn hindek xortên ciwan
Gazî kirin keç û xort û mêran
Jinav wan hebûn dunavên hêjan
Digotin: „Hewar, em mane bê hêlîn û bê derman".

Werin em ava bikin maleke mezin û ciwan
Li bajarê Oldenburgê, li Elman
Jibo parastina zimanê bav û kalan
Hatibû kêfa hemû dost û hevalan.

Lê xêrnexwaz çêkir pilan li dûv pilan
Jibo hilwesandina vê Mala Êzîdiyan
Lê pilan kete çem, kete behran
Dewlet Xwedê, Tawisî-Melek û hevalên bargiran.

Êzîdiyên bi xelat û hemû xortên ciwan
Name şandin, piştgirî dabûne nîşan
Digotin: Emê ava bikin „Mêrava Mêran"
Mal ava kirin û ji me re bû hêlîn û derman.

www.arsivakurdi.org

Hevpeyvînek bi Tosinê Reşîd re

PÎR XIDIR SILÊMAN

Em ji mêj ve dizanin, ku Kurdên li Soviyeta berê û nexasim li Ermenistanê û Gurçistanê, yên bi piranî Êzîdî ne. Di destpêka salên 1930 de û heta îro jibo xizmeta çand û dîroka kurdî hinereke mezin dikin. Me navê çendekan ji wan pispor û nivîsvanan bihîstiye, çend berhemên hinekan ji wan jî xwendiye. Rewsa wan ya tal û şêrîn, berxwedan û xebata wan di warê kurdîtiyê û rewşenbîriya kurdî de me hinekî zanîbû, jiber ku dengê me zû ne digehist hev, heta guhartinên pistî salên 1990 li Kurdistanê û li cihanê serî nehilda bûn. Gelekan ji me jiber bûyerên dijwar pista xwe dan welat û qesta Ewropayê kirin û em çend heb ji wan zanyar bûn, ku wan jî ji naçarî wargehên xwe di ci de hîştin û li Ewropayê û li weltên rojava xebata xwe ya pîroz didomînin. Ji wan Prof. Celîlê Celîl, Dr. Eskerê Boyîk, Temûrê Xelîl û Dr. Tosinê Rasîd in, ku ev pênc sal in, koçberî Austiraliyayê bûn. Ew û jina xwe Dr. Nura Cewarî bi serdan hatibûn Ewropayê û li Elmaniyayê çend roja bûn mêvanên min. Me jî bahsa derd û hêviyên xwe kir. Ev piçek jihevpeyvîna me ye:

« Eşkere ye, piraniya Kurdên Sovyetê Êzîdîn e, em dikarîn bibêjîn, ku 90% ji wan Êzîdî ne. Lê piraniya mezinên Êzîdiyên me yên ji Serhedê, Qersê û Wanê di şêrê cihanê yê yekemîn de hatibûn kuştin û piraniya wan sêwî mabûn. »

DÊ: Ji kerema xwe xwe bi xendevanên me bide naskirin.

Tosin: Ez di 1941 de li gundê Kurekend, 30 km nêzîkî bajarê Êrivanê, ji dayika xwe re bûm. Me navê gundê xwe guhart û kir Fêrîk, jiber ku Fêrik şoreşvanekî gundekî Kurd bû û li dora wî tev gundên Ermeniyan bûn. 20 malek li vî gundî hebûn. Min heya pola (sinifa) çara lê xwend, paşî çûm gundekî Ermaniyan, nêzîkî gundê me û xwendina xwe berdewam kir. Di sala 1964 de min xwendina xwe li enstîtuta mamosta temam kir û bûm mamostayê fîzîk û matematikê. Pîstî wê min karê zanyariyê kir û bawernama doktora kîmyayê di 1974 de wergirt. Min karê xwe liser karê zanyariyê di enstîtuta Kîmyayê ya Akadîmiya Ermenîstanê de berdawam kir. Çendek lêkolîn min liser karê zanyariyê hatin çapkirin. Di wextê kar de ez bi teybetmendiya xwe ve mijûl bûm. Lê dema ez dihatim malê, min karê xwe yê liser edebiyat û kurdnasiyê jî dikir.

Cara yêkmîn min di 1961 de gotarên xwe di rojnama "Rêya Teze" de wesandin. Ew ji reportajên liser kesên navdar û terzê jiyana gundiyên me bûn. Her wisa min ji "Radiyoyê Erivanê Pişka Kurdî" re jî dinivîsand. Hingî Xelîlê Çaçanê Mirad berderê radiyoyê bû. Di 1966 de Xelîl gazî Amerî Serdar û min kir, ku ez gotaran liser dîrok û edebiyata Kurdî binivîsînim û ew di bin navê "Ansîklopediya Kurdî" ya Radiyoyê de belav bikin. Pistî hingê Amerî, yê di rojnama "Rêya Teze" de kar dikir, got, ku karê wî zahf e, piska "Ansîklopediya Kurdî" siparte min û di vê piskê de ji 200 gotaran bêtir gotar hatin wesandin. Hingê min çend gotar liser Êzidiyatiyê belav kirin, her çiqas ku zanyarên min liser Êzidiyatiyê kêm bûn jî, lê min sûd ji nivîsînên Rusî werdigirt, mesle ji Yegezarof, Vîlîçîviskî û ji Ansîklopediya Rusî.

DÊ: Kekê Tosin, em te weke helbestvanekî jî nasdikin, te kengî dest bi vehûndina helbestan kir?

Tosin: Di pola hesta ya disbistanê de min dest bi nivîsandina helbestan kir. Lê min qet ev hazir nekiribû, ku rojekê ezê wan çap bikim, lewra gelek ji wan helbestên min nehatin parastin. Di salên xwendekariyê de jî min hûnandina helbestan berdewam kir. Mîkayilê Reşîd û Fîrîkê Yosif heval bûn. Wan ji min pirs kir, ku ez jibo çi helbestên xwe çapnakim. Ew bûn, ku min di „Rêya Teze" û „Radiyoyê Êrîvanê" de belav kirin. Yekîtiya nivîskarên Ermeniyan li Êrîvanê hebû, di nav wê de piska nivîskarên Kurd jî hebû. Li mihrecana (festîvalan) min helbestên Kurdî dixwendin.

DÊ: Kekê Tosin, tu di helbestên xwe de bahsa çi dikî?

Tosin: Di helbestên xwe de min bahsa sosyalistiyê û polîtîkê nedikir, lewra jî heşt salan min

www.arsivakurd.org

nikaribû dîwana xwe çap bikim. Naverokê helbestên min liser Kurdistanê û jiyanê, bîr, hizrên mirovatiyê û pewendiyên mirova û hizrên felsefeyê ne.

DÊ: Kekê Tosin, destpêka xwendina Kurdî li cem we çawa peyda bû?

Tosin: Eskere ye, piraniya Kurdên Sovyetê Êzîdîn e, em dikarîn bibêjîn, ku 90% ji wan Êzîdî ne. Pêsiyên me digotin: „Xwendin ji me Êzîdiyan re gunch e". Lê piraniya mezinên Êzîdiyên me yên ji Serhedê, Qersê û Wanê di sêrê cihanê yê yekemîn de hatibûn kustin û piraniya wan sêwî mabûn. Jiber vê sedemê xwendevanên me çend kes bûn. Di 31. 03. 1930 de berî Celadet Bedirxan bi sê salan Erebê Şemo di gel Ishaq Maragobof rojnama kurdî „Rêya Teze" bi alfbeya latînî weşand. Di gel deng û nûçeyên têde quncik jî dihatin çapkirin. Çend kes ji xwendevanên rojnamê peydabûn û paşî bûn nivîskarên paya bilind: Mîna Erebê Şemo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Casimê Celîl, Ehmedê Mîrazî. Pistî wan jî Qeçaxê Mirad, Wezîrê Nadirî. Qenatê Kurdo ne bi wan re bû, ew di sala 1928 de çûbû Petersburgê (Leningiradê). Di salên 1960 de nivîskarên xwirt û helbestvanên jêhatî hatin meydanê: Mîna Qeçaxê Mirad, Mîkayilê Resîd, Firîkê Yûsiv, Se'îdê Ibo, Egîdê Şemsî û Eskerê Boyîk, Ehmedê Mîrazî, Eli Ebdilrehman, Emerîkê Serdar, Wezîrê Eso, Mîroyê Esed, Babanê Keles, Celîlê Celîl, Ordixanê Celîl û Tîmorê Xelîl. Di xwendingehan (dibistanan) de jî şagirtyên kurd ji sala 1930 û vir de ji kilasa 1 heta 7 bi zimanê Kurdî dihatin perwede kirin û her wiha Enstîtuta perwedekirina mamostên zimanê Kurdî hebû. Şanoya kurdî bi dewletê ve girêdayî hebû. Grupên folklora kurdî hebûn, mi'asên wan jî dewletê dida. Li devera me 11 gundên Êzîdiyan hebûn, yên xwe tevlî xebata kurdî dikirin û tevayî dikişandin. Li sala 1936 nivîskarên me zêde bûn. Radiyoya Kurdî jî di sala 1934 de konferensekî kurdnasiyê li Êrîvanê li dar xist û pirsgirêkên kurdîtiyê yên ferz têde anîn ziman. Sefareta (konsolosa) Tirkiyê gilî û mûdahele kir û Dr. Nûrê lê zêde dikir û got: "Cara yekemîn bû, ku bavê min bi zimanê Kurdî di vê Konfiransê de peyîvî û gotara xwe bi zimanê Kurdî xwend."

Lê heyf ku di sala 1937 de ev xebat tev neman û Dr. Nûrê dîsa lê zêde dikir û digot: "Nameyeke Celadet Bedirxan jibo Haciyê Cindî û yek jî jibo yekî Ermenî ku bi kurdî helbest dinivîsîn, hatibûn, sexmeret nameya Celadet û Haciye Cindî sûrgûn kirin û wan xistin zîndanê. Di 18. Adarê de ew hatin girtin, pistî salekê di 18 Adarê de ew hatin serbest kirin. Hacî ew roj kiribû roja xwe."

DÊ: Erê Kekê Tosin em dîsa vedigerin ser enteresa te ya helbestvaniyê û navê dîwanên te yên çapkirî ji te dixwazin bibihîzin!

Tosin: Li destpêkê min nizanîbû elfabêya erebî bixwînim. Agadarî hewqas zêde liser naverokê şaîrên kilasîk tunebû. Pistî min xwe hînî xwendina kurdî ya bi alfabêya bi tîpên erebî kir, dîsa jî min hewqas di helbestên wan de nedigihîştin, jiber ku têde peyvên erebî, farizî û tirkî hebûn. Heya niha jî helbestên Melê Cizîrî û Herîrî ji me re pirtirîn sembol in. Jiber ku mirov karibe helbestên Ehmedê Xanî fêhmbike, gerek e, ku mirov pêşî sofitiyê û zimanê erebî baş bizanîbe. Me pirtir çand û kultûra ermenî û rusî xwendibû. Lê her çiqas diçû, zanebûna min liser Kurdan bêtîr bû, jiber ku

Qenatê Kurdo mamê min bû. Bavê Qenatê Kurdo zû mir bû. Lewma jî ew pir dihat mala me. Bi çûna û hatinan wî em Kurd û Kurdistan bi me dabû naskirin. Hingî Qenat li Petersburgê li pişka kurdnasiyê kar dikir. Berî wî Orbêlî serokê pişka Kurdnasiyê bû, lê li sala 1959 pistî mirina Orbêlî Qenat bû serokê pişka kurdnasiyê û heta mirina xwe her serokê wê dima.

DÊ: Kekê Tosin te bahsa pişka Kurdnasiyê kir. Kengî kurdnasî li Rûsiyayê destpêkir?

Tosin: Xebata Kurdnasiyê li Rûsiya berî soreşa Oktoberê jî hebû. Wan pûteka baş dida Kurdnasiyê. Ew jî li Petersburgê bû. Japa digel Mela Mehmûd Bayezîdî çendek destnivîs berhev kirin û di sedsaliya 18. de ferhenga zimanan li Rûsiya hatibû çapkirin. Hingê zimanê Kurdî jî cihê xwe têde girtibû.

DÊ: Te bahsa berhemên xwe yên çapkirî nekirin!

Erê, heta niha min sê dîwanên helbestan û şanoyek bi navê Xec û Siyabend çap kirine. Salê carekê me etnologiya nivîskarên Kurd bi navê Bihara Taze li Ermenistanê çap dikir. Heşt salan me ew berdewam kir. Her salê min berhem tê de diwesandin û ji berhemên liber çapê ne:

www.arsivakurd.org

- Destana Derwêşê Evdî (helbest)
- Dîwana helbestan (jibo zarokan)
- Dîwana helbestan (jibo meznan)
- Du kitabên çîrokan

Min gelek gotar ji Rûsî û Ermenî wergerandine Kurdî.

DÊ: Kekê Tosin, kontakt (girêdan) û agedariyên we liser nivîskar û rewşenbîrên Kurdistana Iraqê li çi astî bûn?

Berî gistan min Abdulla Goran naskir û ew dît. Ew di 1962 de hatibû Moskovayê li Radiyoya Kurdî peyîvî. Gelek nameyên doktoran liser şa'îrên Kurd dihatin nivîsandin. Ihsan Fu'ad liser Nalî, Kerîm Eyubî liser Hejar Mukiryanî Marif Xiznedar rolekî mezin leyîst. Pirtûkek bi rûsî liser edebiyata basûr wek kurtedîroka edebiyata kurdî hat çap kirin. Enwer Qadir Caf liser Mewlewî Ebdila Peşêw, liser Pîremêrdî Izedîn Resûl û Sadiq Behadîn û Kamiran Mukrî bi serdan hatin cem me. Her wisa Kurdistan Mukiryanî gelek kitab, yên li çapxana babê wê dihatin çapkirin, ji me re anîn.

DÊ: Kekê Tosin liser bizava rizgarîxwaza kurdî çi agahdariyên we hebûn?

Tosin: Berî her tiştî dixiwazim bibêjim, heke ku ez ne biraziyê Qenatê Kurdo bûma, ezê weha bi kurd û kurdnasiyê ve ne dihatim girêdan. Kurdistan heta hingê ji me re welatê bav û kala bû, lê ji me re xerîb bû. Di 1959 de kovara „Vakrok Sivîta" gotarek liser Kurdistanê hatibû weşandin. Me ew gotar her dem di paxila xwe de digel xwe diparast. Di 1963 Xirosov pistgiriya soreşa Kurdistana başûr kir.

Min di Rêya Teze de doza kurdî ges kir û xelkê me sebarete kurdîtiyê û ew bîtir şiyar bû, bandora kurdîtiyê liser xwendkaran gestir bû. Di bin ala soreşa Kurdistanê de me li sala 1963 Komela Xwendkarên Kurd li Ermenistanê avakir. Hingê komelên bi navê mileta li Sovyetê tunebûn, bitenê me Kurdan komela xwe vekir. Girgoyê Xido, Zorbeyê Emer, Tîtalê Efoy û min komel birêve dibir û zimanê komela me bi Kurdî bû. Armanca me ew bû, ku em gelê Kurdistanê û soreşa kurdî bi xelkê bidin nas kirin û her sal me pilana karê xebata komelê amade dikir. Me semîner li gundan didan. Tevgêra komelê deng veda û kovar, rojname û televîzyona ermenî liser xebata komela me dinivîsî.

« Berî her tiştî dixiwazim bibêjim, heke ku ez ne biraziyê Qenatê Kurdo bûma, ezê weha bi kurd û kurdnasiyê ve ne dihatim girêdan. »

DÊ: Baş e, kekê Tosin. Ji kerema xwe, bi kurtî bahsa rolê Rêya Teze bike!

Tosin: Rojnama Rêya Teze, ya ku cara pêşîn jimara wê di 31. Adara 1930 de hate wesandin, roleke mezin dileyîst, jiber ku rojnameke Kurdî bû û bi zimanê Kurdî derdiket. Nivîskarên me teva nivîsînên xwe têde diwesandin. Mirov vê demê li vê rojnamê binêre, mirov kare dîroka edebiyata Kurdî tê de nasbike. Rojname gist jî ji kîsê hikumetê dihate çap kirin û hejmara çapa wê 5 hezar bû û tev dihatin fîrotîn. Pistî ku Ermeniyan serbixwetiya xwe wergirt, alîkariya hikumeta Ermeniyan jî hat birîn. Du heb xortên me, yên ku ji xelkên Êrîvanê bûn û li Rûsyayê xwedî kar bûn salekê jibo çapkîrna rojnamê alîkariya me kirin. Demekî jî Enstîtuta Kurd ya li Parîs alîkarî kir.

DÊ: Kekê Tosin prestroyîka çi bandor avête ser rewş û xebata we?

Tosin: Dema prestroyîka em Kurdên Ermenistanê gehiştin pileyekê. Ermeniyan nedikir rêya xebata me bigrin, lê problemên aborî peyda bûn, hikumetê lidijî Kurdan dest bi propagandê kir û dixwest Êzîdiyan ji kurdîtiyê veqetînin. Astengî di rêya xebata me de zahf bûn.

DÊ: Rola rewşenbîran jibo piştgiriya van planan çi bû?

Tosin: Me Şêwira Rewsenbîrên Kurd avakir, kontaktên me bi hemû rewşenbîrên Sovyetê, Gurcistanê, Kazaxistanê û Rûsyayê re hebûn.

Me dixwest Kurdan biparêzîn û bi xebata xwe berdewam bikin. Di havîna sala 1990 de me li Moskovayê konferenseke mezin li dar xist, nûnêrên Kurdên Sovyetê gist li wê derê besdar bûn, ronakbîrên Kurdan din jî ji parçên Kurdistanê nûnerên partiyên Kurdistanê jî li konferansê ciyê xwe girtin. Me dixwest çareyekê jibo Kurdan bibînîn û jiber vê yekê jî me di konferansê de hinek biryarên bas standin:

- Kurdên di salên 1930 heya 1940 hatin surgun kirin, vegerin wargehên xwe.
- Mafê xwendina zimanê Kurdî û rewsenbîrên kurd bên parastin.

www.arsivakurdi.org

▶ Îmkanên peyvewendiyan di nava wan û Kurdên Kurdistanê de were dayîn û parastin.

Ev û gelek biryarên din hatin girtin. Pistî konferansê Yekîtiya Sovyet jihev ket û biryarên me jî biserneketin. Û her wisa ser di nava Ezerbeycaniyan û Komara Ermenistanê de ges bû. Rewsa aborî jî yekcar xirab bû. Li Ermenistanê rûmeta çanda kurdî nehat girtin û gelek propoganda lidijî kurdan hatin kirin. Em naçar bûn, û mecbûr bûn, ku koçber bibin. Ji wan jî Şekiroyê Xudoy, Celîlê Celîl, Eskerê Boyîk, Wezîrê Eso, Şerefê Esir, Temûrê Xelîl, Eliye Ebdulrehman, Kinyazê Îbrahîm, Babayê Keles û gelekên din.

Nûra Cewarî di 1941 de li bajarê Êrîvanê ji dayika xwe re bûye. Li dibistanê di destpêkê de muzîk xwend û stranên kurdî dinivîsîn. Bavê wê Haciyê Cindî jê re gelek pistevanî kir û bi hana wê ve tê. Nûra Cewarî di sala 1960 kitaba "Stranên Kurd I." û di 1964 "Stranên Kurd II." çap kir. Û wê her xwendina xwe jî didomand. Tez doktoriya xwe di 1971 de liser "Hunermendiya Stranên Kurdî" wergirt û ew wek kitab di 1976 de hate çap kirin.

Di sala 1983 di piska Entologiya nivîskaran de wê kitaba "Bihara Teze" weşand. Li piska Hunermendiya Akademiya Ermeniyan, ya ku Nûra Cewar tê de kar dikir, teza doktoriya wê û kitaba wê "Behara Teze" hatin çap kirin. Di destpêka salên 1980 de Nûra sê berhevok tevlî Besîr Botanî li Siwêdê çapkirn. Çend gotarên weşandî yên Dr. Nûra liser Tîpologiya "Giramer û Destûra Stranên Kurdî" hene û berhevokek girêdayî vê babetê hazir e û ew jibo çapê li Almanyayê daye Mehemet Bayrak.

DÊ: Xwişka Nûra, tu dikarî ji me re bibêjî, ka ji berhemên bavê te çi hatin çapkirin û çi di arşîfê wî de mane, ku wan heya niha ronahî nedîtiye?

Nûrê: Ji berhemên bavê min yên çapkirî: "Kitaba Dersa, Koma I." û sisê jî jibo dibistanan "Tekstên Folklorî" hene. Lêkolîn: Dimdim, Yusif û Zuleyxa û Hawarî -Behar hat- Xwiska min ya mezin Ferîde, ya ku zahftir di arsîfê bavê min de xebat dikir û çend kitabên ku çap nebûne, li cem wê ne. Bavê min nexwes bû, xwiska min her roj li cem wî rûdinist û bîranînên wî dinivîsîn û dikirin gotar û di "Rêya Teze" de diwesandin.

« Berî her tiştî me rêz û hurmet ji bav û kalên xwe re heye, ku wan dest ji mal û halê xwe berdan û dînê xwe parastin. Lê zanebûna me liser Êzidîtiyê ne ewqas bûn, ku nêva taxê rewşenbîr, şêx û pîrên me jî ne ewqas bûn. »

Mamoste Tosin lê zêde kir û got, ku Haciyê Cindî di 1936 de kitaba „Folklorê Kurdî" li Êrîvanê çap kir. Di 1946 de ev kitab tim liser mêzê Qazî Mehemed bû û wî digot: „Ev Qurana me kurda ye."

DÊ: Erê, kekê Tosin tiştê em dizanin, ku tim jin alîkariya bavê zaroyên xwe dike. Gelo rewşa te û xweşka Nûra çawa ye? Kî ji we pirtir alîkariya kê dike?

Tosin: Min çend salan paletiya kevaniya xwe kir, jibo nivîsandina stranên kurdî ku taybetmendiya wê bû. Ez bawer im, em gelek nêzîkî hev bûn. Dema Nura stran berhev dikirin, min gelek sûd jê werdigirt, çaxê ez tengav dibûm, min guhdariya wan stranan dikir.

DÊ: Erê, xwişka Nura, entresa zarokên we jî jibo warî heye?

Nûrê: Belê keça min ya mezin, Zozan, diploma wê liser dastanên kurdî yên stranan e: Mem û Zîn, Derwêşê Evdî û Didim. Keça me, Aza, dîrok di Enstîtuta Erîvanê xwend û niha li Austiraliyayê lêkolîna xwe ya derbareyî dîroka kurdî didomîne. Wê jî çend gotar di kovarên „Nudem" û „Hîvî" de liser Etnogirafiya Kurdî û Êzidîtiyê weşandine.

DÊ: Erê, kekê Tosin piştî hilweşandina Sovyetê û rewşa ronakbîrên Kurd li cem we têkçû. We livlivînek nekir, ku hun qesta Kurdistanê bikin û li wê derê xebata xwe bidomînîn?

Tosin: Belê, pistî deng û basên serhildana gelê Kurdistana Basur me di 1992 de lîstek ji 100 kesên ronakbîr û pispor amede kir û ew hat rêkirin, ku ew dixwazin herin Kurdistanê kar û xizmet bikin û bi vî sertî, ku li Kurdistanê bitenê xiwarin û cilên me werin dayîn. Heya niha jî Tosina me nehat, lê eskere ye, ku serê birakujiyê dest pêkir.

DÊ: Erê, kekê Tosin we di warê Êzîdînasiyê de çi xebat kir?

Tosin: Berî her tiştî me rêz û hurmet ji bav û kalên xwe re heye, ku wan dest ji mal û halê xwe berdan û dînê xwe parastin. Lê zanebûna me liser Êzidîtiyê ne ewqas bûn, ku nêva taxê rewşenbîr, sêx û pîrên me jî ne ewqas bûn. Hemî kitabên

www.arsivakurdi.org

nivîskarên biyanî liser me nivîsînbû, me xwendin, lê têhniya me pê ne şikest. Me navê Şengalê, ku wargehê bav û kalên me bû, bîhîst bû. Berê, Qewal ji Lalişê dihatin cem me, lê ev yek ne di dema min de bû. Zanebûna sêx û pîrên me jî ne hewqas zêde bû. Pistî kitêba Êzidatiyê ya we çap kir û yek jê jî gehîşte destê Qenatê Kurdo, me zanîbû Ezidiyatî çi ye, Şîxadî kî ye! Me digote sêx û pîrên xwe: „Ha Êzîdiyên me li Iraqê Qewlên xwe top kirin." Gava kitaba „Gundyatî" gihişte me, me bihîst, ku xelkê me çewa kovara „Bingehê Lalişê" Dihokê derdixe û min ji Avstiraliyayê nameyek jê re şand. Sed mixab ku piraniya nivîskarên govara Lalîş bela bûn, lê yên mayîn xebata xwe didomînin.

Ev baş e, wekî niha li Almaniyayê çend mal û bingeh hene, kovaran diwesînin her yekê rêyek bida pêşiya xwe û di warekî de xwe bi pêş ve bibirina. Mala Êzidiyan li Oldenburgê karek rind û dîrokî kirin û dikin. Avayiyekî jibo meşandina xebata xwe lêkirin. Ez dixwazim rêxistinên me yên siyasî û civakî bas tê bigihin. Karên van mal û komelan di xizmeta ziman û çanda kurdî de ye. Gerek e, ew jî wan re pistevan û alîkar bin, lê ew miqeyat bin, ku kes tevlî karê wan nebin û lidijî wan nebin. Em kurd in, me jibo Kurdistanê çi kiriye ji her kesi re eyan e: Çi li Ermenistanê û çî li Kurdistanê. Em gist kurd berê ne bûn. Niha yên dibêjin, ku Êzîdî Zerdeştî ne, wan Zerdeştî û Êzidiyatî şaş fêmkirine. Ev ne karê rêxistinên siyasî ye, biryarê liser bidin. Ev kar karê lêkolînvanan e, ku ew bi rengekî zanistî lê bikolin, ka dê bigehin çî encamê.

Ecêbeke xweş - Nûçeyek ji têlêvîzyona Moskovayê

DÎDERE TÊMÛR

Li têlêvîzyona Moskovayê di kanala Yek´ê de bernameke pir hewaskar heye bi navê „Çi? Li kêderê? Kengê?". Temaşevanên têlêvîzyonê pirsên dijwar û balkêş ji wan re disînin û merivên aqilmend jî, ku di vê bernamê de cî digirin, gerekê bersîvê bidin. Em wê jî bêjin, ku ji hezarên pirsan tenê çend heb têne hilbijartinê.

« Bi gotineke din, jiber ku bi baweriya Êzîdiyan her bûkeke Êzîdiyan jî peyhatiya Hewayê ye, jiber wê jî gerekê jibo kirina Hewayê bûk û jinên Êzîdiya derba wî awayî bixwin. »

Di bernama roja 26. Gulanê de pirsa kurdeke Êzîdî Narîna Temo xwendin, ku bi esilê xwe ve ji Ermenîstanê ye û niha bi malbeta xwe re tevayî li Ûkraînayê dimîne.

Bi pirsê re tevayî jî bi vîdiyoyê dewateke Êzîdiya nîsan den û di wê dewatê de berî ku bûk lingê xwe bavêje mala xezûrê xwe, zava ji ser banî sêva li serê wê dixe.

Pirsa Narînê awa bû: „Gelo çima zava sêvê li serê bûkê dixe? Gunehê (sûcê) kî ye, ku ew wisa dike?"

Bersîv jî gerekê pistî deqekê bê deyînê. Rêvebirê bernamê ji aqilmendan pirs dike: „Gelo hun zanin, ku Êzîdî kî ne?"

Aqilmend bersîvê didin, dibêjin, ku nizanin.

Rêvebir dibêje: „Êzîdî ew komikeke êtnografî ya gelê kurd e, ango perçekî gelê kurd e. Ew li Kavkazê, Îraqê û Tirkiyê dimînin."

Ji aqilmendê yê herî zane bersîveke awa de: „Jiber ku Êzîdî di navbera Kavkazê, Îraqê û Tirkiyê de dimînin û em zanin, ku ew war di dema xwe de bihusta liser rûbarê cihanê bûye û em wê jî zanin, ku hema xût li wirê buyerek bûye, ku hemû jî derheqa wê de zanin, ango, bi gotina gotiya marek helan deye Hewayê, ku sêva ji derê batinî bixwe û ewê jî xweriye û jiber wê jî ew warê jiyînê îdî wek warekî buhuştî ne, hatiye hesibandin, lewma jî kurdên Êzîdî heta niha jî sêva li serê bûkê dixin.

Ango, bi wî awayî heyfa xwe ji şasiya Hewayê hiltînin, ku ew bûye sebebê wê, ku buhust li wir îdî nemaye.

Bi gotineke din, jiber ku bi baweriya Êzîdiyan her bûkeke Êzîdiyan jî peyhatiya Hewayê ye, jiber wê jî gerekê jibo kirina Hewayê bûk û jinên Êzîdiya derba wî awayî bixwin."

Dîdere Têmûr ev nûçe ji rûsî wergerend û nivîsî. Gorî wê bûyere jorin, Dîdere jî yek ji zureta Hewayê ye.

www.arsivakurdi.org

Simoyê Şemow jî kete rêza nemira - Şayîrê Kurda bi nav û deng

WEZÎRÊ EŞO

Destpêka meha Adarê ya 2001 behsa mirina sayîrê Kurda bi nav û deng, hogîrê mînî herî nêzîk Simoyê Şemo li min daxistin, gotin; „Ewî berî du mehan li paytaxtê Ermenîstanê, Erîvanê wefat kiriye." Haya min hê jî nîne, ka gelo wê bela giran konkirêt kengê dest daye; rojeke dawîya sala 2000 anjî destpêka sala 2001? Lê kîjan jî hebe Simo weke 70 sal emîr kir.

Gorî felsefa gelerî bi gistî û gorî folklora kurdî 70 sal weke nîsan sembola kalbûn-pîrbûnê ye. Dibêjin „kalê 70 salî", „pîra 70 salî." Lê eva yekê, yên ku Simoyê Şemo weke sexs, mirov û şayîr baş nas kirine, dikarin bêjîn, qet jibona Simo nehatiye gotin. Tu kesî navê kalbûnê nedanî ser wî û wî bi xwe jî.

Hetanî dawîya jîyana xwe Simo wek şayîr çîk nebû, em dikarin bêjin „stewîr" nebû. Di nava şayîrên Kurd de yên Sovêtîstana berê de, keda wî ya şayîrtîyê yekê here zengîn, mezin bû. Şadatîya vê yekê ji ma re wan berevok, wan destanên helbestên wî dide yên ku ji destpêka salên 60' hetanî niha hatine weşandine: 9 berevok, 9 kîtêb yên bi sernavên cuda cuda û xweşîk:

„Nûr" (1961), „Xetên hubê" (1967), „Hikîyat derheqa balçêma kêda" (1971), „Ez û Êl" (1974), „Gula gêlî" (1979), „Dilê bengî" (1989) û ya dawîyê „Zozan" (2000)

Belê weke nîv sedsalê wî bêwestan şayîrtî kir, afirand, bi rengekî taybetî û xwesîk edebîyata kurdî û nemaze ya li Ermenîstanê dewlemend kir. Simo ji pesindan û mezinkirina xwe hiz nedikir, bilekis wî xwe hertim biçûk didît. Gava di sala 1989 de kîtêba wî ya bi sernavê „Dilê bengî" bi pêsgotina min ya bi sernavê „xwe yê qelema qenc û bi bereket" hate weşandinê, piştî xwendina wê Simo pir bi cîddî gazinên xwe ji min kirin:" Malavayo, te haqas pesnê min daye, ku ez gihandime heyło esmanan."

« Em dikarin wî bişîbînin kanîke zozanên çîyayê Elegezê, ku bi şev û roj av jê dizê. Simo aşiq û maşoqê zozanên çîyayên Elegezê, reşkonên kurmancîyê, zomên kurda û keça kurdên yên bi rengên gul û gîyayên wî cîyayê xemilandî bû. »

Simo her roj diafirand, em dikarin bêjin, ku ew her roj û her gav bi sayîrtî difikîrî. Em dikarin wî bişîbînin kanîke zozanên çîyayê Elegezê, ku bi şev û roj av jê dizê. Simo aşiq û maşoqê zozanên çîyayên Elegezê, reşkonên kurmancîyê, zomên kurda û keça kurdên yên bi rengên gul û gîyayên wî cîyayê xemilandî bû. Ji helbestên wî ne tenê bîhna kulîlkên çîyayê Elegezê, her wusa xişe-xişa gul û gîya, xule-xula cew û kanîyên wî çîyayê tên.

Simoyê Şemo welatevîn û miletevînekî bi şewat e. Di helbesta xwe ya „Gelê min ra" de ew miletevîntîya xwe nava xizmetkirin hindava gelê xwe de dibîne. Îro asîmîlasyon wek bizûzê ketiye nava gele me û gostê wî dikoje, wek zûrîya xwîna wî dimije, helbesta Simo ya bi sernavê „Zimanê Kurmancî" gotineke pir rojane û pir aktuel e. Hinekên dûrnedîtî dibêjin: „Ziman ne haqasî mûhim e, ku em serê xwe liser biêşînin." Lê şayîrê me yê bi nav û deng heyîna milet nava ziman de dibîne. Simo kifş dike, ku ziman ber tûrên neyaran nava zamanê buhurî de bûye mertal û ji nava bahoz û firtone, bobelîsk û tofanên zemandirêj re gelê me „wek nemir" gîhandiye rojên me.

Simo mêrê hewar û gazîyan bû, weke dibêjin barê ketîyan hildigirt, piştovan û alîkarê ketîyan bû, beşdarê şîn û sayên milet bû, comerd mêvandar û nandar bû.

Simo pişti xilaskirina dibistana navîn ya gundê xwe, berê xwe da Êrîvanê û têknîkuma doxtorîyê de hate qebûlkirinê. Lê gava dawî li fêrbûna di wê de hat, wî zemanekî nedirêj

www.arsivakurd.org

li gundên navça Telînê wek alîkarê doxtor kar kir. Û çimkî li vê navçê gundên Kurda jî pir bûn wî li wir bi camêrî xizmeta gelê xwe jî dikir. Lê meramê wî xasima bavê wî ew bû, ku ew bibe esîl doxtor. Di sala 1957 de wî bi serfirazî û rûspîtî Înstîtûta Êrîvanê ya doktoriyê xilaz kir. Ji vê salê hetanî sala 1967 wî li navça Axbaranê, li nava gundên Kurda yê Elegezê wek serokê nexwesxane kar kir û rumeteke bilind di nava rûnistvanên wê navçê de qezenç kir.

Hêmî êl, olka kurdên desta Araratê ya ku Simo ji nava wê de derketi bû, wek doxtorê xwe yê eslî ew nasdikirin. „Êl"ê wî ji dûr ve dihat, ew jî bêwestan xizmetê wan dikir. Ew hemûsk alîkî, ez niha derheqa vê yekê de jî xemgîn im û pir difikirim: Gelo ew kalemêr û pirejîn, ew keç û zilam, ew zarokên me wê bê Simo çawa bikin, wê derdê xwe ji kê re bêjin, weke dibêjin „li kê bisekinin?" Simo sernavê „Ez û Êl" danî bû ser destaneke xwe. Niha ew „Êl"a giran wê bê Simo çawa be? Weke min got, Simo hogirê minî pir nêzik bû. Gelek bîranîna me yên bas heye.

Min Simo mirîtî nedît û tê qey bêjî bawerbûna min ya tam jî nayê, ku ew îdî tune. Belkî loma jî wek dayîka Rizayê Xêlît li min dest bide, ku kilam avîtîye ser kurê xwe û wê kilamê dengbêjê kurdî bi nav û deng Şekro distrê. Belkî gava ez herme Êrîvanê li ciye karê te, li mala te, li te bigerim û bi dilekî kovan bikim gazî": „Simo kanê!"

Navnîşana têkiliyê

Bi reya kovara Dengê Êzîdiyan

Rojnama kurdî ya here jiyandîrêj - Rêya Teze

TÊMÛRÊ XELÎL

Lihevhatineke sembolîk e, ku ev gotare min ya derheqa rojnama kurdî ya here jiyandirêj - "Rêya Teze" de, di kovare kurdî ya here jiyandirêj (ji yên bi zarevê kurmancî) - "Roja Nû" de ronahî dibîne.

Gave peyv tê ser rojnamegeriya kurdî, nizanim çima berî giska kovare "Hawar", rojnamên "Kurdistan" û "Rêya Teze" têne ber çavên min. Her yek ji wan serdestîke wan heye û rola wan di pêsketina rojnamevenîya kurdî de pir e. Lê ew nayê wê manê, ku kovar û rojnamên mayîn, xwesma yên bi zarevê soranî û dimilî, ji wan kêmtir in, anjî ber wan dedixun. Na! Haya min gelek liser wan tune. Û ji wan jî "Rêya Teze" ber dilê min diha ezîz e: 1. Jiber ku ew rojnama kurdî ya ku her jiyandirêj e li cihanê. 2. Dengê kurdên Sovyetistanê bû (hetanî sala 1992) û niha jî dengê kurdên Ermenîstanê ye, yên ji welatê kal-bave dûr in. 3. Wê bi tevayî 50 salan zêdetir ji aliyê dewletê, bi fermî ronahî didît (niha jî - serbixwe ye), ango resmî bû û organa Komîtêya Navbendî ya Partiya Komûnîstiyê ya Ermenîstanê, parlamênt û hukumeta komarê bû. Yek ji çar rojnamên sereke bû li komarê. 4. Ez 17 sala redeksiyona wê de xebitîm.

"Rêya Teze" di 1. Nîsana sala 1930 de ronahî dibîne. Ew bi tîpên latînî bû, yên ku Erebê Şemo tevî Îshak Morogûlov çê kiribûn. Lê çi mixabin, ku di 1937 de bi biryara Stalîn wesandina wê hate sekinandinê, hetanî sala 1955. Wî çaxî Harûtyûn Mkirtçyanê ermenî, paşê jî Cerdoyê Gêncoyî kurd berpirsyariya wê dikirin. Ji roja ronahîdîtina hejmare wê ya pêsin 67 sal derbaz bûne, lê jiyandirêjiya wê ya rest 50 sal e.

Pistî mirina "bavê mileta" (Stalîn re digotin) di sala 1955 de "Rêya Teze" dîsa hate wesandinê, lê vê carê bi tîpên kîrîlî. Ew tîp Heciyê Cindî yê nemir çêkiribûn. Berpirsyarê wê ji wê salê hetanî Perestroykayê, ango 34 salan, Mîroyê Esed bû. Ew ji hemû berpirsyarên rojname û kovarên Sovyetistana berê wek berpirsyar dirêjtir xebitî. Belkî hêja ye, ku navê wî bikeve nave "Pirtûka Gînnes ya rekore" jî. Dereca nivîsarên rojnamê pir bilind bû, lê kurdîtiya wê nimiztir bû.

Çiqasî jî sîstêma sosyalîst "perde hesinî" çêkiribû û me nikaribû rojnama xwe de derd û kul, dexwaz û armanc, hisret û hêviyên xwe wek me dixwest rexin ber çavên (hinek ronakbîrên me yên tirsonek jî ser wê "perde hesinî" yeke din ji "polayê" çê kiribûn), alîkî ve jî Stalîn miribû , lê Stalînîzm jînder bû, hela kokbir nebûbû, lê dîsa jî "Rêya Teze" dengê kurdên Ermenîstanê, serbilindiya me bû.

www.arsivakurd.org

Qîmetê rojnama me ya herî bilind ew bû, ku carna jimare aboneyên me di salê de digihîste 5 hezar kesan. Ew jî wî çaxî ku li Yêrêvenê 8 hezar kurd diman, lê li Ermenîstanê bi teveyî - weke 60 hezar e. Û nav û dengê rojnama me ewqasî bilind bû, ku navê wê kataloga Sovyetistanê û ya navneteweyî de jî hebû. Jiber wê jî aboneyên me ji komarên Sovyetistana berê û Awropayê jî hebûn. Û rojname bû bingeh, ku helbestvan, nivîskar, ulimderên kurd peyda bin, gel bi kurdîtî perwerde be û bi pês ve here.

« Jiber wê jî karên rediyoya me, rojnama "Rêya Teze", beşên kurdzaniyê bûbûne kelemên çavê dijminan û neyaran, xwesma yên tirkan. »

Rast e, "Rêya Teze" ya hukumetê bû, siyaseta wê û Sovyetê dimeşand, carna jî digotin, ku ew ne ya kurda ye, lê rojnama Ermenîstanê ye bi zimanê kurdî, dîsa jî herdem ji çar rûpela bi kêmanî yek bin destê me de bû. Û me ew rûpel çiqas bas bi kar baniya, dîrok, çande, edebiyat û zimanê me jî wê ewqas bas pês de biçûya. Û rojnama me heftê du caran derdiket, ango mehê 8-10 rûpel bi kurdî ne hindik bû. Lê wek gelek ciya û gelek caran, bal me jî kurdîtî ne herdem ser her tistî re bû.

Di hêlekê ve jî, welatên ku Kurdistan nav xwe de parevekirine, guhê xwe bel dikirin û çavên xwe zoq dikirin, bona nehêlin kurd ji çarçove tixûbên wan der jî, li welatekî mayîn, heqê xwe bistînin - ziman, çande û edebiyata xwe pêşde bibin. Jiber wê jî karên rediyoya me, rojnama "Rêya Teze", beşên kurdzaniyê bûbûne kelemên çavê dijminan û neyaran, xwesma yên tirkan. Û pêsketina me ji xwe re tehlûke didîtin.

Dewleta Tirkiyê gelek cara bi rêyên dîplomatîk hewl daye, ku ev ocaxên kurdan bêne berbendkirinê. Jibo nimûnê xebatkarê dîplomatiyê yê Sovyetistanê li Yêrêvenê Neymark di nama xwe ya jibo wezareta karên der ve ya Sovyet re şandî de (05.04.1935) ev xet jî nivîsîne: "Merciyên xwedî qerer yên Ermenîstanê bi himet serokatiya rojnama "Rêya Teze" dikin. Rojname wisa miqate û bi tahamûl e, mirov dikare mihakeme bike, ku konsûlên tirkan yên vê derê, nikaribûn tu qulpan jêre bibînin. Wek tê zanîn, hemû hejmarên wê ji teref tercûmanên tirkan gelekî bi himet tên tercûme kirin" (Kovare Çira, hejmar 12, sal 1998, rûpel 11). Rûpela 12 ya wê kovarê de tê gotin, ku Neymark nameke xwe ya mayîn de (09.05.1935), ku ji serokê qismê 1. yê wezareta karên der ve yê Sovyetistanê re şandiye, awa nivîsiye: "Li gor agahderiyên di destê min de demek berê Arel û Yilmaz di derheqê pirsa kurdî de reporek bi dizî hazir kirine. Li gor înformasyonên di destê me de muhtewa vê reporê ev e: Li Êrîvenê rojnama "Rêya Teze" hebûna xwe berdewam dike. Hebûna wê liser tixûbê Tirkiyê jibo me tehdît e û îşareta dijminatiyê ye".

Tirkiye bin perde ku wê pêwandiyên dîplomatîk tevî Sovyetistanê bibire an serttir bike, bi destî şerletaniya û zorlêkirina gelek caran Sovyet mecbûr kiriye, ku mafên ku dene kurdan hilînin. Û di wî warî de gihîştiye hinek destanîna. Hukumeta Sovyetistanê biryarên nû qebûl kir bona kêmkirina wan mafa. Mesele, ji sala 1935 name û nivîsên merkeza kurdzaniyê yên bi der ve re dihatine kontrolkirinê. Ji rojnama "Rêya Teze" re îdî bi resmî qedexe bû pirsên kurdên der ve re mijûl bibe, rêkirina rojnamê û pirtûkên dersan û yên edebî ji welat der hate berbendkirin. Bênamûsî û bêserefiya vî awahî dikare tenê hinkûfî dewleta Tirk be, ku li bal me bi heqî navê Roma Res lê kirine.

Tevî van dijwariyan û xêrnexweziyan, bi tevayî em dikarin bêjin, ku me jibo gelê xwe arşîveke dewlemend, kêrhatî hîştiye. Dimîne, ku lêkolîner û ronakbîrên kurdan yên mayîn kurdewariya wê rojnamê bikine hebûna kurd û Kurdistanê.

Di 10.10.1997 de li Stockholmê Pirtûkxana kurdî bi heytehol hate vekirin. Ez bi vê firsendê vê gotarê dinivîsim û bi navê kurdên Sovyetistana berê wê bi dil û can pîroz dikim. Bi baweriya min, eger serokatiya wê hemû komplêktên "Rêya Teze" ji redeksiyona wê bikire (ji sala 1955 vir de 42 cild hene, di her yekê de ji 100 zêdetir hejmar), ewê him kêmaniya xwe ya weşana kurdî dagire, him jî rojnama kurdî ya here jiyandirêj wê jiyana xwe hîn bastir berdewam bike, jiber ku ev çend sal e, ku dewlet alîkariyê nadê û ew mehê carekê-dude ronahî dibîne. Ew jî bi piranî bi alîkariya gel. Eger rojekê ji rojan "Rêya Teze" hate girtin, ew dê şermeke mezin be jibo me û derbeke giren be jibo dîroka rojnamegeriya me. Wê demê êdî hewar-gazî bê feyde dibe, berga tistekî nagire.

www.arsivakurd.org

Jibo agahdariya we zêde liser "Rêya Teze" hebe, ez dixwazim we bidime hesandinê, ku bilî komplêktên wê, arsîve navbendî ya komare Ermenîstanê de hemû nivîsarên jibo rojnamê hatine sandin (yên çapkirî jî, yên çapnekirî jî) têne parastin. Gelo destxetên (destnivîsên) Erebê Semo, Ebdula Goren, Heciyê Cindî, Îsmet Şerîf Wanlî, Qanatê Kurdo, Hejar, Çerkezê Xudo, Margarîta Rûdênkoyê, Emînê Evdel, Ahmedê Mîrezî, Wezîrê Nadirî, Reşîd Kurd, Nadoyê Xudo û gelekên mayîn, bi sedê name û wêneyên welatparêzên ji Kurdistanê û ji ciyên mayîn îro jibo me ne tiberk û nivist in? Ew materyal xezîneke girenbuha ne jibo kurdzana û hemû welatparêzan.



Rojnama Rêya Teze

Pêwendiyên "Rêya Teze" û kovare "Hawar"ê

Gava kovare kurdî ya delal "Hawar" dest bi wesana xwe dike, çend hejmarên "Rêya Teze" û hinek pirtûkên kurdî yên li Yêrêvenê derketî ji wan re tê şandin. Kovar hejmare xwe ya 8 de ya sala 1932 bi nasnavê Herekol Azîzan nivîsa Celadet Bedirxan ser yê meselê çap dike. Em binihêrin çika li wir çi tê gotinê:

"Rûjnameke kurdmancî, bi herfên nû, bi kurdmanciyeke xwerû, li Rewanê, di siklekî spehî û çeleng de derdikeve. Vê pasiyê çend hejmarên wê gehiştine destê me. Çavên me pê bi ruhn bûn, dilê me sa û ges bû. Kurdmancên Rewanê ji rûjnamê pê ve çend kitêb jî derêxistine. Me sê-çar rûj mijûlahiya xwe bi wan kirin.

Ji nav rûpelên wan ên taze û ter bihna kulîlkên çiyayê Elegozê, bayê zozanên Serheden dihatin. Di nav resmên wan de sal-û-sapikê kurdmancî, xencer û pistxencere kal û kalikên me dihatin dîtin. Rêya Teze wek navê xwe taze ye, nû ye, nûbar e. Lê ji Hawarê kevintir, bi emr jê mezintir e. Hejmare wê a pasin ko gehistiye destê me a pêncî û nehan e. Li gore ko Reya-Teze rûjnameke dehrûjkî ye, berî salkê û hin dest bi derketinê kiriye." Di wê hejmarê de Celadet Bedirxan ji pirtûkeke ji Yêrêvenê şandî du helbest weşandine û dewiya nivîsa xwe de ha gotiye: "Jibona îro me hevqas got, pêşdetir em dîsan ji -Teze behs bikin. Em ji hevelê xwe re rêyeke xwes û dewiyeke ges hêvî dikin. Divêt ko her gav me hay ji hev hebit û gerek e, ko em hevdu ser xebata hev serwext bikin". Rest e, "Hawar"-ê bas nekiriye (û rest jî kiriye), ku kê ew hejmarên "Rêya Teze" û pirtûkên kurdî ji Yêrêvenê ji wan re şandine, lê em zanin ku ew Heciyê Cindiyê nemir bûye û bona wê yekê dewletê ew girt, kire hebsê. Rest salekê ew zindena Stalîniyê de ma, lê kubar bû, ku bona wî karî li wir maye.

Bila haya we pê hebe, ku 50 salî zêdetir 10-12 xebatkarên redeksiyona rojnamê her ro 8 seheta ser amadekirina her hejmareke wê kar kirine û bilî wê jî bi dehan nûçegîhan, nivîskar û zanyar bi nivîsarên xwe pêre hatibûn girêden. Yek ji wan - Egîtê Sinco ev 43 sal e, ku rojnamê re dinivîse. Û bi çi dijwariyên nedîtî! Bi têknîka kevintirîn, her xeteke wê ser gulla qirqeşûnê rêz dibû, dikete sitûnê, dibû rûpel û pasê jî hejmar. Çar emê çawa bextê xwe bisewitînin, heyre wî karî û wan camêre nîbin? Û jibo karê bas di sala 1980 de, roja 50-saliya ronahîdîtina hejmare xwe ya pêşin de, rojname ji aliyê hukumeta Sovyetistanê de bi xelata "Nîşana hurmetê" ve hate xelatkirinê. Piraniya xebatkarên wê, yên berê û niha, endemên Yekîtiya Rojnamevenên Ermenîstanê ne.

Gava em îsal 100-saliya rojnamegeriya kurdî bi heytehol didine kivşê, heyfa xwe pê tînin, ku xebat û cêribandina "Rêya Teze" ji aliyê hema bêje hemû rojname û kovarên kurdî, yên piştî wê derketî, nehatine bi karenînê. Bêy ku haya wan ji hev hebe, hatine weşandinê. Sebebên wê hene jî (wek, bi alfebayên cihê-cihê ronahî didîtin, sînorên Sovyetistanê jibo her kesî vekirî nînbû), lê wek bi kurdî dibêjin, "yê ku dixweze çare dibîne, yê ku naxweze maniya dibîne". Ew hevrekarkirin, denûsitandin û hajhevhebûn wê dereca rojnameveniya kurdî hîn bilindtir bikirena. Lê niha ew problem

www.arsiwakurd.org

hatiye hildenê û kêmaniya berê dikare bi xebatên kêrhatî ve bê tijekirinê. Xwesma, ku îro him sînor vekirîne, him jî arşîv. Îro di redeksiyona "Rêya Teze" de sê kes kar dikin: berpirsyar Emerîkê Serdar, cîgir Grîsayê Memê û nûçagîhanê giştî Rizganê Cango. Mêreniya ew dikin (bi meaşekî biçûk) hêjayî qîmetê bilind e. Bilî navên jorgotî, îro em bi hurmetgirtin navê wan kesan bi bîr tînin, yên ku salên cihê-cihê li wir kar kirine: Qaçaxê Mired, Şekroyê Xudo, Xelîlê Çaçan, Babayê Keleş, Tîtal Mûredov, Eliyê Ebdilrehman, Egîtê Xudo, Hesenê Qeşeng, Pirîskê Mihoyî, Porsore Sebrî, Tîtalê Efo, Karlênê Çaçanî, Şerefê Esir, Egîtê Abasî, Paşayê Erfût, Letîfê Emer, Yûreyê Şawo, Porsore Serdar, Gayanê Hovhannîsyan.

Malî ava ji Enstîtuya Kurdî ya Parîsê re, jibo rîs û Mêlsîkê Mehmed û yên mayîn re, ku sponsoriya rojnamê demeke dirêj hildene ser xwe û alîkarî kirin. Redeksiyona rojnamê pistî rûxandina Sovyetistanê gelek dijwarî derbaz kirin. Dewletê û hukumetê dixwast ew bê dedenê, gelek caran êrîs anîne ser me, rojname heft mehan derneket û me hîç meaş nedisitend, lê em her roj dihatin ser kar û me ber xwe, nehîşt, ku ecêb bên serê wê.

Lema jî gelî xwendevena, deynê her welatparêzekî ye pistgiriya rojnamê bike-bi nivîsare, bi têlefonê, bi nama, heta bi pere jî. Ecêba ser ecêbê jî ew e, ku hetanî niha jî fax û kompûtirên redeksiyonê tunene.

Navnîşana têkiliyê

rataza@arminco.com

Bîranîna Prof. Shîdê Îbo

VANÎKÊ ELÎXAN

Di 19. Çilê 1991 de cevabeke nebixêr di ser gelê Kurd de hat. Sibê zû di oda wî ya kar de bi nemamî têlê emrê ewladekî Êzidiyatiyê yê berbiçav Pêdiyator (doxtorê zarokan) Prof. Shîdê Îbo (Shîdê Rizgo Îboyan) hate birîn.

Ew cevaba giran wek alava birûskê, wek spûka bobelîskê di nava rojê de gihîste hemî gund û bajarên Ermenîstanê û dervayî wî welat, xemkêşeke pir giran kire dilê Êzîdiyên Ermenîstanê û yên ku wî nas dikirin. Shîdê Îbo ji malbeteke êla Hesinya ye bi nav û deng bû. Di nîvê sedsala 19 de, ev êla Êzîdiyan derbasî aliyê Sînekê (Îxdir) dibe. Wê demê ev war bin deshilatdariya dewleta.Rus de bû. Kalbavê wî di gundê Qereqo de diman.



Prof. Shîdê Îbo

Desthilatdariya Rûs li hemberî Împeratoriya Osmanûyan jibo Êzîdiyan bi rastî jî ciyê azadiyê bû. Li wir Êzîdî seba dînê xwe nedihatin zêrandin û qirkirin, ji şûrê misilmaniyê xilas dibûn.

Lê sala 1918-1920 dîsa destê Roma Res digihîje wî warî. Dest bi qira Ermeniyan û Êzîdiyan dibe. Êla Hesinya cî û warê xwe dihêlin derbasî aliyê din yê çemê Erez dibin. Qeydê Sovyetê wî perçê Ermenistanê dixe nava xwe. Ji pey gelek talî, tengî û dijwariya re mala bavê wî li gundê Qarxûna de (niha Cirarat, nehya Êçmiadzînê) bi cî dibe. Di 08. 05.1924 li wî gundî de jî Shîdê Îbo tê rûyê dinyayê.

Ew hat wekî bibe xewn, bibe legenda jibo qewm û pismaman, jibo miletê xwe. Hat wekî bibe şemdana zanebûn û rênîşê jibo xwendevan û helval hogiran, hat ku bibe hekîmekî wek Hekîmê Loqmanî Êzdahî, ku bi kar û barê xwe di dîroka kultura zanistî ya gelên kurd bixemlîne.

Ewladê malbeta giran hê di biçûktiya xwe de mêla pir hewaskar eyan kir liser hêla

www.arsivakurd.org

xwendinê Ji şabûnê lingên wî erd ne digirt, wextê Huca dayîk, tevî Ûsib, Esker û Elîê birayên wî rojekê deste wî girtin û ew birin dibistanê, teslîmî dersdaran kirin û pê re jî gotinê: „De lawo ev jî daxweziya te ye, rind hînbibe û me di şermiyê de nehêle!"

Ew hînbû, nav û dengê miletê xwe, ola xwe ya Êzîditatiyê bilind kir, gihand bilindaya dika zanistiya cihanî.

Pistî qedandina dibistana gund, Shîdê Îbo di têxnîkûma bajarê Erîvanê ya bijîskiyê de tê qebûl kirin. Pey qedandina kîjanê di1951 de ew li bajarê Erîvanê diçe qeydî Enstîtûya Dewletê I. Bijiskiyê (doxtoriyê). Ew wê jî di 1957 de bi qimetê dereceya bilind û dîploma sor (dîploma herî bilind) diqedîne.

Hê di salên xwendina pêsin de Shîdê Îbo wek xwendkarekî pir zane û zanistîhiz berbiçav dikeve. Ji sala xwendina ewlin bigre hetanî qedandina enstîtutê ew dibe hilgirê stîpêndiya arinzî ya liser navê Stalîn û peyra jî liser navê Lenîn. Ev stîpendiya bitenê didan wan xwendevanan, yên ku di hêla zanistiyê de notên her bilind digirtin û yên di warê zanebûnê de xwe her kûrfirehtir karîbûn xwe sanî bikin.

Pistî qedandina enstîtutê Shîdê Îbo ji 1957 heta 1959 li bajarê Spîtakê dibe bijîskê (doxtorê) zarokan, peyre saya zanebûnên xwe ew tê kivş kirin wek bijîskê wê nehiyê yê sereke.

Di 1959 de Shîdê Îbo li bajarê Moskovayê Aspîrantura Akadêmiya Ilmên Bijîşkiyê yê Dewleta Sovêtê de tê qebûl kirin, ku di bin serokatiya ilmdarê bi nav û deng Akademîk Nosov bi dereca bilind dîsertasiya xwe ya ilmî jibo kandîdatiya ilmên bijîskyê diparêze.



Vanikê Êlîxan

Di 1963 de pistî qedandina aspîranturê Shîdê Îbo vedigere Ermenistanê. Di enstîtûya bajarê Erîvanê ya bijîşkyê de derbasî ser kar dibe. Berê ew wek asîstent, lê ji 1965 hetanî qewimandinên rojên res meha Çilêyê 1991 anko zêdeyî 25 salan li wir kar dikir. Ew serokê besa pediatriya bû.

Dîsa li Moskovayê di Akademiya Ilmên Bijîskiyê ya Dewleta Soviyetê de Shîdê Îbo di 1971 de dîsêrtasiya xwe ya doktoriyê liser sîstêma „Pêwistiya klînîkiyê di prosêsa cebirandina nexweşiyên pinevmoniya zarokên yeksalî de" bi serfirazî xweyî dike. Wî zanebûn û emirê xwe bi temamî dabû karê ilmê pediyatriyê, bûbû ilimdarekî vî karê yê her berbiçav. Çewa li Yekîtiya Soviyetê wisa jî li dervayî wî welatî nav û dengê wî hebû. Di nava van salên buhurî de ji bin qelema Shîdê Ibo zêdeyî 140 lêkolînên û pirtûkên ilmî yên pediyatriyê tên wesandin. Ji xeynî karê ilmî emekê Shîdê Îbo di hêla hînkirin û perwederkirina xwendevan û bijîşkan de jî heye. Bi serokatiya wî 10 kandîdat û doktorekî ilmên bijîşkiyê hatin hazir kirin. Shîdê Îbo endemê Organîzasyona Cihanê ya Pêdiyatoran û Nêfrologan (New York), Yekîtiya Avropayê yê Pediyatoran (Glasgow), dewsgirtiyê serokê Yekîtiya Bijîskên Zarokan yê Ermenistanê, endamê Redaksiyona kovara „Aroxçapahûtyûn" (Parastina Saxlemiyê) bû. Wî redaktoriya gelek kovar, berevok û pirtûkên metodolojî û ilmên bijîskiyê kir. Li Soviyetê û li derveyî welat ew bûbû birêvebir û oganîzatorê gellek konferens û civînên ilmî.

« Ev stîpendiya bitenê didan wan xwendevanan, yên ku di hêla zanistiyê de notên her bilind digirtin û yên di warê zanebûnê de xwe her kûrfirehtir karîbûn xwe şanî bikin. »

Ilmdarê mezin pediyator Prof. Dr. Shîdê Îbo di hêla pêsveçûna kultur û edebiyeta gelê Kurd de jî karê hêja dikir. Ew endamê Yekitiya Nivîskarên Ermenî bû, nivîskar û şaîrekî hizkirî bû.

Shîdê Îbo heta sala 1988 çar pirtûkên helbestan wesandine: "Qurna min" li sala 1963, "Bîst salê dinê" li sala 1970, "Sînem" li sala 1975, "Azadî" li sala 1988. Ji xeynî van emekî wî yê vîsa vekirî de jî pir in. Pirtûka wî ya kurteçîroka "Duryan" (1966) û romana "Kurdê rêwî" (1979) xwera ronahiyeke nûh anîne nava edebiyeta kurdê Sovjetistanê.

Îro ilmdar û şaîrê bi nav û deng tevî me nîne, lê kar û kirinên wî, fikirdariya wî ya miletparêziyê, alava dil û ruhê wî ya mirovhiziyê, nav û dengê wî wek semdanê diçûrise, wê biçûrise û bibe milkê diroka kultura û zanistiya Kurdstanê û dînê wî ya Êzidatiyê.

www.arsivakurdi.org

Mala Êzîdiyan li Oldenburgê û Bingeha Lalişê hevkakariya xwe mor kirin

REDAKSYON

Mala Êzîdiyan li Oldenburgê û Bingeha Lalis ya Rewsenbîrî û Komelayetî li Dihokê bi salan pêwendî, axiftin û bihevguhertina ramanan, rawestandin û bawerîyên xwe kûr dikin. Di çarçofa hatina Komela Dihokê de li Almanyaye bi mîvanî û jibo karekî xurt û hêja, herdu komelan ev bendên pêwendî yên jêrî di nava xwe de girêdan.



Hakim Nemir, Şêx Şamo, Izzeddîn Baqesrî, Telim Tolan, Sahap Dag

Liser daxwaziya Mala Êzîdiyan li Oldenburgê û Bingeha Lalis ya Rewsenbîrî û Komelayetî li Dihokê civînek di nava herdu komelan de li Mala Êzîdiyan li Oldenburgê-li Almaniyayê pêkhat. Di vê civînê de herdu aliyan rews û xebatên xwe anîn ser ziman û dan xwiyanî kirin, ku ew dê van xebatan bi dil û can bidomînin. Herdu aliyan eskere kirin, ku dixwazin berî hemû tistî bihevre hevkarî, pistgirtiyê, pêwendiyan xwe xwirtir bikin û ev biryar standin:

1. Herdu komel dê kar û xebata xwe li gorî rêbaz, program û destûrên xwe bidomînin û serbixweya xwe biparêzin.

2. Herdu alî dê xebat û tevgerên xwe bi teybetî yên lêkolînî, ji zanyar, rewsenbîr û xwendevanên xwe re di herdu kovarên xwe de "Dengê Êzîdiyan" û "Lalis" biwesînin. Herdu alî dikarin gotarên kovarên xwe bi hev biguherin, wergerînin zimanên din û biwesînin û bi teybetî gotarên bingehîn.

3. Herdu komel jihevre amade ne, ku hemû tistên pêwist ji arsîvên xwe, çi nûçe, pirtûk û kaset bin, têxin xizmeta hevûdin.

4. Mala Êzîdiyan dê di beşê xwe yê internetê de (www.yezidi.org) çalakiyên Bingeha Lalis û bi teybetî wesanên kovara Lalis biweşîne.

5. Herdu komel dê rê xwes bikin, daku kovar, wesan û belavokên wan herdu aliyan li Elmaniyayê û li welat jî bighîjin destên gel. Bi hevguhertina nûçeyan di nava herdu komelan de karekî pir girîng e.

6. Herdu komelan soz didin hev, ku mêvandariya hev bikin û her firsetek were hev bibînin, çi li welat Kurdistanê û çi li Almanyayê.

7. Ev peymana me û pêwendiyên me dê di xizmeta ziman, çand û ola me de bin.

8. Pewist e, ku herdu komelên me ti bandoran lihev nekin. Wekî din jî ev tifaqa me ne lidijî komel û rêxistinên din e û bila ti mirov dilxirabî jêre çênebe, ku emê çavsoriyê li hindek komel û rêxistinên din bikin. Em kar û barên komel û rêxistinên li welat û derveyî welat pîroz dikin û dibêjin, deriyên Bingeha Lalis û Mala Êzîdiyan ji biratî û tevayiyê re her gav vekirî ne. Armanca me biserketina gelê me ye.

9. Ev peyman dê di herdu kovaran de were weşandin.

Li M.Ê. Odenburgê, 18.02.2000

www.arsivakurd.org

Cara yekemîn li Almanyayê: Civîna Civata Rûhanî li Oldenburgê

REDAKSYON

Endamên civata Rûhanî ya Êzîdiyan bi Êzîdiyên Oldenburgê û derdorê wê re di 26.02.00 de di Mala Êzîdiyan ya Oldenburgê de civiyan.

Endamên civata Rûhanî ya Êzîdiyan, yên ku beşdarî vê civînê bûn ev in:

- Mîrê Êzîdxanê, Mîr Tehsîn Saîd Beg
- Bavê Şêx Xeto, Extiyarê Mîrgehê
- Feqîr Hacî, Xizmetkarê Mala Şêx Adî, Lalis
- Feqîr Xidir Keso, ji qewlzanê çiyayê Şengalê

Di destpêka civînê de serokê Mala Êzîdiyan li Oldenburgê berêz Telîm Tolan bi navê hemû endamên Mala Êzîdiyan bixêrhatina mêvanan kir û got: Di dîroka Êzîdiyan de cara yekemîn e, ku Civata Rûhanî li Almanyayê bû mêvan. Em daxwazdar in, ku danin û standina di navbera Êzîdiyên li welat û li Avrûpa gestir bibin. Ev yek jibo jiyana olî ya Êzîdiyên li Almanyayê giranbuha ye.

« Ev qelenê zêde derdekî dijwar e, ji dê û bavan hêvî dikim, ku ewqas qelenê zêde nestînin û keç û lawên xwe bê dilê wan ne zewicînin. »

Pistî axaftina Telim Tolan re Mîr Tehsîn Beg hêja armancên hatina xwe û Civata Rûhanî li Almaniyayê anîne ser ziman û dilxwesiya xwe bi van gotinan diyar dikir: „ Ev avayê hêja, ku bi xebata endam û xêrxwazên Mala Êzîdiyên Oldenburgê avabûye, layîqî we ye û karekî pîroz e. Dibê Êzîdî jî rêz û hurmetê bidine qanûnên vî welatî, li vê goriyê li zarok û xortên xwe xwedî derkevin. Hun divê nehêlin zimanê dê û bavan çand û kultura we bê bîrkirin.

« Jibo Êzîdiyan ne hesan e, li Almanyayê çand û dînê xwe biparêzin. Lewma jî mirov bêtir dilxweş dibe, gava ku mirov dibîne, ku Êzîdî li vir Êzîdîdatiya xwe xwedî derdikevîn. »

Divê were zanîn, em Êzîdî jî xweyî hed û sedin û Lalisa me heye. Ev qelenê zêde derdekî dijwar e, ji dê û bavan hêvî dikim, ku ewqas qelenê zêde nestînin û keç û lawên xwe bê dilê wan ne zewicînin. Ez dîsa hêvî dikim, ku dê û bav zarokên xwe bisînine dibistana, jibo em jî hînî zanînê bibin, jibo jihevre xêrxwaz û bi tifaq bin."

Di pey axaftina Mîrê Êzîdyanê, Mîr Tehsîn Seîd Beg re, Bavê Şêx - Şêx Xeto - kar û xebata Mala Êzîdiya pîroz kir û got:" Ez ji Xwedê û Tawisî Melek hêvî dikim, ku Êzîdî tev weha serfiraz û bitifaq bin. Jibo Êzîdiyan ne hesan e, li Almanyayê çand û dînê xwe biparêzin. Lewma jî mirov bêtir dilxweş dibe, gava ku mirov dibîne, ku Êzîdî li vir Êzîdîdatiya xwe xwedî derdikevîn. Em dixwazin di vî warî de jiboÊzîdiyên li vir dijîn alîkarî bikin. Bi mêvandariya xwe em dixwazin diyar bikin, ku hun jî perçeyek ji civata Êzîdiyan in, weke Êzîdiyên li Îraqê û yên ciyên din." Pîştre Mamoste Pîr Xidir, bangewaziya Mala Êzîdiyên li Oldenburgê, ya jibo malbetên Êzîdiyan xwand û carek din daxwazkir:"Kî bixwaze zarokên wî zimanê Kurdî fêrbibin û Êzidiyatiyê rind nasbikin bila ji kerema xwe re zarokên xwe bişînin dibistana Êzidiyatiyê û wan lê qeyîd bikin." Faruk Saîd Beg jî got:" Em hêvîdar in, ku hun zarokên xwe bişînin vê dersa li Mala Êzîdiya de destpêkiriye, jibo Êzîdî jî karibin dînê xwe bi zimanê xwe fêrbibin. Hinga ev zimanê Kurmancî hinda bibe, dê hingê Êzidiyatî jî wê wenda bibe."

Bi xêra vê xebata Mala Êzîdiyan li Oldenburgê ev cara yekemîn bû, ku firsend kete destên nêzîkî 150 Êzîdiya, ku ew ji Mîr û endamên Civata Rûhanî ya ola xwe gelek pirsan bikin û li ser pirsgirêkan biaxivin. Di vê civînê de gelek nûnerên komelên Êzîdiyên din, wek Komela Xwandevanên Ezîdiyên li Bielefeldê, Komela Leerê û hwd amedebûn û mesajên komelên xwe xwandin.

www.arsivakurd.org

Dana sêmînaran li Mala Êzîdiyan li Oldenburgê

ESKERÊ BOYÎK

Mala Êzîdiyan ya li bajarê Oldunbûrgê jibo Kurdên-Êzîdî yên wê herêmê bûye navendeke çandî û perwerdayî. Bi sedan mirovên me li dergehê Mala Êzîdiyan (M.Ê.) dixînin û alîkariyê jibo çareserkirina pirsgirêkên xwe yên civakî, malbatî û penaberî dixwazin. Berpirsyarê M.Ê. jî kêmasiyê naxine van karan û ligorî taqeta xwe alîkariya wan mirovan dikin.

Ji aliyê Êzîdînasînê ve jî endam û serokatiya vê Malê karekî layîq pêktînin.

Bi hatina Êzîdiyan li Awropayê û bi teybetî cîbûna wan li Elmaniyayê civakeke pir rengîn e. Ev cara yekemîn e, ku Êzîdî hem ji Kurdistana me ya bindest û perçekirî û hem ji herêmê din, weke ji welatên Sovyetistana berê, gihîstine cemhev û piştî hewqas bindestî û wêranî bi serbestî liser ola xwe bi'axivin, rastiya vê olê derxînin meydanê û hewl bidine pirsgirêkên xwe bi xwe çareser bikin, pirsgirêk jî ne hindik in.

Di dîrokê de Êzîdî nikarîbûn rastiya ol û çanda xwe ya kevnar û rehkur derxînin holê. Ji aliyekî ve komarên dagirker bûn, yên welatê wan lihev pare kiribûn û ew çavkor kiribûn û ji aliyê din olên cînar bûn, yên nedihiştin, ku Êzîdî rastiya ol, dîrok û çanda xwe bibihîzin û bi pêşkevin. Mebesta wan jî gi vî karî ew bû, ku Êzîdî ji civata mirovatiyê û însanetiyê dûr bimînin û ne li nav wan de bihelin. Ji van sedeman jî pir pirsên ol û çanda wan berûvajî û saş hatine şirovekirin. Pir erf û edetên ziyankar bûne asteng û ketine ser rêya pêsveçûna civaka Êzîdiyan. Hindek dixwazin vê olê ji siyaseta xwe re bixine mertal û xwestinê xwe pêkbînin.

Jibo ku civaka me di welatê biyanî de bikarîbe habûna xwe bidomîne, pêwist e, ku rê jiber wan nerindan bigire, xwe biparêze û li rastiya xwe bigere. Di vê derheqê de M.Ê. hewl dide bersiva pir pirsan bide, ew valayiyên dîrokî, yên çêbûne dagire û ola Êzîdîtiyê ji siyaset û guhertinên saş biparêze. Ji çalakiyên M.Ê., yên dewlemend, kar û barê rewşenbîrî ye. Derbaskirina sêmînaran ciyekî ne hindik di xebatê de digire. Ji hezîrana sala derbasbûyî ve heya hezîrana îsal 14 sêmîner li vê Malê de çêbûn. Naverokên van sêmînaran jî liser ol, çand û dîroka Kurdên Êzîdî bûn.

Sêmîner û sêmînerdar jî ev bûn:

- Pîr Xidir Silêman: Berperek ji dîroka Êzîdiyan berî dema Şîxadî, Mîr Caferê Dasinî
- Kemal Tolan: Cî û warên Êzîdiyan di Kurdistana Bakur de berî koçberiyê
- Sedîq Düzgün: Êşîrên Êzîdiyan di sed sala 16 de
- Eskerê Boyîk: Koçberiya Êzîdiyan, Mîrzikê Zaza
- Pîr Xidir Silêman: Kitabên Êzîdiyan yên pîroz
- Bedel Feqîr Hecî: Îd û Erefatên Êzîdiyan li Lalişa Nûranî
- Sedîq Düzgün: Fermanên dawî liser êlên Êzîdiyan
- Eskerê Boyîk: Koçberiya Êzîdiyan; Cengîr Axa
- Pîr Xidir Silêman: Berperek ji dîroka Êzîdiyan berî dema Şîxadî, Mîr Îsa Dûmbelî
- Eskerê Boyîk: Emekên Êzîdiyan di pêşvebirina rewşenbîriya Kurdan de
- Şewqî Şemo Îsa: Rola Tawisî-Melek di Êzîdîtiyê de
- Hoşeng Broka: Ezîdîtî û djwariya Amewiyan
- Cemal Xiznedar: Pîroziya Newrozê
- Heso Hirmî: Rola Dewrêşê Evdî liba Êzîdiyan de
- Ali Tuku û Ahmed Akbaş: Giringiya perwerdekirina zarokan jibo pêşeroja civaka me li Elmaniyayê

Sêmîner tev jî ji aliyê nivîskar û lêkolînvanên naskirî û endamên koma rewşenbîrî ya Mala Êzîdiyan hatine dayîn. Praktîka sêmînerên derbasbûyî nîşan dide, ku roj bi roj guhdariya civakê jibo van têman mezin dibe. Ev sêmîner di atmosfêra pir vekirî û bi dan û standina hêja bû, derbas bûn.

www.arsivakurd.org

Pêwist e, ku komelên Êzîdiyan serbixwe bimînin

JI MALA ÊZÎDÎYAN

Daxwaziya me ev e, ku rastiya hinek tiştan bidine xwiyakirin û rawestandina Komela Çand û Dînê Êzîdiyan li Oldenburgê bidine zelal kirin:

1. Komela me hatiye damezrandin jibo parastin û pêşvebirina Êzîdîtiyê. Yek ji wan armancên pîroz ev e, ku Êzîdîtiyê bi mirovên din û gelên cîhanê bastir bidin naskirin. Wekî din jî em hemû dizanin, ku pir tiştên nerast û tewş liser Êzîdîtiyê hatin û tên gotin û belavkirin û li cem hinek nezanan ciyê xwe girtine. Em bi kar û barê xwe dixwazin van derew û nerastiyan hilînin. Gelek çewtiyên ku liser ola me ya kevnar li cîhanê belav bûne, yek armanc wan heye: Ola Êzîdîtiyê bêrûmet bikin. Yek ji wan çewtiyan di derheqa Êzîdîdtiyê di vê dema dawî de hatiye belavkirin ew e, ku hindek dibêjin Êzîdî bixwe Zerdeştî ne. Li gel pir rexene ji aliyê hinek rêxistin û komelan ve me ew dîtina xwe ya dîrokî neguhret û ev tistê berûvajî qebûl nekir. Me li gor qeweta xwe nehîşt, ku Êzîdîtî bibe lêstikek di destên hinekan de û ji Kurdîtiyê dûr bibe. Ev bawerî ne bitenê baweriya komela me ye, ev baweriya lêkolînvan û Civata me ya Rûhanî ye jî. Van aliyên berprisyar jî ev rastiya han bi şêweyekî lêkolînî û dirokî zelal kirin: Rehên Êzîdîtiyê ji Zerdeştîtiyê kevnartir in.



Bavê Çawîş ligel Dayê Şêrînê, wêne: Mîro Aslan

2. Êzîdîtî ola Kurdan ya pêşî ye, kaniya gelê Kurd e. Heke Kurdên Ne-Êzîdî bikarîbin Dî`a û nivêjên xwe bi zimanên din bikin, em Êzîdî bitenê bi Kurdî dikarin dî`ayên xwe, Qewl û Beytên xwe bikin û bibêjin. Ji me giştan re diyar e, ku Êzîdî jiber vî zimanê dayîkê her du caran zilum, bindestî, zorî û koçberî dîtine: Carekê jiber ku Êzîdî bûn û cara din jiber ku Kurd bûn. Bê şik û guman emê wan kelepûrên bav û kalan berdewam bikin û ji rêya wan dernakevin. Em weke berpirsyarên komeleke Kurdî, perçiqandina mafên mirovan li welatê xwe Kurdistana rengîn qebûl nakin û emê her dem lidijî rawestin. Lê bi dîtina me pêwist e, ku Komelên Êzîdiyan serbixwe bimînin û negirêdayî ti rêxistin û partiyan bin. Em dibêjin ne tistekî rast û berbiheve ye, ku komelên me dibin bandora rêxistinên siyasî de bin. Berî her tistî ev baweriya Civata Rûhanî ye. Bitenê bi vî rengî tu mirov nikarin Êzîdîtiyê ji xwe re bixne weke rimekê û armancên xwe yên siyasî pêkbînin.

3. Hêviya me ji komelên Êzîdî ev e, ku gilî û gazinên xwe rû bi rû jihev bikin û ne di rojname û têlevîziyonan de. Jiber ku em di vê baweriyê de ne, ku bi van weşanan dijminê Êzîdiyan kêfxweş û şad dibin. Ji aliyê din ve jî em banga xwe dighihînin partî, rêxistin û berpirsiyarên televiziyon û rojnameyan, ku ew rê ji tistên han re venekin û nehêlin, ku zimanên hinekan li me û li wan dirêj bibin û bibêjin, ku ev tist bi davdana van rêxistinan çêdibin.

Mala Êzîdiyan Oldenburg dê her karê xwe berdewam bike, kar û daxwaziyên ciwanan bi cî bîne, jibo fêrbûna zimanê Kurdî û naskirina kultur û rê û rismên Êzidiyatiyê û kovara "Dengê Êzîdiyan" biweşîne. Em pir dilşad dibin, ku piraniya gelê me pistgiriya rêya rast digire. Alîkarî û piştgiriya Êzîdiyan hêz û hêviya me mezin dikin, ku em vî karê xwe bidomînin.

Xebernameyek liser Lalişê - Tesîr û dîtin: Di navbera xastek û realîtêtê de

SEDÎQ BASÎ (SIDDIK DÜZGÜN)

Ev xebernameya ku dûrc tê, min di 14.10.2001 de li bajarê kurdan yê Dihokê qedand. Ew tesîr û serpêhatiyên min yên sexsî tûne ser ziman.

Padîşa ye û her çar yare
Li merkebê dibûn siware
Têk seyrîn li çar kinare
Li Lalişê sekinîn got: Ev e, heq war e.

Min jî wek êzîdiyekî ku ji welatê xwe, ji Lalisa Nûranî dûr herdem ji xwe re beytê Lawikê Pîrê digot:

Kengê emê herin Lalisa xwe bibînin
Deşta di qub û hilêlên zêrîn werînin
Xem û xiyalên dilê xwe pê birevînin

Bi rastî meraqeke zêde mezin ketibû dilê min, ku ez herim heca xwe û digel Êzîdiyan ve Lalişa xwe tewaf bikim. Çewa ku weke mirovekî tû be û qesta kaniya avê bike.

Ez di 29.09.200 de ji bajarê Oldenburgê li Almanyayê bi rê ketim û berê xwe da Lalişê. Di 01.10.200 de gitîştim Kurdistana Îraqê. Her çiqas ku min newast ku kes werin pêşiya min jî, lê dema ku gihîştim Xala Îbrahîm Xelîl, min dît, ku endam û berpirsyarên komîta Rêbira Bingeha Lalîş û gelek Êzdiyên navdar li wir hazir bûn. Her çiqas ku ez jiber rêwingeha xwe westiyayî bûm jî, dema ku min ev Êzîdiyên dilgerm û rûgeş dîtin, ez gelek rehet bûm, weke ku ev 100 sal e, ku ez bi wan camêran re dijîm.

« Dilê min xweş bû, ku min dît, çewa zarokên Êzîdiyan di bin stara hukumeta Kurdan de bi zimanê diya xwe hînî erf û edetên ola xwe ya Êzîdîdatiyê dibin. »

Pistî me behna xwe li nivîsgeha Kek Cehwer berda, em tev bihevre ketin rê û di bajarê Zaxo de ber bi Dihokê ve çûn û ji wir jî çûn Şariya. Di roja 3.10.2000 de mamosteyê hêja Şemo destûr stand, qederekî gelek mezin da pêşiya me û me li medresan gerand. Gava min dît, ku zarokên Êzîdiyan bi zimanê Kurdî dixwînin û dinivîsînin, pir kêfa min hat. Dilê min xweş bû, ku min dît, çewa zarokên Êzîdiyan di bin stara hukumeta Kurdan de bi zimanê diya xwe hînî erf û edetên ola xwe ya Êzîdîdatiyê dibin.

Min dixwast berî cumaiya Lalişê destpêbike, ez Lalişê bibînim. Lewma jî di 5.10.2000 de tevî birayên ji komîta rêvebira Bingeha Lalişê û pismamê min yên muhendis Nasir em ji gundê Kelebederê ber bi Lalişa Nûranî ve çûn, ser Dihokê ve gihîştin Zawîtê û rêya me di nav çiyayên pir bi dar û bar ve dersbas bû û em gihîştin Lalişa Nûranî.

Berî Lalişê li destê çepê digotin: „Vaye Xana Êzî xweya bû." Ev xan avayekî pir kevnar û balkêş bû. Em ji Xanê derbasbûn, me çotên Qurban dîtin. Ez ketim heycaneke mezin, heta ku ez bixwe hesiyam, em gihîştin Pira Salatê. Hingê Şehîdên 72 fermanan hatin bîra min, hingê qedrê Êzîdîtatiyê û berxwedana bavkalên me ya jibo parastina vî dînê sêrîn di çavê min de mezintir jî bû. Em gihîştin nava Lalişê, liser Hewda Kaniya Spî me sela bav û kala û tevayiya Êzîdiyan anî û çûn ber deriyê Şîxadî û tewaf bûn. Liser deriyê Lalişê Feqîr Xêrî got: „Mîr Tahsîm xeber sandiye, ku em ji we re odekê vala kin." Destûr ji xwendevanên Dengê Êzîdiyan dixwazim, ku ez li vir jibo Mîr Tahsim û Feqîr Xêrî re spas bikim. Di van çend saetên ku ez li Lalişê mam û liser delalî û ciwaniya Geliyê Lalişê binivîsînim, gotin têrê nakin, lê dîsa jî bi kurtî bibêjim:

Em hatin Lalişê tewaf kin,
Xem û xeyalên dilê xwe belav kir.

Êvarê em vegeriyan Dihokê. Dîsa di.10.200 de ez û Nasir çûn Lalişê. Gelek Êzîdî hatibûn wir. Min hevdîtineke pir kurt bi Civata Ruhanî re pêkanî. Min bi Qewal Xidir û herdu pîrên xizmetkarên mala Şîxadî û gelek ciwanên Êzîdiyan re, yên ku

www.arsivanf.org

ji Şêxan hatibûn Şengalê. Wê şevê em li Lalişê razan û di roja 10.10.200 de Feqîr Hecî da pêsiya me û em li xewlgehên Lalişê gerandin û ew bi me dane naskirin. Bi saya vê yekê min ciyên (diyardên) ku ne layîqî Lalişê ne, dîtin. Min ji Dr. Basil, qaymaqamê qeza Şêxan, pirsî: „Gelo kî kare nehêle, ev tiŞtê nelayîqî bimînin?" Berêz Dr. Basil bersivand: „Mîr Tahsin Beg û Civata Rûhanî karin rênedin, ku ev tist bimînin, em jî mîna te jê nerazî ne." Yekser ez çûm cem Mîr Tahsim Beg û min jê rica kir, ku ev tistên nelayîqî Lalişê û dînê me ne, ji wir rakin. Berêz Mir Tahsim Beg emir da, ku ev daxwazî bi cî bê û pistî behnekê me dît, ku ev tist hatine rakirin. Li vir car din ji Mîr Thsim û Dr. Basil re spas dikim. Hêvîdar im, ku sal were bêtir guh bidin paqijiya Lalisa Nûranî û lê xwedî derkevin. Divê ku hemî Êzîdî qesta heca xwe bikin û herkes li cihe xwe paqijiya Lalişê biparêze. Em Êzîdî dibêjin: Paqijî ji îmanê ye.

Pistî demekê ez, berêz Hakim Nemir, wezîrê hukumeta herema Kurdistanê, kek Ferec Mîrza û muhendis Nasir ji Dihokê çûn bajarê Amediyê. Ew bajarekî delal û liser kelakê bilind avakiriye. Ji bermayiyên deriyên rojava bi nexşan xemilandiye. Ew bajarekî kevnar û delal e. Min ji vî bajarî pir hezkir, ez hêvîdarim, ku zaniyar û arkelog liser kevnariya vî bajarê delal lêkolînan amade bikin.

Ez li vir spasiya xwe bi dil û can jibo Berêz Hakim Nemir dikim, ku ew ji Hewlêrê hatibû cem min. Jibo qedir û mêvandariya bilind jibo Ferec Mîrza, Nasir, Şêx Şamo û hevalên Bingeha Lalişê dikim.

Axaftina P.E.N. a Kurd li Mala Êzîdiyan

DR. ZERDEŞT HACO

Gelî birêzan, gelî xwişk û birayên hêja!

Di serî de ez dixwazim bibêjim, ku min silavên hemû endam û berendamên navenda PEN a Kurd ji We re bi xwe re anîne.

Ev cara yekê ye, ku Êzîdî li derveyî welat derfeteke wiha bi dest xwe ve tênin û avayiyeke serbixwe bi rê ve dibin. Ev gaveke gelekî gering e, di dîroka çanda gelê me de jî cihê şahnazî û serbilindiyê ye.

« Di gelek qonaxên dîrokê de gelê Kurdistanê bingeheke filosofî xwedî mêjûyeke dirêj ji jiyana mirovan re danî li paşi di şarşefa ola Êzdîtiyê de bi awayekî bi sînûr kir, ku mirov kare bibêje, ramana ola Êzdîtiyê filosofiya gelê kurd ya jibo jiyanê ye. »

Hun dizanin, ku lêxwedîderketina çand û toreya gelan di destpêka jiyana şehristanî de pêşi di navenden weke vê avayiya serbixwe ya We de destpêkiriye. Ew cihên nivîsîn û xwendinê bûn, cihên gengeşiyên filosofî liser mirin û jiyanê û liser wê yekê bûn, ku awayek ji jiyana bihevre ya mirovan were danîn.

Bi vî awayî ziman û çanda gelên xwediyên van navendan dihate parastin û bipêşvexistin, herwekî bîr û ramanên nû derdiketin û ji nû ve dihatine gengeş kirin.

Li welatê me ji, yê ku çavkaniya çanda cihanê ye, navendên wisa hê ji destpêka şaristaniya mirovaytiyê ve hatine avarkirin û birêvebirin. Di gelek qonaxên dîrokê de gelê Kurdistanê bingeheke filosofî xwedî mêjûyeke dirêj ji jiyana mirovan re danî li paşi di şarşefa ola Êzdîtiyê de bi awayekî bi sînûr kir, ku mirov kare bibêje, ramana ola Êzdîtiyê filosofiya gelê kurd ya jibo jiyanê ye; jiber bingiha vê olê bi destê gelê kurd hatiye danîn û ne weke dîne filehîtiyê, yan yê misilmantiyê ku li derve hatine danîn û xwe berdane Kurdistanê.

Jiber vê yekê avakirina navendên weke vê ya We dirêjbûna dîrokî ya navendên mêjûyiyên Kudistanê ye, cihê lêxwedîderketin li ziman, wêje û çanda gelê Kurdistanê ye.

Ez bi navê PEN a Kurd, ya ku têde nivîskarên Êzîdî cihê bilind digirin, pîroziya We dikim û hêviya vekirina gelek avayiyên din weke vê dikim

Oldenburg, 17.12.1999

Sipasî

Komiteya birêvebirina Mala Êzîdiyan li Oldenburgê sipasiya P.E.N. a Kurd û Presîdentî wî Dr. Zerdeşt Hajo jibo beşdarbûna wan di roja vekirina Mala Êzîdiyan dike

www.arsivakurd.org

Milyaket di baweriya Êzîdiyan de - Liber ronahiya tekistên Êzîdiyan

PÎR XIDIR SILÊMAN (KHIDIR S. KHALIL)

Eşkere ye, ku Êzîdî baweriyê bi Xwedê tînin, ku ew Xweda ye û Ezda ye, xaliqê vê kinyatê ye: Roj û hîv, erd û esman, şev û roj, daye Milyaket, behişt û doje, Adem û Hewa û tev giyandar her ji afirandina Xwedê ne. Her ew e, yê ev dinya bi cî kirî û xemilandî. Jibo xûyakirina vê yekê jî emê çend sebeqan ji Qewlê Padşayî binivîsînin:

Ji Qewlê Padşayî[1]

Pedşê minî xefar e
Ji ba wî tê ferware
Jibo dinyayê û her çar kinare.
Pedşê min dinya çêkir
Bi hed û sed û bi rê kir
Benî Adem têde xinê kir.
Pedşê min surr li sema
Xwedanê şev û roj û dema
Ji ba wî tên kereme.
Pedşê min rebê milyakete
Rebê her heft surrên bi taqet e
Her heft mêrên bi heybet e.
Pedşê min kinyat ava kir ji dira gewhere
Sipartibû her heft surrên her û here
Tawisî-Melek kire serwere.
Pedşê min rebê Adem e
Ji ba wî tê kereme
Li hemû wexta li hemû dema.

Afirandina Milyaketan

Di mîtologiya Êzîdiyan de tê gotin, ku Xwedê her heft milyaket ji nûra xwe afirandin, her roj milyaketek dihate afirandin, mîna çawa ku semelkekê ji semalka din hilbikî, û şemelka yekemîn ji nûra Qendîlê hate hilkirin û yên din her yek jiber nûra yê din hate hilkirin. Rojên heftiyê jî li gorî Milyaketan hatine danîn. Her rojek ya wî milyaketî ye, yê ku lê hatiye afirandin. Lê kîjan roj ya kîjan milyaketî ye, ew hind ne xûya ye, her çend di kitaba (pirtûka) bi navê Mishefa Reş û Celwa, ku di destpêka sedsaliya bîstê de bû, cara yekemîn ji aliyê rojhilatnaşan ve hatiye weşandin û me guman lê heye, ku kitabên rastêqîneyên Êzîdiyan dibêjim: Di van kitaban de hatiye afirandin û nivîskarên mîna Demelûcî û Hesenî, Ebas Ezawî û Hoşeng Biroka di kitabên xwe de liser Êzîdiyan her ji wê çavkaniyê wergirtine. Lê di mesandina rê û rismên Êzîdiyan de tam xûya dibe, ku roja çarşembê roja Tawisî- Melek e, û yekşem ya Melik Şêxisin e û sêşem ya Şêsims e. Sebaret afirandina Milyaketan jî di çend Qewlên me de, bi taybetî di Qewlê Şêxûbekir de, ev yek hatiye, ligel ku wan bi nav nake, lê her heftan bi rêz dike:

Ji Qewlê Şêxûbekir[2]

Pedşê min ewil ku Mîr bû
Xûdanê cêşê kibîr bû
Bi heft surrên Siltan Êzî re (yî) xebîr bû.
Pedşê min surr li sema
Berî ne lewh hebû, ne qeleme
Ya Siltan Êzî, li ba te ew se'ete ew deme.
Berî ne qelem hebû, ne lewhe
Me yarek divê vê herfê şiro bike, li ku ye?
Melek (y)êk bû, bûne didowe.
Liber ferwara Pedeşê ye
Teftêşa me li wê cewabê ye
Melek dido bûn, bûne sisêye.
Pedşê minî cebar e
Ji ba wî hatibû ferware
Melek sisê bûn, bûne çare.
Pedşê minî mizênc e
Melek çar bûn, bûne Pênc e
Her Pênc bûne şifetê, her (y)êk û rênc e
Dilê min li vê yekê yî xweş e
Melek pênc bûn, bûne şeş e
Her seş bûne Melekên erse.
Pedşê min xweş kir sûhbete
Lêk rûniştin mûhbete
Melek şeş bûn, bûne hefte.
Her heft ku di'efirîn
Bi rastiyê lêk didebirîn

www.arsivakurdi.org

Bi mûhbetê bi nedera (y)êk didebirîn

Her wisa di Qewlê Şêx û Aqûb de hatiye, ku Milyaket ji nûra Xwedê hatine efrandin:

Ji Qewlê Şêx û Aqûb[3]

Ew bûn Melekên sekinîne
Ji nûra îlahî ne
Xwarina wan elhemdillah û şikrîn e.

Navê Milyaketan

Di Di'a Êvarê de, ya ku divê her Êzîdiyek her roj berî rojavayê bike, navê her heft Milyaketan têne gotin :

Ji Di'a Êvarê[4]

Ya Xwedê!
Tu me bidî xatira Ezrayîl, Cibrayîl, Mikayîl,
Derdayîl, Şemqayîl, Ezazîl û Esrafîl
Ew in her heft Melikên kibir
Berî Xas, çendî bedîl
Di destan de mifte û kilît
Ew jî wan e liber hizreta Melkê Celîl.

Serokê Milyaketan[5]

Di baweriya Êzîdiyan de piştî Xwedê heft Milyaket efirandin, gote wan: Sicûde û kirnoşê ji ti kesî re nekin, ji xeynî min! Lê dema qalibê Adem xuliqand, gote Milyaketan: "werin, sicûdê jibo qalibê Adem bikin, ta giyan bê ber." **Şeş Milyaketan sicûde ji Adem re kirin, lê Ezazîl sicûde nekir.** Xwedê te'ala gote wî: "Tu çima sicûde ji Adem re nakî?" Ezazîl got: "Rebê min, te şîret li me kir û min ew şîret ji bîr nekiriye, sicûde bo te bitenê ye, Ezîzê min". Vêca Xwedê Ezazîl xelat kir û Tokê zêrîn, ku Tokê Êzî ye, di stûyê wî de kir û got: "Here, Ez te dikim serokê Milyaketan û navê te Tawisî-Melek e, anko serokê Milyaketan." Jiber vê yekê jî ku heya niha jî her Êzîdiyekî vê Tokê lixwe bike û dibêjinê " Toka Êzî " anjî carne Toka Tawisî-Melek. Mebesta Xwedê ji vî Tokê jî xelatkirina Tawisî-Melek bû.

Xaleka din jî ji baweriya Êzîdiyan, ku her pêwendî bi navê Milyaketan ve heye, ev e: Êzidî di wê baweriyê de ne, ku Surr û Nûra Milyaketên esman kitine ber xasên Êzîdiyan li erdê û rê û rismên dînê Êzîdiyan xurt dikin, dema heft surr hatin erdê di ber heft xasan de bi van navan bi nav bûne:[6]

- Ezrayîl anku Melek Nasirdîn
- Cibrayîl anku Melek Sicandîn
- Mikayîl anku Melek Fexredîn
- Derdayîl anku Melek Şêxûbekir
- Şemqayîl anku Melek Şemsedîn
- Ezazîl anku Tawisî-Melek; ruhê wî ketiye ber Şîxadî
- Esrafîl anku Melek Şêxsin

Xwarina Milyaketan[7]

Di Qewlê Şêx û Aqûb de tê gotin:

Ji Qewlê Şêx û Aqûb[8]

Ew bûn melekên sekinîne
Ji nûra Îlahî ne
Xwarina wan elhemdillah û şikirîn e.
Ew bûn melekên wî cebêre
Xwendina wane ji dêre
Wan tiştek ne dixwar, ji rehmeta Xwedê dibûne têre.

Her sebaret vî babetî di hindek sebeqan de ji Qewlê Şêxûbekir hatiya:[8]

Her heft ku di'efirîn
Bi rastiyê lêk dî`êwirîn
Bi mûhbetê bi nedera yek didebirîn.

Ji me re diyar bû, ku ev milyaket didêrîn in, ji nûra îlahî ne, xwarin û debora wan: Hemdbûn û şikirîna Xwedê ye û bi neder û dîndaran hev têr dibin.

Sima û şiklê Xwedê û Milyaketan

Xwedê êdî heft Milyaket ji nûra xwe efirandin û perdek di nava xwe û Milyaketan de danî. Di baweriya Êzîdiyan de Milyaketan Xwedê nedîtiye, lê hinera wî dîtine û bawerî pê anîne. Lewma jî Tawisî-Melek ku serokê milyaketan e, bi vî rengî perwesteyî Xwedê bûye, ev Di'a kiriye:

Ji Di'a Tawisî-Melek[9]

Ya Rebî ela şanek û ela mekanek û ela Sultanek
Ya Rebî tu yî, kerîm î, tu rehîm î
Ya Rebî her tu Xweda yî
Her tu layîqê medih û sena yî

www.ezidivakurdi.org

Ya Rebî tu melekê melkê cihan î
Tu melekê erşê ezîm î
Ya Rebî ji enzel da, her tu yî, qedîm î
Tu tam û kam û ra yî
Ya Rebî her tu Xweda yî
Her tu yî, ha yî û layiqê medih û sena yî
Ya Rebî tu Melekê Ins û Cins î
Ya Rebî tu Melekê Erş û Kurs î
Ya Rebî tu Melekê Gay û Masî
Ya Rebî tu Melekê Alem û Qûdsî
Tu li semd î, lift î, lemay î
Tu li semed î û hey û mecîd î
Wahid î, ferz û hemîd î
Ya Rebî tu xwedawendê seper î
Ya Rebî tu xwedanê Meh û Mihr î
Ya Rebî tu xwedanê Ceh û mer î
Ya Rebî tu xwedawendê eta yî
Ya Rebî ji isma tu yî, bilind î
Te nav li çûne, tu yî çendî
Mizî za yî, dû zend î
Miqa destê dû pa yî
Tu yî layiqê medih û sena yî
Ya Rebî tu keremdarê hût î
Mendayê qût î, Helîmê melekut î
Ya Rebî tu hem hekîm î û hem mecal î
Ya Rebî te ne nav e, te ne xurd e
Xwedan mal î, xûdan perd e
Ya Rebî mekanê te wê li hemû Erde
Ya Rebî te ne lewn e, te ne reng e
Te ne awaz e, te ne deng e
Te ne endam e, te ne çeng e
Ya Rebî kes nizanit tu yî, kusa yî
Ya Rebî tu weliyê ferza nimêj î
Ruhan di perêj î, ji milan milkan dibêjî
Ya Rebî tu hakîmê şah û geda yî
Ya Rebî te tobe danîbû liser Adem
Ya Rebî tu hekîmê şîfayet î
Ya Rebî tu rehm î, kerem î, emîn î
Ya Rebî tu li semed î, em çû nînîn
Û li sûc û gûneh û mişewşe
Me kirin tehiyat û gewşe
Ya Rebî li me bibexşe
Ya Rebî her tu yî, ha yî
Û her tu yî layîqê medih û senayî
Ya Rebî tu Xaliq î, em mexlûq în
Tu miraz î, em daxiwaz în.

Vê carê heke serokê Milyaketan wisa perwesteyî
Xwedê be û bibêje:
Ya Rebî te ne lewn e, te ne reng e
Te ne awaz e, te ne çeng e
Ya Rebî kes nizane tu yî, kusay î
Ya Rebî te ne xaf e, te ne xûrd e
Xwedan mal î, Xwedan Perd e
Ya Rebî mekanê te wê li hemû erde

Kesî Xwedê nedîtiye û perde di nava wî û mexlûqên wî de heye, lê Xwedê her li hemû erdan e. Lê Milyaket her wekî di mîtologiya Êzîdiyan de û di Qewl û Beytên wan de carne mîna Xasan û carne jî mîna bavçak û Baba Derwêşan têne berçavên mirovan. Di serhatiyên Êzîdiyan de dema mirovek bê hêvî û tengas dibe, serên rêyan lê tên girtin, Xwedê te'ala Emîn Cibrayîl bi rengê Baba Derwêşekî dihinêre pêşiya wî mirovî jibo çare û serederiyekê.

Nîşanî wî serhatiya wî mirovî digot: Ezê her diçim û diçim heya bigehijime cem Xwedê û gazinda xwe jê bikim, û çû û çû û guh nedaye mirovan û şîretkaran heya Xwedê emîn Cibrayîl bi rengê Baba Derwêşan hinartiye pêşiya wî û lê bû Xwedan û rêber. Yanî heke mirov Qewl û Beytên Êzîdiyan bixwîne, dibîne, ku Ezrayîl û Cibrayîl dema rihan distînin, têne ser rûyê erdê. Nimûne:

Ji Qewlê Mûsa Pêxember[10]

Rojeke ji rojan e
Mûsa wê dixune mişûr û kitabane
Ezrayîl û Cibrayîl li mezela Mûsa dibûne mêvane.

Sibeke ji yên xilfete
Mûsa wê dixune mişûran û xete
Rêya Ezrayîl û Cibrayîl li mezela Mûsa dikete

Mûsa wê deng dikete
Ya Cibrayîl we çi xilmet e?
Îro giyanê min jiber we girtibû heybete.
Ya Mûsa bes bike sexbêre
Rabe riha xwe bi me bispêre
Hate ser te mersûma cebêre.

Her wekî di sebeqekên Qewlan de xoya bû
Ezrayîl û Cibrayîl

Mûsa dibêje :
"Bi wî kim, yê ku xefûr e
Ez li ruha xwe nakem destûre
Kulfetê min hêş jî hûr e."

Wa dibêje Cibrayîlê Emîn e:
"Ya Mûsa min Emrîn e

www.sivarkurdi.org

Rizqê kulfetî we li Xwedê ye,
Li te nîne.

Ya Mûsa rabe hilweste
Em dê ber bi behrê kin qeste
Dê ferwara Xwedê nîsanî te kin dest bi deste."

Mûsa rabû hilweste
Wan ber bi behrê kire qeste
Emîn Cibrayîl şiva qûdretê hilgirtbû bi deste
Li behrê da ji heybetê dû têl jiber vedweste.

Hey Pedşê minî pedse
Binê behrê kirme û dase
Di devê kirmî pelgek maşe.

Lê Mûsa xwe ne sparte destên milyaketan, revî û revî heta dît:

Mûsa ji wê vedigeriye
Dîtin dû ciwanên qîmetiye
Wê tirbekê dikoliye
Çû cinaze diyar niye.

Cibrayîl gotê:
"Ya Mûsa me biryarek hebû
Bi bejnê her wekî te bû
Ka birêne, ev tirbe we bû yan wa ne bû?"

Derê tirbê li hesil dena
Aliyek ax e, (y)êke xena
Gotê: " Birano, neku li min bikin fena.
Derê tirbêyî hind e
Ji qewlê pîr hevind e
Mûsa razabû di bin de"

Derê tirbêyî reş e
Ser singê mûsa raxistibûn ax û ferşe
Mûsa got: " Bêhna vê tirbê bi min gelek xweş e"

Liber ronahiya vî Qewlî sîma û şiklê Milyaketan liser erdê û hindek ji rolên wan jibo bi cîanîna ferwara Xwedê qenc xwiya dibe.

Di Qewlê Seremergê de dîsan rengekî din ji sîmayên ku tên berçavê mirov, xwiya dibe:

Ji Qewlê Seremergê[11]

Kirme xaniyekî bê derî
Dido hatine ser min, wê dixûnin wekî teterî
Mîna heft dolabên aşan li serî.

Dido hatine ser min, wê dikine qîr û qale
Yekî kerr e, yekî lal e
Wê ji min dipirsin hal û hewale.

Tirsa min ji yê kerr e
Dembûsê wî heftê batman perr e
Rojê sê caran tê bi diyarî min re

Tirsa min ji yê lal e
Heftê batman dembûs heye li bal e
Ewê liser riha min bûye hewale.

Ku li min dihilînin dembûsî
Wê jê diçin birq û birûsî
Ji tirsan dil û hinavên min pêk ve dinûsî.

Gava li min diweste
Heftê batman dembûs hesin heye li deste
Ji tirsa da, zimanê min disikeste.

Dido hatine ser min, ji min dipirsî (pirsîne)
Çeqmeqê wan weke kurs î
Miskîno, benî Ademo, tu çî ins û çî cins î?

Benî Ademo hun li ku ne?
Hero sibê radbin şerêt we dinune
Me çû xêrên we ne dîne.

Benî Ademo em bixwe xêr in
Em rêzdarên cebêr in
Em Xwedanên xêra na azêr in.

Dido hatinê ser min çav (di)mezin weke tas
Tiliyên wan weke misas
Nênûkên wan weke das.

Min got: " Sed xweziya min bi wê ruhê be,
yê bê sûc, bê binas"

Dido hatine ser min çav mezin weke stêr
Tiliyên wan weke bêr
Nênûkên wan weke kêr
Min got: " Sed xweziya min bi ruhê ehlil xêr,
ne sed xwezî bi ruhê inkêr.

Dido hatine ser min sehet li sixûn
Di bilind in sehetek mezin
Ji tirsan, dil û hinavên min dilerizîn.

Dido hatinê ser min reş in weke Feqîr
Biskî nerm in weke herîr
Pêre hebû nîsana mîr.

www.arsivakurdi.org

Gava dihatin û qedimîn
Çêrekê dikelimîn
Bi ilmekî di'ilimîn.

Ew bû ilmê qatê
Zebêniya ez birime ser pira siratê
Ew bû ciyê Xwedê lê dike şifatê.

Liber ronahiya vî Qewlî em dikarîn hem rengekî sîmayê wan nas bikîn, dema ew têne erdê û ferwara Xwedê bi cih tînin û her wisa hinera wan ku xaleke herî giring e ji baweriya Êzîdiyan derbarî Milyaketan ku dibêjine riha mirovê mirî.

Em bixwe xêr în
Razdarên cebêr în
Xwedanên xêra na azêr în.

Anku Milyaket razdarên Xwedê ne û ew xêrxwaz in, ne serxwaz in.

Erk û rolên Milyaketan[12]

Liber ronahiya çend sebeqên Qewlê Mûsa Pêxember, Qewlê Seremergê, Qewlê Tasî-Melek Di'a Êvarê diyarbû, ku Milyaket ji nûra Xwedê ne û kilît û milîte bi destên wan in, Milyaket xêr in, razdarên cebêr in û Xwedanêt xêra na azêr in û ferwara Xwedê bi cih tînin. **Lê her Milyaketek jî erk û roleke taybetî heye,** nexasim dema surra wan tê erdê û bi wan navên me berî niha diyar kirin, têne nas kirin.

1. Ezrayîl ku Melik Nasirdîn e. Ev Milyaket ruhan distîne, Xwedanê kêrikê ye. Li Lalişê Birka Nasirdîn heye, dibêjin dema Melik Nasirdîn bi kêrika xwe riha mirov distîne, diçe kêrka xwe di vê Birkê de ji Xwînê diso.

2. Cibrayîl ku Melik Sicadîn e, qazidê Rebilalemîn e. Deng ji ba Xwedê jibo mirovan ditîne. Her wekî di sebeqên Qewlên nav birî de xûya bûye Ezrayîl û Cibraîl ruhên mirovan distînin û ferwara Xwedê bi cî tînin.

3. Mikayîl, ku Melek Fexredîn e, ew delîlê hemî Pêxemberan û heftê û dû miletan e.

Melek Fexredîn delîlekî çê ye
Rêberê çendî rê ye.
Ew dizane hesen ji hisin e, ji fesala dirrê ye.
Ji ba zebûnan hatibû cewabe
Ku dahir bûn zor sihabe
Hêvênê hemûyan ji ba Hesenê Bewab e.
Ji ba zebûnan hatibû xebere
Ku dahirbûn zor Pêxembere
Hêvên hemiyan ji ba Hesen bi cehwer e.

4. Derdayîl, ku Melik Şêxûbekir e, ew mewla ye, sikanê erd û esman danaye.

5. Şemqayîl ku Melik Şemsedîn e, ew Xwedanê mohrê ye, anku rojê ye, ew rizqan dide û mefera mêrê Êzîdî ye. Roja Sêşembê roja wî ye:

Bi wê Qûbê kim serî, li esmên e
Wê li bin di'îsiyê find û şemalên nûrîn e
Mîrê dîwanê Şîxadî ye, Dîwanbegê Şemsê Êzdîn e.
Bi wê Qûbê kim serî li ers e
Wê li bin di'îsiyên find û semalên ges e
Mîrê dîwana Şîxadî ye, dîwanbegê bi xwe Şêşims e.

6. Ezazîl, yanî Tawisî-Melek, ku serokê Milyaketan e û emînê razdarê dîwana Xwedê ye, îmana mêrê Êzîdî ye li erdê. Şîxadî sûna anko cihê wî digire, wekîlê wî ye, rê û rism û hed û sed ji danîna wî ye.

Şîxadî, Tawisî-Melek û Xwedê yek in
Hun çû maniyan jê nekin
Ev miraza zû hasil dikin.
Anko surr û nûra Şîxadî li erdan ji surr, hiner û nûra Tawisî-Melek e, ew ji nûra Xwedê hatiye afirandinê.

7. Esrafîl, ku Melik Şêxsin e, Qelema îmanê ye û girtin û berdan bi destê wî ne, li esman Şêxê Sinetê ye û li erdê qewet da nebiyên ometê. Li vir sebaret ji Pêxmberan re, Melik Fexredîn ji wan re delîl e û Melek Şêxsin hêz, hiner û qewetê dide wan.

Tawisî-Melek, ku serokê Milyaketan e û razdar û emînê Xwedê ye û Adem li behiştê gerand

û bi şîret û ferwara Xwedê Hewa ji bin çengan efirand û ew fêrkirin, ku zad û ta'mên behistê bixwin û paşî anîne ser erdê, daku zê û za ji wan çêbibin û hersal li çarşemba serê Nîsanê, deng dike li beharê , daku bi şîniyê bi xemile û pîrantiyê li kinyatê dike û rêberiyê li çendî Meliyaketan, Pêxember û Xas, bavçak, Mirov û tev giyandaran dike, ew Pîr e û rêberê çendî Pîran e û jibo me Êzîdiyan sembola her pîroz e û îmana me ye û

www.ararvakfi.org

serwerê çendî xas û Milyaketan e. Bi kurti rola her heft Milyaketan li erdê her wekî di van sebeqên xwarê de xwiya dibe:[13]

Nasirdîn Celadê ruhan e
Sicadîn Qazidê Pedşa ye
Şêxûbekir Mewlayê mêran e
Melik Fexredîn delîlê erdê ye
Şêsims Melkê rizqan e
Melîk Şêxsin cehwerê mêr û melekan e
Şîxadî pedşa ye, serwerê mêran e.

Dîsan sebaret rolê Milyaketan di mîtologiya Êzîdiyan de hatiye: Her mirovek dû Milyaket liser milên wî ne, Milyaktê milê rastê, kiryarên, karên xêrê, yên wî mirovî, dinivîse û Milyaketê liser milê çepê kiryarên mirov yên sas dinivîse.

Dema mirov dimre û ruhê wî dibine Lalişê û liser berê Sûka Me'rîfetê, Nasînê, datînin û bi amadebûna Şêx, Pîr, Merebî û Birayê wî yê Axretê û Xwedanê wî Milyaket kar û kiryarên wî diksînin. Yên bas dikeve aliyê din de û ligorî karên wî, xêr û gûnehên wî, mehkeme dibe.

Tawis - Sembola Êzîdiyan

Her miletek anjî dînek ji xwe re Sembolek hilbijartiye, ku wek nîsan e jibo dîtin û saykolociya wî ye. Êzîdiyan jî sembola Teyr Tawis ji xwe re hilbijartine. Bi dîtina min jiber çend sedeman:

1. Teyr Tawis sembola serokê Milyaketan - Tawsî-Melek e.

2. Teyr Tawis ciwantirîn Teyr e di nav balindiyan de û hemû rengên ciwan di nava perîn wî de hene. Her wisa li der û dorên gewdê wî nîsanên mîna çavan hene û çaxê ew perên xwe vedike hingî mîna tîrêjên rojê xwiya dibin û eskere ye, ku roj jî pîroztirîn semol e li cem Êzîdiyan û nûra Xwedê ye, ya ku Milyaket û serokê Milyaketan jê hatine efirandin.

3. Jiber ku Êzîdî ji ciwanî, ronahî û nûrê hezdikin û ev teyr hem sembola nûrê ye û hem ya ciwaniyê ye û sembol e jibo serokê Milyaketan, yê ji nûrê hatiye efirandin, lewma jî Êzîdiyan ji xwe re kiriye pîroztirîn sembol.

Û di bînên weke ala Êzîdxanê de sembol e, ku ji misê zer (tunç) hatiye diristkirin, mîna wêneyê Teyr Tawis. Û Êzîdî hûrmet û rêzê jêre digrin, weke çawa dîn û miletên din rêz û hûrmeta al û sembolên xwe digrin, sebaret jêhezkirina Êzîdiyan jibo hisn û saykolociyê ev teyrê ciwan ji xwe re kirine sembol, di "Qewlê Îmane, bi çî nîşan e" de hatiye:

Ji Qewlê Îmanê

Bi kêr mêran tê heya, edeb û aqil
Ji wan nebin mişemir mebideye
Rê bi rastî dibe, bi xwe ye
Bi kêr mêra tê hisn edeb û heya.

Li vir xwiya dibe, ku reya rast û ronahiya îmana mêrê Êzîdî pê kokî temam dibe aqil, hisn û ciwanî, edeb û şermînî. Lew dibêjin: **Em Êzîdî Xwedêperest (Xwedêperês) in, baweriyê bi Milyaket, Xas û Bavçakên xwe ditînin û rêz û hûrmeta sembolên xwe digrin.** Diyatirîn sembol jê Tawis e û ew nîsana Tawisî-Melek e, ala Êzîdxanê ye.

Sebareta navê Tawisî-Melek ji aliyê ziman ve, nivîskaran liser vî babetî wisa dinivîsînin: Çendekan ji wan bîr û hizrên cûda - cûda anîne ser ziman: "Ev ji peyva Temûz ya babilî hatiye. Temûz jî Xwedanekî anjî Xweda- mendekî Babilyan bû". Hineke din jî dinivîsîni: "Ev ji Peyva Teyos ya Axrîqî hatiye. Ew jî Xûdawendê ciwaniyê Xweşîjbûnê bû li cem wan."

Û nivîskarên mîna Sedîq Demelocî: "Ev peyv ji peyva erebî Tus hatiye, û gotiye: "Tus jî anko ciwan bi zimanê erabî ye. Lê bi dîtina me, ev peyveke Arî- Kurdî ye û pir kevnar e û ji du heb peyvan pêk hatiye: Tav, Ta anjî Tî, Tîk ku ji wataya nûra û germiya rojê tê.

Tîrmah jî, ku navê heyveke meheke Kurdî ye û dikeve germ û kela werzê havînê. Her ji vê yekê bi nav bûye. Peyva ûs jî li cem miletên Arî û bi taybetî Axrîqan, anko Xwedanmend anjî Heq bi vê yekê peyva lêkdaya Tawûs anko "Nûra Xwedê".

Şîroveyên van nivîseran liser wataya peyva Tawis ne dûr in ji wataya vê peyvê di zimanê Kurdî de û her heman tê gehiştina bîr û baweriyên Êzîdiyan, dema Êzîdî dibêjin: "Her heft Milyaket ji nûra Xwedê hatine efirandin, ku serokê wan Ezazîl e anko Tawisî- Melek e."

www.arsivakurdi.org

Qewlê Şêxê Hesenî Siltan e

Şêxê Hesenî Siltan e
Hey ezîzê mala bavê mino, Babê qelpê Rehman e
Mîrê Qelendera(n) hey li min hayê
Lalis ye bor, Dîwan ye bor , Yabor ye bor
Ay birîndarê Mêrano, ew Siltan Şîxadiyê li hemû derdan yî derman e.

Şêxê Hesenî Feqîr e
Hey ezîzê mala bavê mino, bavê qelpê Mîr e
Mîrê Qelendera(n) hey li min hayê
Lalis ye bor, Dîwan ye bor, Mergeh ye bor, Yabor ye bor
Ya birîndarê Mêrano, ew Siltan Şixadî ye
Li hemû derdan yi xebîr e.

Şêxê Hesenî Seyîd e
Hey ezîzê mala bavê mino qelpê Mirîd e
Mîrê Qelendera(n) hey li min hayiyê
Lalis ye bor, Dîwan ye bor, Mergeh ye bor, Yabor ye bor
Ya birîndarê Mêrano, deriyê mirazan heyî Siltan Êzîd e.

Şêxê Hesenî mezin e
Hey ezîzê mala bavê mino bayê qelpê momin e
Mîrê Qelendera(n), hey li min hayê
Lalis ye bor, Dîwan ye bor, Mergeh ye bor, Yabor ye bor
Ya birîndarê Mêrano deriyê mirazan
Hey Melik Şêxsin e, ew e ciyê gilî û gazinan.

Şêxê Hesenî ehmer e
Hey ezîzê mala babê mino xaliqekî minî her û her e
Mîrê Qelendera(n), hey li min hayê
Lalis ye bor, Dîwan ye bor, Mergeh ye bor, Yabor ye bor
Ya birîndarê Mêrano, hekûmeta Siltan Şîxadî diwazdeh (her sale)
Şêxê Hesenî dil birîndar e
Hey ezîzî mala bavê mino, li borê mehbetî siwar e
Mîrê Qelendera(n), hey li min hayê
Lalis ye bor, Dîwan ye bor, Mergeh ye bor
Ya birîndarê Mêrano, textê mêran heye qiryar e

Şêxê Hesenî Esed e
Hey ezîzê mala bavê mino, xaliqekî minî semed e
Mîrê Qelendera(n), hey li min hayê
Lalis ye bor, Dîwan ye bor, Mergeh ye bor, Yabor ye bor
Ya birîndarê Mêrano bê firwara Siltan
Şîxadî rih naçit e, ew cesed e.

Şêxê Hesenî Celal e
Hey ezîzê mala bavê mino
Ez bi wê Qubê bikem serî ta'l e
Lalis ye bor, Dîwan ye bor, Mergeh ye bor,
Ya birîndarê Mêrano bê firwara Siltan
Şîxadî ew ceseda rih naçit e bale.

Ev sebeqên jorî Bedel Feqîr Hacî jiber kasêteke deng nivîsiye. Ev Qewl bi awas û melodî tê gotin. Mixabin ez dûrî Feqîr Hecî me, yê ev Qwel gotî û jiber vê yekê ez nikarim vî Qewlî bitewayî binivîsim.

Perawêz

1. Ev Qewl ji deftera Şêx Elo min wergitiye, herwisa di Kovara Lalis de, hejmar 8, hatiye belavkirin

2. Gûndyatî, Xidirê Pîr Silêman rûpel 72-78, çap 1985

3. Govara Lalis hejmar 5, rûpel 59-68, weşanên Bingeha Lalis, Dihok

4. Êzîdyatî, rûpel 29-31, Xidirê Silêman û Xelîlê Cindî, Bexda, 1979

5. Gûndyatî, rûpel 22-37

6. Di dîdarekê de di gel Qewlbêj Şêx Osman û Qewlbêj Feqîr Hecî, navên Milyaketan ji min re gotîne.

7. Govara Lalis hejmar 5, rûpel 59-68

8. Gûndyatî, rûpel 72-77

9. Êzidiyatî, rûpel 24-26

10. Gûndyatî, rûpel 105-109

11. Gûndyatî, rûpel 91-105

12. Çavpêkeftin di gel çendeha Qewilbêjên Êzîdiyan ji wan Pîr Abû Xetarî, Feqîr Hecî, Şêx Elo, Feqîr Osman).

13. Ev çend sebeqe min jiber devê Şêx Osman nivîsîne û bi taybetî navê Milyaketan li esmên û surrên wan li erdê, ku wî jî ji cem Qewal Elyasê Behzanî û Koçek Sadiq wergirtiye.

Navnîşana têkiliyê

E-Mail: Pir-Xidir@yezidi.org
homepage: www.yezidi.org

www.arsiv.kurdi.org

Qewlê Mehdî Şerfedîn

Xaliqê minî sewab e
Û Padşayê minî li ser cewab e
Bê reza Xwedê û Tawisî-Melek
Tu car pel ji darê nabe.

Yekî min di wê de yî, tebab e
Û liber mehekan rawestiya be
Dê kengî Mehdî Şerfedîn rabe?

Dê rabe Mehdî
Û ne sindî dimîne û ne qadî
Hingî sunetê hesabî.

Hesabî sûnetê
Û ya Melik Şerfedîn
Bi rehim û sefeqeta xwe
Sirêt batinê dibermeke !

Dibermeke sirêt batinê
Û ew in, cindî pêdibin xenê
Ya Melik Şerfedîn t´ kengî derî hawata dinê?

Cindî dixinêne
Li gêdûkan mêrên çêne
Bitinc hizranî ji me divêne.

Çêbûn siwarên gêdûkan
Dê bixemlînin suhbêtî bûkan.

Şuhbêtî bûkan bixemlînin
Sindirûkêt kesk û sor û zer derînin
Hem bi rêya navê Siltan Êziyê, sêrîn li ser xwe binîn.

Rojekê yê bête cenge
Û Feqîrên lê bixemlînin letan û zendan
Ew roj ne roja mêrê leng e.

Rojekê tête dahire
Û dahir bî bi qelbekî feqîran
Melik Şerfedîn dê wa hizretê li te digire

Ya Siltan Êzîdê min tu karî !
Û çima nakî
Û tu Melik Şerfedîn dikarî ji mixarê rakî
Û xelkê asê pê mitak î.

Û xelkê asê pê mitî bî
Ol û erkan marifet û rê bî
Pênc ferzan ferzek ne li cê bî.

Her pênc ferzên heqîqetê
Şêx, Pîr, Hosta, Yar û Birê Axretê
Fer e li sûnetê îro dinyayê
Sibê li bangê axretê.

Sinete ye, bi lez e
Siwar dibe, li borekî dibeze
Digel cindiyan emê herne xeze.

Emê dilan bidene Feqîra(n)
Û bila bixemlînin lpan û herîra
Ya Melik Şerfedîn hewakê bide xirabê fêniyêt wî re.

Ya Melik Şerfedîn hewakê li me vede!
Û pey tê bûn Serheda
Tu me bi destên (şirî'etê) ve bernede !

Ya Siltan Êzî ji ewil tu berat î
Û tu Xwedanê itiqat î
Û t´ li ser pira selat î.

Tu li me birênî bi çavê sefeqetê, bi dilê rehmêtê
Tu ronahiyekê bidî dilê me û çendî sûnetê
Sûnetê diperistî
Li dest û dayinê tu ney sist î
Ya Melik Şerfedîn dayîm tu ne yî, nivistî.

Melik Şerfedînê Adiya yî, tesel e
Dîwanbest û mehfel e
Nav û dikarêt Siltan Êzî yê şêrîn bang û sela

Feqîr hatine ser min bi micade
Û me li Siltan Êzî atiqade
Ezîzê min zû bi bangê dihate.

Li van bangan ya li van rêberan
Û li van ezîzan li van rêberan
Siltan Êzî li banga me tê fere.

Bangiya me û cindiyên Mergehê
We digot emê Cimayekê bikin li Cimayê û Bîrîmayê
Encex Siltan Êzî bang hewara me bê.

Çendî şev e û çendî roj e
Sinetxane yî bi guneh e, yî bi soj e
Ya Melik Şerfedîn ji destê serî'etê
Vê meclisê, te lê bikre doje.

Çendî roj e û çendî sev e
Û dara Sunetxanê dikir, ev e
Ya Melik Şerfedîn bi bor ve ji mixarê derkeve!

Wê dibêje Melik Şerfedîne
Û heke Şêsims bike ezîzîne
Û latê ji ser derê mixarê derîne!
Dayîm bor yî, bi zîn e.

Dema bi zîn bikire hêstire
Cimake Şêxan û Pîran Hosta û Merebiyan
Bikira ev dinya pê fetih bikire.

Rojekê diherême
Û celsa Siltan Êzî bi xwe dibême
Vê fêniyê têk didime.

Ez têk didime vê fêniyê
Bi destûra Xwedê û Şîxadî emê bajonin ser textê Amediyê
Eme serê van kafiran jêkin û bavêjin dojeyê.

Ev zeman dê we bî
Şîxadî şade bî
Zimzim û Qubildor heca me bî.

Ev zeman dê mirîd bî
Atiqada me Siltan Êzîd bî
Zimzim û Qubildor heca me bî.

Ev zeman dê bi îman bî
Pîr Resê heyran bî
Zebûnî her çar biran bî.

Xwedanê keremê cêsê geliyê
Lalis bi hewara me bê
Sed rehmî li dê û bavên gehdaran û seydayê me, emid kêm in û Xwedê yî temam e

Çavkanî Feqîr Elî Catûk
Nivîs Sedîk Düzgün
Rastkirin Pîr Xidir Silêman

www.arsivakurd.org

Mirîd li ba Êzîdiyan - çîneke mezin û serekî di Êzidiyatiyê de

ÎDO BABAŞÊX (IDO BABASHEIKH)

Gelek nivîskaran liser çînên Êzîdiyan nivîsîne, lê yên liser mirîdan nivîsîne, hindik in. Di vê gotarê de emê bîr û baweriyên hinek nivîkarên biyanî Ne-Êzîdî û Êzîdî ji xwendevanên xwe yên hêja re bidine xûyakirin. Dûvre emê Mirîdantiyê di rêya Qewlên Êzîdiyan de bînin ser ziman û hindekî zelaltir bikin.

Sedîq El-Demlûcî, nivîskarekî ji Îraqê ye û ji 30 salî bêtir jiyana xwe li nav Êzîdiyan derbaskiriye, wisa liser Mirîdan nivîsiye: "Mirîd anjî çîna piraniya gelên Êzîdî, yên ne Şêx in û ne jî Pîr in, çîneke pir mafên wê di Êzîdîtiyê de hatine xwarin û hundakirî ne. Çîna Mirîdan çîna dawî ye di hîrarsiya olî de, serbestiyên wê pir berteng in û mafên wê yên civakî pir bi qeyd in. Çînên olî yên din dixwestin, ku Mirîd her û tim bindest û tepliserî bimînin. Ji wan re qedex ye, tiştekî liser ola xwe bizanibin anjî jê biaxivin. Bi yek gotinê:" Mirîd kole û girêdayê Şêxê xwe ye."

1. El-Yezîdiya, Sediq El-Demlûcî, El-Mûsil, 1949, rupelê (r.) 53.

Nivîskarê îraqî Abdilrezaq El-Hesenî, yê ku weke nivîskarên berî xwe nivîsiye û ne baştir ji wan, dibêje: "Bastirîn peyv liser Mirîdan, ew çêlekên bi şîr in, ew gistiya gel in -gelê tevayî, amli jêrî fermana serokên oldarî ne bê merc, sert û gotin û daxwaziyên wan bê kês û vekês bi cî tînin, ji wan re nabe pirsiyariya olê bikin û pirsgirêkên olî derxînin holê. Çênabe, ku ew jinekê ji çînên din bînin, ew weke mirovên bê qîmet in. Ew weke hindek çînên Hindûsiyan li Hindistanê ne."

Her wiha nivîskar Zûhêr K. Abûd bi vî sêweyî dinivîse: "Mirîd kesên ne dunav in (rûhanî ne), piraniya Êzîdiyan Mirîd in, her Mirîdek bi Şêxekî û Pîrekî girêdayî ye, ji wan re çênabe jinan ji çînên olî din bînin. Mirîd dikarin bibine Koçek, anjî Feqîr heke sikestiyê ola xwe bin û pir ber bi perestina Xwedê ve herin." 3

« Mirîd anjî çîna piraniya gelên Êzîdî, yên ne Şêx in û ne jî Pîr in, çîneke pir mafên wê di Êzîdîtiyê de hatine xwarin û hundakirî ne. Çîna Mirîdan çîna dawî ye di hîrarşiya olî de. »

2. El- Yezidiyûn fi hadirîhêm we madîhêm 6, rûpelê 78, Abdilrezaq El-Hesenî, Bexda, çapkirina 7, 1981

3. Lamahat anil Yezîdiya. Zûhêr Kazim Abûd, Bexda, 1990.

Em dikarin bibêjin, ku nivîskarê Kurd, Şakir Fetah, her weke El-Demlûcî nivîsiye, anku nivîsîna wî wergerandiye zimanê Kurdî. Ew dibêje: "Her mirovekî ji çîna gistî be, Êzîdî jêre dibejin "Mirîd". Ew mîna mirovên nefret jê bûyên Hindistanê ne. Ola Êzîdîtiyê Mirîd xistine çîna jêrî - dawî, xwar - serbestiyên wan berteng in, pir mafên wan ji wan hatine standin.

Berê xwe didine wan, jinan ji wan nayînin, ew her bindest in û çênabe pirsan liser olê bikin anjî bînin ser ziman."

Pistî ku me bîr û baweriyên çar nivîskarên misilman dane xûyakirin emê niha temase bikin, ka nivîskarên me Êzîdiyan, çi dibêjin. Nivîskar Hoseng Broka wisa nivîsiye: "Mirîd, ev çîn tu ciyê oldarî nîne, rola wan mîna rola cîna Odra li cem Hindûsiyan e."

El-Yezidiyûn wel diyana El-Yezîdiya, rûpelê 93, ji nivîsînê Şakir Fetah, wergerandina Dexîl Şemo El-Hakim, 1997.

Weke goraveke olî divê Mirîd li peyî gotina dunavên xwe bin, jiber ku hêbet û desthilîna wan ji giyanên xasên wan hatine û her wiha ji wan tirs û xof digirin û rûmeta navê wan digirin, yanî ew li pey wan in.

Bê çawa her Şêxek anjî Pîrek Mirîdên wî hene, wisa pêwist e, her Mirîdek girêdayê Şêxekî û Pîrekî be. Ev şertek anjî mercek ji mercên ola Êzîdîtiyê ye -Şêx û Pîr, Hosta û Merebî, Yar û Birê

www.arsivakurdi.org

Axretê, ew in her pênc Ferzên Heqîqetê-. Şêx û Pîr mafên xwe hene, ku hindek caran Mirîdên xwe hilbijêrin anjî biguhêrin. Lê ev maf di destên Mirîdan de nîne, jiber ku ew girêdayên wan in û mecbûr in li pey wan bin - neku ji razîbûn û dilovaniyan bêpar bin.

Dikete bindestê serokê binemalê (giyanê wê rihê we Xwedan tiste xûya li vê binemalê lihevkirina beniya – kal - Mirîd û desthilata banînî. Pir şîret di çanda Êzîdiyan de liser vî babetî hatiye. Mina: "Heke Mala Adiyan bû av jî, hun nedine nav". "Bê û Şêx û Pîr niçine Dîwana Mîr".

Jin anîn di nava wê çînê de ye û nabe jê derkeve.

Nivîskar Izeddîn Baqisrî bi kurtî dibêje: "Mirîd, ew çîna gistî ne li nava Êzîdiyan û bi ferzên olê radibin bi eyneteke pak, her Êzîdiyek Şêx, Pîr û Merebiyek heye. Ew jî rê û rismên olî, şîret û giravên wan ji wan re didin xûyakirin û dixine bira wan, û çend karan ji wan re pêk tînin, weke kefenkirin, vesartin –biçîkirin- û sûştina miriyan, xwendina Qewlê Seremerg û Terqîn û Nasînê liser wan.

Dr. Xelîl Cindî dibêje: "Mirîd Xelkê gistî ne, ji pir êlan in. Ew dikarin bitenê ji çîna xwe bizewicin. Lê di yek rewşê de zewaca wan nabe, dema dibine kirîvên hev.

Li ciyekî din dibeje: "Û heke me bizanîbe ku her Êzîdiyek, dereca wî ya olî çi ye anjî kîjan girûpe ye, divê Şêx û Pîr û Merebî û Yar û Birê Axretên wî hebin û jinanîn di navbera wan de nabe, anku li navbera Şêx û Şêxê wî û li navbera Mirîd û Şêxê wî.


Extiyarê Mergehê, Bavê Şêx Xeto

Nivîskar Îlhan Kizilhan jî di vî warî de wisa dibeje: "Mirîd anku duvelenk, ev di sofismê de bikar hatiye, li cem Êzîdiyan jibo xelkê bi kar tên. Mirîd bitenê ji navbera xwe dizewicin, her binemaleke Mirîd Şêxek û Pîrek heye, ew tu maf nîne Şêx û Pîrên xwe bixwe bibînin û ji xwe re hilbijêrin, ev bingeh hêne ji dema Şîxadiyê Hekarî hatiye danîn û bê guhertin maye. Û her wiha Mirîd çênabe Şêxekî anjî Pîrekî ji binêmaleke din nû ji xwe re bigre."

Nivîskarê biyanî Profêsor Philip G. Kreijenbroek liser Mirîdan wisa dibêje: "Bingeha vê çînê ji sofîtiyê hatiye, peyva "Mirîd" yanî duvelan – Xwedanî. Hemû divê bi Şêx û Pîr bin. Peyva "Mirîd" tê jibo wan mirovên Êzîdî, yên ne çînên – Klêrîkên - olî ne, yanî xelkên gistî."

« Hevbendî û pêwendiya di navbera Şêx, Pîr û Mirîd de, hevbendiyeke olî û rûhî ye. Di Êzîdîtiyê de mirov nikare pêwendiyên Şêx-Pîr-Mirîdan bike weke pêwendiyên navbera Axa û Koleyên wî. »

Li gorî baweriya min, Mirîd ji demên kevnar ve hebûn, jiber ku her Xwedanek anjî Xwedêyek hindek mirov li pey bûn û perestin û xizmet ji wan re dikirin. Ev rabûn û rûniştin her kevnar e û heya îro jî di navbera Êzîdiyan de maye.

Dibe ku gotina "Mirîd" ji sofîtiyê hatibe, mana xwe Daxwezkar e. Nimûne: "Mirîd nabe Mirîd heke viyana wî (daxwaziya wî) ne li pey viyana Şêxê wî be, ew di nava destên mirîşoker de ye, yanî ewê ku mirî diso li gorî dilê xwe.

Hevbendî û pêwendiya di navbera Şêx, Pîr û Mirîd de, hevbendiyeke olî û rûhî ye. Di Êzîdîtiyê de mirov nikare pêwendiyên Şêx-Pîr-Mirîdan bike weke pêwendiyên navbera "Axa û Koleyên wî". Ez nabinim rast û dirist û baweriya min jî ji baweriya hindek nivîskaran cuda ye. Mirîd ne çîna jêrî ne û dûvik in jibo Şêx û Pîrên xwe. Mîrê Şêxanjî Mirîdê Şêxekî ye û Extiyarê Mergehê (Mîrgehê) jî Mirîdê Şêxekî ye û Şêxên wan ji wan belengaztir in.

Û jinanîn nebitenê qeydeke jibo Mirîdan e. Hemû çîn, çi Şêx, çi Pîr û çi Mirîd rêz û rismên xwe hene û ew mecbûr in bi van rêz û risman ve girêdayî bin. Yanî Pîrsgirêka ku Şêx û Pîr û Mirîd tevlîhev nabin, ne bitenê barê ser milên mirdan e, ew jibo Êzîdiyan hemûyan çêbûye, ne weke ku hindek nivîskaran nivîsîne.

Êzîdîtî jî sistêmek e û her Êzîdî sinûr jê re hene, ev sinûr çê nabe derbas bibin. Bi vê gotine mebesta min ew e, ku hevbendiya Mirîd, Şêx û Pîr hevbendiyeke olî ye. Hindek

www.arsivakurdi.org

Mirîd gihistine pir pilên bilind di rêza olî de, weke Koçek Birhîmê bi nav û deng. Ev weke min got, Mirîd bû û mirovekî belengaz û bêmal û mewdan bû, lê ew di rêza olî de bû Extiyarê Mergehê (Mîrgehê) - Bavê Şêx.

« Mebesta min ji vê gotarê xûyakirina wê yekê bû, ku cîna Mirîdan çînek mezin û serekî ye di ola Ezîdîtiyê de û mafê wê heye, ku bigihije bilintirîn cî. »

Merteba Feqîrê Şîxadî di ola me de pir bilind e. Em dibînin, ku pir Mirîd bûne Feqîr û Xerqê Şîxadî bi mor hilanîne û li xwe kirine. Ev pîroztirîn cil e, jêre dibêjin Tanc û Hilên Şîxadiyê karî xêr.

Her wisa Qewalên Şîxadiyê karî xêr, yên Qewl û Nizayên me bi "Def û Şibaban" dibêjin, Mirîd in. Gera Tawisa Şîxadî li welatên Êzîdî têde hene, ew jî Mirîd pê radibin (Qewal).

Extiyarên Behzanê û Basîqê – ev du gundên Qewalan li Kurdistana Îraqê ne-, yên li Semayê li Lalisa Nûranî besdar dibin û ligel Extiyarê Mergehê li nava Êzîdiyan digerin, Mirîd in.

Pileya Merebî, yaku pileyeke olî giringe e, hindek caran di destên Mirîdan de ye. Nimûne: Merebiyên Şêxên Xatûnê, Mirîd in. Pir Micêwirên Xasên Êzîdiyan Mirîd in, weke Micêwirê Berkê Êzî û Micêwirê Darinka Şêx-Hemd û Şêx Fexir û pirên din.

Her wisa pir caran Mirîdan Şêx ji xwe re girtine, nebitenê Şêx dikarin xwe biguherin, weke ku hindek nivîskaran nivîsîne.

Ev xalên min anîne ser ziman û diyarkirin, didine xûyakirin ku pir tiştên nivîskaran û bi teybetî nivîskarên misîlman nivîsîne, ne rast in. Li dumayiya Peyva Mirîd pir caran li Kulturên olî yên Êzîdiyan hatiye? Lê mixabin ne bitenê nivîskarên Ne-Êzîdî ketine van saşîtiyan, dibe, ku nivîskarên Êzîdî jî pir bas liser vê pirsgirêkê nerawestiyane.

Qewlê Mirîdantiyê vê pirsgirêkê bas zelal dike û ronahiyê dide peyva Mirîd:

Qewlê Mirîdantiyê

Bêjime we xelqên êrifî jîrî zane
Ji Mirîdantiyê bidin beyane
Gelo Mirîdî bi çi nîşan e?
Mirîdî dê webî
Hincî xofa mîrê wî di delê wî de hebî
Ewî hayî ji maniya dînê xwe hebî.
Hincî maniya dirê bî
Kiryara (qestana) xwe cihêbî
Roja babek tevayî neqlê bî.
Libsê îmanê spî ye
Yî nazik e, yî letîf e, yî qewî ye
Hun ne hingivin gelî suniya(n).

Her wisa Qewlekî din dide xûyakirin, bê çawa Mirîd li dora Şîxadiyê karî xêr diciviyan:

Xeber e li nav seyîda(n)
Dahîr bû Şêxekî şehîde
Li Lalişê lê cema dibûn Mirîda(n)
Xeber e li nav Ecemistanê
Dahir bû Şêxekî bi îmanê
Li Lalişê Mirîdan pê kirin dîwanê.

Di sebeqeke din de diyar dibe, ku Memereşan, Xasekî Êzîdiyan e, bixwe jî Mirîd e:

Wê dibêje Şêxê seyîd e
Gava Memeresan didîte »
Tu Şêx î an Mirîd î?
Ez Memedê Reşî me
Siwarê berî me
Ez bixwe Mirîdê Şîxadî me.

15 sebeqeke din jî girêdana Şêx û Mirîd diyar dike:

Pîrê Xerqê me Siltan Êzîd e
Maneyeke be''îd e
Atqata min û çendî Mirîd e."
Di vê sebeqê de wisa hatiye:
"Şêxo! Es bûme Mirîd
Min heft salan xilmeta Şêxê xwe kir ji dil û êqîn
Çardeh tebeq erd û ezman ser kefa Xwedê min î dayimî, qedîmî rehîm.

Ev çend nimûne bûn ji Qewl û Sebeqên Êzîdiyan, yên gotina Mirîd tûnin ser ziman û hindek ronahi diavejin ser vê peyvê. Wekî din jî ew didine xûyakirin, ku Mirîndantî ev în û bawerî ye û ne bindestî û pewendiyeke materiyalî ye. Mebesta min ji vê gotarê xûyakirina wê yekê bû, ku cîna Mirîdan çînek mezin û serekî ye di ola Ezîdîtiyê de û mafê wê heye, ku bigihije bilintirîn cî (mertebe).

Ji aliyê din ve jî her Êzîdiyek Mirîd e, çi Şêx, çi Pîr û çi Mirîd, ne weke gotinên hindek nivîskar û bi teybetî niviskarên misilman. Ew dixwazin rûyê civata Êzîdiyan kirêt bikin û rastiyan berûvajî bikin.

Ferhengok

1. Çîn: Klas, tepeqe.
2. Nefretlêker jî çavavêtî, çîna herî bê giranbihabûn.
3. Xerqe: Kinceke piroz e, ji hiriya pez tê çêkirin. Pistî hingî tê rengkirin reş - bi ava pelên Dara Zergûzê. Ev dar jî piroz e.
4. Tanc û Hil: Dibêjin Tanc û Hilên Şîxadî, mîna sermilekî bi kulav bû. Şîxadî liber xwe dikir.

www.arsivakurdi.org

Pîroziya Nan di ola Êzîdîtiyê de - Lêkolîneke olî-civakî

ŞEWQÎ ŞEMO ÎSA (CHAUKEDDIN ISSA)

Ez bawer nakim, ku tu gel liser ruyê vê erdê weke Êzîdiyan û Cihuyan rûmetê bidin nan. şikandina nan berî destpêka xwarinê û biteybetî berî şîvê ku li cem cihuyan naskirî ye. Cihû vê edeta xwe bi hezarên salan bi rê ve dibin û nifsek dide nifşê li dû xwe.

Cihû mecbûr in ji zarokî ve hînî vê edetê bibin.

Heke Êzîdiyan nan û xwêya mirovekî xwarin, ew êdî tucar nokeriyê (xayîntiyê) lê nakin, bila ew mirov çi milet be jî. Ew nan û xwê, dibine weke bext û peyman di navbera wan de.

Heke mirovekî demeke dûvedirêj li dostekî xweyî lêzim nepirse û carekê ji caran ji niskê ve rastî hev werin, ew dibêje: „Gelo tu çiqasî bê nan û xwê yî!"

Heke hat û carekê mirovekî xayîntî li yekî din kir û pîştî demekê tofanek bi serê wî ve hat, hingê dibêjinê, ku nanê wî ew mirov kor kir, bextê wî lê da.

Mirovê sîrhelal û bi bext dibêje: „Ez bêbextiyan li vê malê nakim, jiber ku min pir nan û xweya wan xwariye anjî dê nanê wan min kor bike." Ji vir diyar dibe, ku pîroziya nan ciyekî bilind di ola Êzîdîtiyê de digire. Êzîdî dibêjin: „Zad (genim) anjî nan îman e."

Kurd bi giştî, çi Êzîdî, çi Misilman û çi Xaçperest, heke perçek nan di reya xwe de dîtin, pêwiste e li wan, ku rajine vî nanî, biramîsin (paçûkin), deynin ser aniya xwe û dûre wî liser kevirekî deynin. Pêlkirina nan pîr gunc ye.

« Ez bêbextiyan li vê malê nakim, jiber ku min pir nan û xweya wan xwariye anjî dê nanê wan min kor bike. Ji vir diyar dibe, ku pîroziya nan ciyekî bilind di ola Êzîdîtiyê de digire. Êzîdî dibêjin: „Zad anjî nan îman e. »

Heke keçek û xortekî semawenda xwe (daweta xwe) kirin, jînek ji mirovên zavê di pêsiya bûk û zavê de dîlan dike û di destekî de nan e û di destê din de kevgîr e.

Êzîdî çênabe nan bi kêrê bibirin, ew mecbûr in, ku ew wî bi destên xwe biskînin.

Min ji devên hindek Êzîdî bihîst, ku hindek Êzîdî hebûn, yên ji bîraweriya xwe ve hîç ne nan û ne savar xwarin. Wan digot xwarina nan gunehkariyeke mezin e.

Gelo çima Êzîdî nan (zad, genim) pîroz dibînin, çima hewqas jê xof dikin?

Di Mishefa Res de, ew pirtûka pîroz li cem Êzîdiyan, ya berî 1000 salî, di dema şîxadiyê karî xêr de hatiye nivîsîn, di besên 16, 17, 18 û 19 de, liser buyera avabûna cîhanê û avêtina Adem ji bihiştê û rola Tawisî-Melek di vê avabûnê de wîsa hatiye nivîsîn: „... û wisa padsahê Keremê berda wê erda pîroz û dengê xwe li Cibraîl Tawisî-Melek kir, ku axê ji her çar kinarên (anîşkên, quncikên) erdê jêre bîne.

Tawisî-Melek çû û her çar êlêmêntên pîroz, ax, av, ba û agir ji padsahê xwe re anî. Xwedê ji wan qalibê Adem çêkir û bi hinera xwe rih berda ber. Careke din gote Tawisî-Melek, ku ew Adem bibe baxê bihistê û şîretan lê bike, ku ew genim nexwo.

Pistî 100 salî (ev sinûrê temenê insanî ye. Baweriya nivîskar.) Tawisî-Melek gote padsahê xwe:" Ya padsahê mezin, wisa çênabe, pêwist e , ku sexelê (tuxmê) Adem zêde bibe û erd ava bibe."

Xwedê gote Adem:"Min ev kar xiste destê te û bi pêkanîna wî tu pê rabe."

Tawisî-Melek çû bihîstê, daku Adem bibîne. Wî gote Adem:"Vê gavê te genim xwariye?" Adem gotiyê „Na xêr" Xwedê li min qedexe kiriye, gotiye min, ku çê nabe ji dara genim bixwim."

www.ardiyan.org

Tawisî-Melek jê re got: „Bixwe, ji te re baş e."

Çawa genim çû zikê Adem, ew pêre pêre nepixî û bîna wî jiber êşa zikê wî pir teng bû. Tawisî-Melek ew ji bihistê deranî û avête erdê û guhê xwe jê birî û careke din firiya ezman. Bîna Adem pir teng bû, jiber ku derketina wî tune bû. Hawar û gaziyên xwe gihande Tawisî-Melek, daku wî ji astengiya wî xelas bike. Tawisî-Melek teyrek jê re sand û wî teyrî qulek di laşê wî de çêkir û wisa Adem karîbû destava xwe û derketina xwe bike û bîna wî fireh bû."

Ligel ku xwarina genim gunehekî pir giran bû, lê Xwedê mecbûr bû çarakê jibo zêdebûna insanî bibîne. Her tîstek sedemeke wî heye. Tîstek jiber xwe ve çênabe. Ev planê Xwedê mecbûrî bû, ku gunehkariyek bikevê. Yanî gunehkariya însanî hêne ji destpêka avabûna dinyayê ve heye. Êzîdî dibêjin: "Em evdên Xwedê yên serres gunehkar in." Ji me gistan diyar dibe, ku jiyana me insanên niha liser ruyê erdê bi xêr ra Tawisî-Melek çêbûye û emê dawî jî herine ber destên wî.

Em gişt pê dizanin, ku genim weke xwarincke bingehîn e (esasî ye) jibo însanan ji mêj ve. Belkî kevintirîn xwarin e. Êzîdî ji genim re dibêjin „Xwarina bihistê". Di cejna „Batizmiyê" de, ya ku Êzîdiyên Çêlkaniyê yên hêla Hevêrkan di herêma Çiyayê Bagokê, Qelaçê Dasikan, dle geliyê Çemê Cerehê nêzîkî Tirbsipiyê û hindek di Çiyayê sengalê de pêktînin, Êzîdî rengekî nan çêdikin jêre dibêjin "Sewik". Çîroka van Sewikan jî wisa hatiye gotin: „Dibêjin ku pîrek hebû, jêre digotin Pîr Arî. Vî pîrî jiyana xwe liber kela Derdîlê nêzîkî Heskîfê derbas dikir û perestina xwedê dikir. Wisa dibêjin, ku ew hate nava Êzîdiyên çêlkaniyê li çiyê Bagokê. Piştî ku wî keremetên xwe ji Êzîdiyan re diyar kirin û Êzîdiyan baweriya xwe pê anîn rabû şikeftek (mixarek) ji xwe re dît û têde rêz û rismên ola xwe bi cî tanîn. Ev şikeft jî li Çiyayê Bagokê heye

Kurdên Êzîdî her sal di serê herdu mehên çile (12/1) de cejna Batizmiyê pîroz dikirin û diçûn şikefta pîr Arî (Piyalî) û serê malbatê pezek, bizinek, karikek, kavirek anjî ciwangak dibire wir û jibo vê cejinê û piyalî gorî dikirin. Para cejina piyalî heft perçe gost ji heft cihî ji lasê wê heywanê bû.

Dibêjin pîrejineke jincbî û kurekî xwe yê bitenê pîr belengaz û perîşan bûn. Di roja Batizmiyê de ji feqîrtî nizanîbûn çi bibine hizûra piyalî. Lawik gote diya xwe:"Dayê, çî li malê heye, ku ez bibime şikefta Piyalî?"

Pîra diya wî gote kurê xwe, ku bes hindek ervan (ard) û hindek tewaş (bez, dohin) gundiyan xêra xwe dane wan, li malê hene. Diya vî radibe wî ervanî dixe hevîr û liser sêlê sor dike û reyên wan sewikan bi wî bezê helandî liber ku hilma tifikê sor dike. Ji wî hevîrî heft nan çê dibin. Ji serma dinyayê lawik her heft sewikên xwe dixe bin abayê xwe û diçe şikefta piyalî.

Ji dûr ve dibîne, ku gel ketine rêzê (dorê), ew jî kete dorê, lê şermê laş û ramanên wî xwarin. Dibêjin ku Piyalî qencê Xwedê bû û jêre diyar bû, ku ew belengaz nanê xwe ji şerma xistiye bin abayê xwe. Li wir gazî wî dike, li gel ku dora wî nehatibû: "Lawikê şivan(a), ew tistê di bin aba ne, min qebûle bi gostê berx û berana (n)." Ji we demê û pê ve, Piyalî li hemû Êzîdiyên Çêlkaniyê ferz kir, ku her Batizmî pêwist e, ku ew heft sewikan jî, ligel heft perçên gost, heft çiran, heft kulm (lep) mewîj çêbikin. Jibo çêkirina sewkan pîrê wî welatî mecbûr e çend rojekî berî Batizmiyê li malên Êzîdiyan bigere û hevîrtirş ji wan re bibe.

Êzîdî heya ji xêra miriyên xwe re dibêjin „Nanê Miriyan". Xewre anjî Xewlêr baweriyek wisa heye, ku ev tradisyon hêne ji dema Someriyan ve heye. Lê ti rastiyên dîrokî di destên me de nînin. Bi kêmasî ev edet ji mêj ve li cem Êzîdiyan heye. Ev nan di cejna Xidilyas de çêdibe bi pêxûnê (Poxwînê) re.

Kevaniya malê hevîrekî distire û nanekî mezin jê çêdike. Yek heb (lib) mêwîj di nava hevîr de dihilîne (winda dike) û nan sor dike. Malxuyê malê pêwist e, ku raje wî nanî û liser pista zarokekî xweyî bi xelat (çi keç, çi kur) bixe du perçe. Perçê pêşî ji Xwedanê wê malê re ye. Heke ev malbat mirîdê Şêx Mend be, perçê pêşî ji Şêx Mend re ye, heke Şêxûbekir be, ji Şêxûbekir re ye ûhw. Perçê diduyan ji malxuyê malê re ye. Perçên din ji nefsên malê re ne. Ew mewîja di nava nan de para kî bikeve, dibêjinê ew yê bi xelat e.

Pêwist e, ku malxuyê malê xelatekê bi wî veke anjî diyariyekê bide wî.

Xewre çênabe di wextê sorkirinê de biske anjî derz bikevê. Heka hat û derz keti, dibe ku tistekî nebaş were serê wê malc.

www.arsivakurdi.org

Qewlê Firwara Melik Şêxisin

QEWL

Veda berê sibê, Ezizo veda
Mêr û Melekên badikine, kekê Şêx Zendîn
di ersê Sema de
Bila ew Feqîr bên, yên Xerqe û hilên kanî
Ew Siltan Şîxadiyê Mîrê min e,
ji ewil heya bi ebede.

Veda berê sibê, Sewane sipî ye
Mêr û Melekên badikine, kekê Şêx Zendîn
ji er sê a'lî ye
Bila ew Feqîr bên, yên di ber de
Xerqe û hilên kanî
Zora ji vê xirabê fenî ye, hilgirtibûn heyîf
û cor zor talî ye.

Veda berê sibê, Sewane geş e
Mêran û Melekan badikine, kekê Şêx Zendîn
ji sira ji ersê
Bila ew Feqîr bên, ew´ên diber de Xerqe
û hilên kaniyê res e
Zora ji vê xirabê fenî ye, hilgirtibû heyîf,
cor û zor xeberên nexweş e.

Veda berê sibê, Sewane zer e
Mêr û Melekan badikine, kekê Zendîn ji ersê raser
e
Bila ew Feqîr bên, yên Xerqe û hilên kanî liber e
Zora ji vê xirabê xenî ye hilgirtibû, heyîf, cor û
zor xeber e

Veda berê sibê, Sewane sor e
Mêr û Melekên badikine, kekê Şêx Zendîn
ji ersê jor e
Bila ew Feqîr bên, yên di ber de Xerqe
û hilên kanî bi mor e
Zora ji vê xirabê fenî ye, hilgirtibû zor
heyîf û cor e

Ev Qewl Bedel Feqîr Hecî ji cem bavê xwe Feqîr Hecî nivîsiye.

Qewlê Gêla Şêx Mend

QEWL

Seywane kesk e.
Tê bêhna ji bixur û res rihan û misk e.
Yar Gêla ser sorgula rawestbûn bisk e.

Subeke kesk e, sewan e.
Her du Şabiskêt Gêlê ji heyzeran e.
Yar Gêlê liser sorgula bisk rawestane.

Çi subeke sewane zer e.
Tê bêhna ji bixur û misik û enber e.
Yar Gêlê ser sorgula narîn bisik rawestane lisere.

Li me hilatibû sitêra subeha.
Gêl qendileka li nava qubeha.
Yar Gêlê tu babî li her çar dergeha.

Sitêra berê subehê li min hiltatin, sitêr e
Her du Şabiskêt Gêlê ez bim heyran.
Yar Gêlê te eqrebî ber dayne
Cer coteki sere.

Sitêra ber Subehê ez dîme.
Hilatim ji qedîme.
Yar Gêlê ji xelkê were ez, giravî me.

Ev Qewl Bedel Feqîr Hecî liber destê Feqir Xidir Berkat Keso nivîsîye.

www.arsivakurdi.org

Weşana Hebûn û tunebûna Êzîdiyan

KEMAL TOLAN

Min jî wek neferekî civata ola Êzîdîyan xwast netew û ola xwe nasbikim. Di vê babetê dîroka netewî û ola xwe de gelek pirsên min hebûn. Dilê min xwast, ku ez zanîbim, ka ew mêrxasên Êzîdiyan, yên ku zordaran xwe ji wan didan pas, di Kurdîstanê de xwediyên kîjan erdan bûn û ka wan çewa û ji kengê ve liser erda xwe dijiyan? Gelo jiber çi neyarên netewa Kurdan hêjî dibêjin: "Jiber ku Êzîdî ji çand û ola xwe ya kurmancî re xwedî derdikevin, gerek e, ew zimanê di devên wan de bêye birîn!"

Jibo ez karîbim bersiva van pirsan bidim, min gelek pirtûk, lêkolîn û berhemên liser vê olê xwandin. Vêga gihîştim vê baweriyê: Kesên ku ji dîroka Kurdîstanê agehdar in, ew zanin, ku ola Êzîdiyan ola Kurda ya herî kevin e. Jiber ku dijmin timi ji Kurdên Êzîdî ditirsiyan û jibo ku bikarîbin Êzîdiyatiyê ji holê rakin, navbera wan û olên cînar da neyartiyê derxin, wan tiştên nerast derheqa Êzîdiyan de bela kirin: "Êzîdî ne Kurd in, Êzîdî qûresî ne, Êzîdî ji hovan bawer dikin, kitabên Êzîdiyan yên pîroz tunin, kî neferekî Êzîdî bikuje, ew dê guhnê xwe di axret û îmanê de afobike û ew dê li dinya dinê here bihuştê û w.d." Wan bi vî haweyî, bêhêjmar Êzîdî di Kurdîstanê û di welatê xwe de bi xayîntî kuştin û qetil kirin. Çiqas ziyaret, parezgehên Êzîdiyan wêran bûn, gelek qewil û duwayên me hatin ji bîr kirin.

Wexta ez li dîrokê dirênim, dibînim, ku babetê rewşa Êzîdiyan gelekî kevin û berfire ye. Hinek ji dîroknas, lêkolînvanên Kurd , Êzîdî û biyanî liser rewşa jiyan û ola Êzîdiyan gelek tişt nivîsandine. Ez bawer im, ku piraniyan wan nivîskar û lêkolînvanên ku liser dîroka Êzîdiyatiyê berhem derdixin û diwesînin, bi xwe ne Êzîdî ne, berhemên wan ji aliyên ilmên Êzîdiyatiyê ve jî pir qels in. Wan zaniyarên xwe jiber devên sexsên menfaêtçiyên gelên cînar, Kurdên paşwerû û Êzîdiyên normal bi riswetê standine. Ev yek tê xwiyanî kirin, ku gelek ji wan pirtûk û lêkolînên liser rewşa Êzîdiyatiyê hatine nivîsandin, piraniyan wan wekî peymaneke ku di nava duheb berên lidijî hevûdin bin û her yek ji wan dixwaze hinek armancên xwe bi cî bîne. Bi siklî ev berhem hatine nivîsandin. Heta îro jî hinek kesên ku ji xwe re dibêjin „Ez rewşenbîr û niviskar im", bi teybetî li nava tevgera rizgarîxiwaza gelê Kurdîstanê de ne û ew naxwazin ola Êzîdî weke oleke serbixwe nasbikin. Jibo ku ew karibin ola Êzîdî hêjî bêrûmet bikin, ew di şîrove û nivisên xwe de ji xeynî nerastiyê tistekî di yên rast jibo şîrovekirina dîrokan olan Êzîdiyatiyê zelal nakin. Ev kes dibêjin: „Êzîdî Mithraîzimî, Mazdaîzimî, Zerdûştî, Sabî, Buddhîzimî ne û hwd. Êzîdiyatî jiber ola Cuhûyan, Mesîhiyan anjî ya Musilmanan zêdebûye. Êzîdî ji Dêw, Hova, Cinikan û wd. bawerdikin." Ez ji wan kesan dipirsim, gelo jiber ku roja Êzîdiyatî çêbûye û heta îro, ew welatparêz in, ew ji Xwedayê bitenê bawer dikin û ew timî dijî dagirkerên welatê xwe derdikevin, lewma Êzîdî „hov in"?



Hebûn û tunebûna Êzîdiyan

Wek hun jî dizanin, di wan demên ku ferman li Êzîdiyan rabû û Êzîdî koçber bûn, hingê rojname, radiyo û telîvîzyon tunebun. Xwandin û nivîsandin ji Êzîdiyan re kiribûn guneh. Piraniyan wan bûyer û fermanên bi serê Êzîdiyan hatin, bigotin û stranên dengbêjan di nava gelde de hatin xwiya kirin. Eşkere ye, ku gelek serpêkhatiyên Ezîdiyan hene, hêjî kes nizane, ka ev bûyer jibo çê qewîmîn, sedemên van bûyeran çi bûye, yên hatî diyar kirin jî, gelek caran ne birastî hatin diyar kirin û şîrove kirin. Bi hezaran tistên me yên bas, di singên dengbêj û kalemêrên me de bin êrd bûn û em hew karin îro wan bûyeran derxînin. Min gelekî xwast ku ez nav û hejmaran waqas eşîrên heliyayî û esîrên ku qulibiyî tesbît bikim. Lê çavkaniyên berfire di derheqê wan de ne ketin destê min. Min dîsa jî li gorî zanebûn,

www.arsyakurd.org

Weşana Kitêba Êzidiyatiyê

PÎR XIDIR SILÊMAN

Êzidiyatî wek wane jibo fêrxwazên Êzîdiyan cara yekemîn me li sala 1994 wek piroje bi alfabêta Latînî berhevkir. Di sala 1996'an de wergêra wê ser alfabêta Erebî me pêskêsî wezerata perwerdê li herêma Kurdistana Iraqê kir û hate pesendkirin ku fêrxwazên Êzîdiyan li qutabxanên devera xwe bi sêweyekî fermî bixwînin. Piştî du salan hatî xwendin komîteka mamosteyên wanebêj ew kitêb bijarekirin û jibo cara didoyan hate çapkirin. Heya niha li wir tê xwendin.

Çaxê Mala Êzîdiyan li Oldenbûrgê ji min xiwast, ku ez kursekî fêrkirina zimanê Kurdî û naskirina Êzîdiyatiyê ji fêrxwazên Êzîdiyan re vekim, dilê min bi vê pirojê xwes bû. Jibo vê yekê jî min bernamek berhevkir li ber ronahiya kitêba xwe ya naskirî bi taybetî çapa bijare - heke cudayek di nêva naverokê wê kitêbê û eva niha liber destên we jî hebe, ji wê yekê hatiye ku me rewşa vir hinekî raçav kiriye.



Kiteba Êzidiyatî

Jibo rêxistina babet û qewarê kitêbê jî me ev kitêb kiryc sê pisk, her piskek jibo kursekî şeşmehî ye. Jibo gotina babetan jî, jiber ku piraniya fêrxwazên me Laliş û ew rê û rismên lê têne kirin ne dîtine, em jibo şîrovekirin û bêtir ronahîkirina wan rê rismân bi taybetî yên li Lalişê têne kirin pena dibine ber kasêtên vidiyoyê daku bi çavên xwe Laliş bibînin û xweştir fêrbibin. Lew hîvî dikim her mamosteyekî wanên vê kitêbê ji fêrxwazan re bibêje, ew jî jibo babetên navbirî pena bibe ber kasêtên vidiyoyê.

Peyva Mala Êzîdiyan

Yek ji armancên xebata Mala Êzîdiyan xwedîderketina li zarok û ciwanên Êzîdiyan e. Armanca me ew e, ku ciwanên me li welatên xerîbiyê zimanê xwe, rê û rismên Êzidiyatiyê, axa welatê xwe û Lalisa Nûranî ji bîra nekin. Jiboku em bikarîbin bigihîjinc armancekê ji van armancên xwe yên giring, pêwist û pîroz me biryar stand, vê berhema nivîskar û mamostê Êzidiyatiyê, bi rêz Pîr Xidir Silêman biwesînin.

Em hêvîdar in, ku xwandekarên me liber ronahiya vê berhemê bêtir Êzidiyatiyê nasbikin û bastir hînî zimanê xwe bibin.

Hun karin Kitêba Êzidiyatî ji Kovara Dengê Êzîdiyan bixwazin

E-Mail: ezidiyati@yezidi.org

his û taqeta xwe ya bi destûra Xwedê û Tawisî–Melek bi taybetî liser rewşa Êzîdiyên bakurê Kurdîstanê, yên ku piraniya wan vêga ne liser axa bav û kalan dijin, rawestiyam. Min bi alîkariya hinek camêr û dengbêjan, yên ku min navên wan di dawiya pirtûkê de birêz kiriye, navên hinek gund, êl, eşîr û qebîlên Êzîdiyên ku hetanî van salên dawiyê man, tesbît kirin. Min da diyar kirin, ka wexta Êzîdî li wellatê xwe bûn, ew li kêdera Êzîdîxanê diman? Berî dema ku ew derkevin dervayî welatê xwe, ka ew çend eşîr bûn? Xwedanên wan kî bû? Ka nandarên Êzîdiyan yên hingê û hetanî îro kî ne? Çend esîrên wan îro hêja li xerîbiyê dijîn? Dîsa min hinek helbestên xwe, yên ku min liser rewşa me nivî sandin jî, pêskêsî zanistiya xwan devanên hêja kirin.

Pirtûka "Hebûn û Tûnebûna Êzîdiyan, tev romanên zindî ne" jibo dewlemendiya dîrok, ziman û edabyata Kurdî, liser hebûn û tûnebûna ola Êzîdî hat nivîsandin. Bi hêviya ku hinek ji dîroknas û lêkolînvan dê karibin ji vê xebatê fêde bikin û ew ji wan re bibe pêpelûkek, ku ew karibin zaniyarên zêdetir û berfiretir liser wan babetên destê nivîskar ne gehîstê, kombikin û biwesînin.

Ezê gelekî dilxwes bibim, gava ku pitûka min bibe pêpelûkekî piçûk jibo fêrbûna „demên derbas bûyî, ne jibo vê yekê ku êdî ew derbas bûne, lê jibo vê, ku ew dema derbas bûyî nikaribûye pasmayînên xwe bide paqijkirinê" çewa ku V. O. Klûçewski dibêje.

Hun karin Kitêba min ji Kovara Dengê Êzîdiyan bixwazin.

www.arsivakurd.org



Kovara Roj

Ji weşanên Bingeha Lalis
ROJ Journal, Postfach 11100
D-30103 Hannover
http://www.yezidi.net
E-Mail: roj@yezidi.net



Kovara Laliş

Ji weşanên Bingeha Lalis Dihok
http://www.duhok.net/Lalish
E-Mail: lalish_govar@yahoo.com



Laliş

Ji weşanên Bingeha Lalis FÊKA
Brandenburgerstr. 42
Bielefeld
http://www.lalis.de,
E-Mail: info@lalis.de
Fax: 0521-1369344



Kovara Çira

Ji weşanên Dezgeha Êzîdiyan li Holanda
Suleiman H. Ibrahim
Borodin Str. 6, 1323
NR-Almere Niederlande
Fax: 0031368444996



Das Volk des Engel Pfau

Die kurdischen Yeziden in Deutschland
Sabiha Banu Yalkut-Breddermann
Das Arabische Buch GmbH
ISBN 3-86093-275-6



Perestgeha Laliş

Ji berhevkirina Heso Himî pêk hatiye

www.kurdvakurdi.org



Bazîdê Bastamî

Bi zimanê Erebiye
Ji nivîsîna Rêsan Hesen
Hewlêr, 2000



Serhatiya Reşo û Xensê

Komkirin û berhevkirina Rêsan Hesen Dihok, 1999

Qedemguhastina Bavê Çawîş

REDAKSYON

Bin Ademo hezar salî temam key
Mîriyatiyê li şerq heta bi şam key
Dumahiyê her dê ji kasa mirinê tam key

Bavê Çawîş yêku navê wî Pir Kemal kurê Pîr Meran bû, ji çîna Pîrên Pîr Alî bû. Ew di sala 1920 de li Çiyayê Şengalê hatibû cîhanê. Diyar ê, ku qedera wî bû xizmeta Mala Şîxadî.

Dibêjin ku birayekî wî dikeve ber mirinê. Pîr Kemal jî hewar û gaziya xwe digihîne Xwedê û Tawisî-Melek û dibêje: „Heke li birayê min bê rehmê û ew ber bi xêr bibe, ez jî soz û qirarê didim, ku ez heya saxim bibime xizmetkarê Mala Şîxadî. Dibêjin Xwedê li birayê wî hate rehmê û Pîr Kemal jî li soza xwe xwedî derkeft. Sala 1947 û bi temenê xweyî 17 salî bi esq qesta Lalişa Nûranî dike û xwe liber Xwedê diskîne û ciwaniya xwe bi qurbana vê Mala pîroz dike.

Li Lalisê dimîne û xwe fêrî qewl û beytan dike. Pistî çend salekî dibe weke sûngirtiyê Bavê Çawîş û pasî weke Bavê Çawîş hate xelatkirin.

Bavaçwîsî jî pilyeke ji mertebên xizmetkarên Mala Şîxadî ye. Vêca wî guhdaneke bas û hêja li Mala Şîxadî dikir. Ew her û tim guhdan li dar û berên Geliyê Lalisê dikir û bi hezaran şitlên daran çandin û sexberiya wan dikir.

Bavê Çawîş yek ji semakêsên Geliyê Lalişê bû ligel Civata Ruhanî, di hilkeft, îd û cimayan piskdarî di rê û rismên pêşkeskirina Şîlan û Simata Mala Şîxadî de dikir.

Ew bûbû yek ji sembolên Mala Şîxadî li Geliyê Lalisê. Tim ew di pêsewaziya mêvanên Lalişê de bû, gelek ji têkiliya mêvanan dikir û bi teybetî mirovên biyanî û rojhilatnas. Bavê Çawîs bavçakekî hij xwe kirî bû, her dev li ken û sihbetxweş bû. Êdî bi rastî ew kulîlka sebrê bû li Geliyê Lalisê. Lewma jî tevayiya Êzîdiyan û mêvanên Lalişê jê hes dikirin û pir xêr pê dikirin. Ew jî ew xêr dicivand û pê derûdor û avayiyên Lalişê nûjen dikir.

Bavê Çawîş her xêrxwazê gelê xwe bû û di xwesî û reşiyê wî de bû. Her û tim qewetî li ciwanên Êzîdiyan dikir, ku ew bixwînin, daku bêtir çavên wan vebin û rastî ronahiya zanînê bibin. Ew bixwe fêrî xwendin û nivîsînê bûbû.

Mixabin Bavê Çawîs li roja 22.10.2001 qedem guhast û çû liber rehma Xwedê. Em tucar wî jibîr nakin.

Ew li rê, Em li pê, Em hemû bo nik Xwedê!

www.arsivakurdi.org

Fermanê Tilxatûnê - Buyereke dîrokî

ZÎWERÊ BAVÊ ARAS

Qîrîn ji mêjuya Tilxatûnê tê guhan! Tilxatûn gundekî kevinar e, ew ji dema Împeratoriya Osmaniyan ve ava ye û li bakûrê biçûk, Kurdistana Suriyê, li herêma bajarê Qaşmilo liser çemê Cerehê dikeve. Gundê Tilxatûnê, weke ku em Kurdên Êzidî wî bi nav dikin, pir nêzîkî sinirê Kurdistana mezin e.

Di dema Osmaniyan de û heya nêz jî ew milkê malbata Hanê Fatê bû. Jêre digotin Serekgund Yaqûbo. Gund bixwe di destên Xaçperestan (filan) de bû û tede nêzîkî 50 malbatan jiyana xwe derbas dikirin.

Di warê civakî de û di nava civata kurdan de jinrevandin şermezarî, rûreşî û qebhetekî giran bû. Mêrekî ji êla, ji esîra, Beraziyan jinek revand. Ji vê sedemê jî ew û kurapê xwe xwînî (firar) bûn û xwe avêtin tor û bextê malbata Hanê Fatê. Demeke xweş li cem wan mirovan man û bûn rêncber û navmaliyên van xaçperestan. Ji yekî ji wan re digotin Hecî Şêxê.

Herdu kurapên wî bi navên Ûsivê Mirêd û S. Birhê dihatin nav kirin. Bi vî rengî çend sal derbas bûn, heya fermana qira Xaçperestan 1915 – 1917 hat. Fermana wan bi destên Osmaniyan di bin stara Îslamê de rabû. Pir mirovên bêguneh û bêgazin ji wan hatine kuştin, gundên wan hatin wêran kirin, roj bi roj ber bi tinebûn û qelandinê ve çûn.

Erda dora gundê Tilxatûnê dest e, ne çiya ye. Ji tirsa kuştin û fermanê xaçperestan dixwestin birevin çiyayê Bagokê, Tor Abidîn û ew li stara xwe digeriyan. Du sedem hebûn, histin ku ew birevin:

1. Çiya asê bû û wan dikarîbû xwe têde veşêrin û biparêzin.

2. Pir Xaçperest li wî çiyayî diman.

Lê Hecî Şêxê, ew bixwe kurdê misilman bû, digote wan, ku ew li vî gundî stirî ne û tu tirs liser wan nîne. Hecî Şêxê digot: "Gundê xwe bernedin, xwîna me çend misilmanên gund bi ser xwîna we de ye, emê rih û canê xwe jibo we fida bikin." Wan ji Hecî Şêxê bawer kiribû û ji gundê xwe bar nekirin. Roja din Hecî û Ûsivê Mirêd çûn cem qaymeqamê Nisêbînê, Qidûr Beg. Herduyan jêre gotin: "Xaçperest di gundê Tilxatûnê de hene û pêwist e, em planekî jibo kuştina wan deynin, berî ku ew birevine çiyê." Wan baweriya Qidûr Beg anîn û wî tima kirin û gotin wî: "Zêr, ters û talan ji te re, lê em dixwazin erd û axa wî gundî liser navên me tapo bibe."

« Îro Xaç e, çûran e, ka kengî virc e vêran e." Mebesta wan ji vê gotina bi qirêj piryî xirab bû." Wan bi wê manê digotin, ku îro fermana xaçperestan e, lê gelo kengî dê fermana Êzîdiyan be. »

Qidûr Beg jî nemerdiyê nake û radibe nêzîkî sed romiyan (eskeran) bi xwe re dibe û bi ser gund ve digire. Gundiyên Xaçperest hemû li hewşa Muxtar kom kirin. Mêrên gund hemû bi werîsekî ve girêdan û ji wan re gotin, ku ewê berê wan bidine Seferbelekê. Bi vî awayî wan ew mirov dane ber xwe û birin.

Ew esîr û rebenên bêguneh birin heya nêzîkî bestekê (newalekê), ku ji wê re digotin besta kûr. Ew nedûrî gundê Tilxatûnê bû. Li wê bestê hemû dane ber devên tivingan û singoyan û bê dilsewatî hemû kuştin. Êdî vegeriyan gund û gotine jin, keç û zarokan:" Bibêjin, kanî zêr û perên we, emê we bibine cem mêrên we Seferbelekê. Piştî wan zêr û malê xwe derxistin, van mêrkujan ew jî dane ber xwe û li eynî newalê kuştin. Ji hingî ve heya îro ji wê bestê re dibêjin "Besta Kuştiyan" û di wê gava qirkirinê de leskerê Osmaniyan: "Îro Xaç e, çûran e, ka kengî virc e, vêran e." Mebesta wan ji vê gotina bi qirêj piryî xirab bû. Wan bi wê manê digotin, ku îro fermana xaçperestan e , lê gelo kengî dê fermana Êzîdiyan be.

Gundî hemû li wê bestê kuştin. Ji hemuyan jinek nekuştin. Wisa diyar bû, ku ew jineke bedew û lihevhatî bû. Hecî Şêxê ew li xwe mehir kir. Dilê Birhê ketibû yekê ji wan, lê wê xwe bi dev wî ve bernedida. Roja kuştinê ew ne li gund bû, ew çûbû aş. Çaxê gihişte gund, dît, ku gund vale bûye. Dibêjin, ku ew çû

www.kurdishakuri.org

wê bestê û bi çavê serê xwe dît, ku heya bi ev jin jî, ya ku wî jê hiz dikir, kustine. Ew radibe bi mirîtî diçe balê. Qidûr Beg zêr û perên wan ji xwe re birin û pez û dewar dabû Hecî Şêxê û pismamên wî.

Milkê gund liser navê xwe û pismamên xwe tapo kir. Pistî demeke kurt rewşa welat hate guhartin û ferman ji ser Xaçperestan rabû. Qidûr Beg rabû piṣka xwe ya erd firote Rexda jina Çeçanê Haco. Pistî kirîna wî perçê erd malbata Haco hin bi hin hevalbendên xwe xistine gund û bi hemû sêweyan hewl dane xwe, ku Hecî Şêxê û pismamê wî Ûsiv ji gund derxînin. Herdû berdane hev, heya ku tu çare ji wan re nema ji xeyna revê. Berî hingî Hecî Sêxê bi xapandin birin dezgehê mehkemê, jibo ku ew îmza xwe bavêje pelên Qoçanan. Tapokirin, ku malbata Haco sêpar ji erdê gund kirîne. Bi vî rengî Ûsiv ji gund deranîn û Hecî Şêxê xistin muxtar. Lê ne di demeke dirêj de ew ji muxtarîyê avêtin û yekî Êzîdî ji êla Hevêrkan di şûna wî de xistine muxtar.

Ev kuştin û fermana van mirovan anîbûn serê van birayên me xaçperestan tucar neyê ji bîr kirin. Hêjî gel ji wê herêmî vê kustinê tîne ser ziman û liser wê besta kustiyan diaxive. Ev kar dê her weke moreke reş di dîroka wan mirovan de bimîne! Ew nayê ji bîr kirin.

Heke mirovên gunehkar vê wehşetiyê û hovîtiyê ji bîr bikin jî, lê Xwedê û Tawisî-Melek ji bîr nakin.

Wergerandin ji zimanê erebî: Şewqî Şemo.

Êla Afşiyan û Omeriyan

ŞEWQÎ ŞEMO ÎSA

Bûyereke Kudî dil diêşîne, weke ku apê Mûro Hisêne Xutkê ji me re dibêje.

Di sala bûrî de xortekî ji Ela Afşiyan xwe bi destên xwe kuşt û ez jî weke mirovekî ji vê êlê pêwist bû, ku herim serdaniya wan camêran li bajarê Salzuflen (Almanya).

Hêja ez nigihîştim bajar, malbata min têlefonî mala kurapê min li wir kir û dibêjin, ku jineke Xaltî ji gundê Qorixê ji herêma Bişêriyê çûye dilovaniyê û ferzeke ferz e, ku ez herim wir jî. Ya sitar bê lome be, heke mirov ne ji êla mal xezûrên xwe be.

« Kîwexê nêzîkî Midyada niha ye û di wilayeta Mêrdînê de ye. Di dema niha de û pîştî Êzîdî ji Çiyayê Bagokê reviyan Ewropayê, Kurdên misiliman ketin vî gundî û navê Kîwexê danin "Îslam Köyü. »

Kurapê min Zehredîn û Apê Mûroyê Hisênê Xutkê herdûyan bi yek devî gotin: "Em te bitenê bernadin û bi te re werin Serdaniya mirovên te yê ji Bisêriyê." Rêya me jî heya bajarê Wesel nêzî 2 saetan diksîne.

Em ketin ser rêya xwe û jibo dema me derbas bibe, min gote apê Mûro: "Apo, çîrokekê, çîvanokekê anji bûyerekê ji dema bûrî tu nikarî ji me re bibêjî?" Wi got: "Li gorî texmîna min ev bûyera ku dixwazim ji we re bibêjm, berî 250 salî çêbûye. Ji mêrxasekî Afşiyan re digotin Mihoyê Mirê. Dibêjin, gava bavê wî çû dilovaniyê, hingê Miho Zarok bûye. Lewma wî bi dayîka wî Mirê bi nav kirin. Pir ji Êzîdiyan bavên wan di şerên olî de hatin kiştin û sêwî man. Ji Xezûrê min re jî digotin Hizniyê Xanê. Bavê wî jî di fermana dawî de hate kustin û diya wî bi xwedîkirina wî rabû. Babdara vî xweşmêrî wisa ye: Mihoyê Simo, Simoyê Hisên, Hisênê Derwêş, Derwêşê Şihab. Şikefta ev bûyer têde çêbûye milkê Şihab bû û carcarna Miho bixwe têde rûniṣt û jiyana xwe derbas dikir. Dibêjin, ku Derwêş temenê wî gihiste 9o salî. Êla Afşiyan berî niha bi Êla Kelikan dihat naskirin, ew jî jiber navê pêsiyê wan Kaliko. Ev mirov jî di dema ferman û wêranan de ji welatê xwe Serhedê -ev gotin ji gotina olî Sed û Hed ji dema Şîxadiyê nemir hatiye - reviyabû û tevî her sê zarokên xwe û malbatên wan qesta gundê Xaçperestan – Kîwexê - dike. Ev gund nêzîkî Midyada niha ye û di wilayeta Mêrdînê de ye. Di dema niha de û pîştî Êzîdî ji Çiyayê Bagokê reviyan Ewropayê, Kurdên misiliman ketin vî gundî û navê Kîwexê danin "Îslam Köyü."

Apê Mûro mijûliya domand: "Şihab li gel kurê xwe yê biçûk û malbata wî li Kîwexê man, kurê wî Nehroz çû gundê Afsê. ... Afsê jî nêzîkî gundên Omeriyan dive. Pistî demeke xweş hejmara van her sê malbatan zêde bû û der û dora wan çavreşî avêtin

www.arsivakurd.org

wan û timayiya malên wan kirin. Sedemek ji wan sedeman jî ew bû, ku ew Êzîdî bûn û ne ji ola wan êlên li dora xwe bûn."

« Bi tehivdana nokerên hevalbendên Komara Osmanî wan misilma- nan dixwastin bi wêrankirina Êzîdiyan ji Êla Afşiyan destpêbikin. »

"Bi tehivdana nokerên hevalbendên Komara Osmanî wan misilmanan dixwastin bi wêrankirina Êzîdiyan ji Êla Afsiyan destpêbikin. Jibo vê armanc û mebestê Êla Omeriyan mêrek ji nava xwe sandine gundê Afse. Vî jî wisa dabû xwiya kirin, ku wî berê xwe ji êla xwe guhertiye û ne li hev in. Afsiyan wî xistin kirîvê xwe yê xwînê, li gorî daxwaziya wî. Tucar nedikete bîra wan, ku dilê vî mirovî li tîra wan res e û ew serxwaz û li bêrûmetiyê digere. Û jibo ku baweriya wan bikire, gote wan, ku ewê ciyên Omeriyan nîşan wan bike û hingê ew dikarin ters û talan, pez û mal ji wan bistînin. Vî kirîvî ew bas xapandin."

"Dibêjin, ku 7 mêr ji Afsiyan û ji nav wan Mihoyê Mirê xwe kar kirin, rahiştin tivingên xwe yên kurmanci û qesta vî ciyî kirin. Wan dabûn pey kirîvê xwe yê Omerî. Piştî ku gihiştin şikeftekê raserî gundê Xirbê Miskan, Kirîvê wan gote wan, `ew razin bê xem û xeyal û tivingên xwe pispêrine dereke şikeftê.`"

Bi dengekî hêdî û nerm Apê Mûro got: "Ez ji we re çi bibêjim, hemî tivingên xwe dispêrin dîwarêkî ji yên şikeftê, bitenê Miho destên xwe li tivinga xwe pêçayî dihêle. Ev Kirîv xwe bi hêncetekî jiber çavên wan hinda dike, ku ew ji wan re here nan û avê bîne. Û wisa ew winda dibe, heya xew li wan giran dibe û dibe şeveres. Ew vedigere şikeftê û bi dizî di lûlên anko di boriyên tivingan de mîz dike û pêre barûdê şil dibe."

"Mebesta wî ji vî karî ew bû, ku dema êrisa Omeriyan lidijî van her heft mirovan dest nehilînin û tivingên wan neteqin. Ji hêla din ve pir mêrên Omeriyan bi çek li hêviya gotina wî kirîvê xayîn bûn. Berî berbanga sibê Omeriyan êrîşî her heft mirovên di şikeftê de kirin", got Apê Mûro.

"Êzîdiyan nikaribûn berxwebidin, bitenê Miho dest hiltîne, lê pistî vê kustina bi bêbextî Mihoyê Mirê sond, soz û qirar li rih û canê xwe dabû, ku ew heyfa van xwesmêran li erdê nehêle. Jiber ku wî ew herêm qul bi qul, şikeft bi şikeft, şikêr bi şikêr nas dikir, karibû bitenê ser bike. Mihoyê Mirê heyfa xwe hilanî û tirs û hêbeteke mezin xiste dilên Omeriya. Omeriyan dîtin, ku wan çi bi serê xwe nîne û çar û micala wan jiber Miho tinebû, lema jî jihevre gotin, ku ji wan re bastir e, heke ew bi Afşiyan re asîtiyê deynin û lihevhatinê bixwazin.

« Ji wê demê heya roja îro herdûyan gotina kirîv qedexe kirin û jihevre dibêjin "Pismam". Ew peymana biratiyê hêja jî di navber ra herdu êlan de ber- dewam e. »

Di pêsya xwe de qasidekî xêrxwaz şandin û Afşiyan gotin, ku ew ji pêşî ve dijiminatiya wan nedixwast, lê bêbextî ji aliyê wan ve hat."

"Heyeteke mezin li gel jinekê, ya ku 2 birayên wê bi destên Miho hatibûn kuştin, dixwast Miho bi çi awayî be jî bibîne. Dibêjin, ku vê heyetê nêzîkî li gûndê Afşê kir û rastî cotarekî bûn. Ew perçê erd hêja jî bi erdê Bena Darê binav dibe, jiber ku dareke beniyê benîşt ji ava darê çêdikirin. Wan silav li vî cotarî kirin û nizanîbûn, ku ev cotarî Miho bixwe ye. Wî jî ji wan re negot. Wî jî dabû pêsiya wan û ew birin şikefta xwe, ya beri hingê ji wan mîvanan re rast kirinbûn", domand Apê Mûro.

"Dibêjin, ku Afşiyan pir qedir ji wan re girtin û rûmet dane wan. Piştî ku Miho wan bire wê şikeftê, çû mala mirovên xwe û cil û çekrihelên xwe li xwe kir û hate civa. Ew jina ku 2 birayên wê hatibûne kuştin, got: "Mala Xwedê û Pêxember ava be, ku ew, yê herdu zarokên min kustin, mêrxas e û bi rûmet e." Piştî hewqas birakujî herdu êlan aştî li nava xwe danîn û peymana biratiyê bi cî anîn. Ji wê demê heya roja îro herdûyan gotina kirîv qedexe kirin û jihevre dibêjin "Pismam". Ew peymana biratiyê hêja jî di navber ra herdu êlan de ber- dewam e."

"Jibo ku Omerî armanca dilê safî bidin xûyakirin, gotin Afşiyan, ku hasila, bêşa, gundên "Ser Derî" û Xirbê Miskaşan ji wan re ye. Lê Êzîdiyan pistî demeke pir kurt, standine vê bêşê birîn, jiber ku xaçperest di herdu gundan de bûn û Êzîdî û xaçperestan pir ji hev hezdikirin û nedixwastin, ku ew pêwendiyên xwes ji nave wan rabin. Piştî sed salekî jineke omerî hate gundê Afşê û dixwast bizanibe, kî ji mala Sînikê maye. Gundiyan gotin, ku yek

www.arsivakurdi.org

mirov maye û ew jî "Hesê" ye. Wisa diyar e, ku wê jinê Hesê neeciband, pistî hewqas nav û dengê vê malbatê."

Wê jinê gotina xwe ya mesûr ya bi nav û deng got, ew gotin jî heya îro jî tê gotin: "Wî li min be, li min bê kesê, heke ji mala Sînekê mabe Hesê, Jibo ez porê xwe kur bikim, ji min re bînin meqesê."

Apê Mûro digot: "Şewqî, ma ne bes e, belkî min mejiyên we bi axavtina qulquland. Bejeycke din di dawiya vê axiftina xwe de dixwazim bibêjim: Gelacî ji navber ra me Kurdên Êzîdî û birayên me Kurdên misilman divê rabe. Mebesta min ji vê axiftinê ev e, ku serok û rêberên me Kurdan pêwist e, ku aştiyê û biratiyê bajon û bes hevdu ji xêrnexwazan re bêxînin. Bala xwe bidinê, bav û kalên me, yên nexwendî û nezan bûn, lê soz û bext di navbera wan de hebûn. Ji hev û din bawer bûn. Ez mirovekî gundî me û min mekteb û dibistan ji derve dîtiye, lê rabûn û rûniştina rêxistinên me ne di xizmeta welat de ye. Wisa em tucar nagihîjin mafên xwe. Aqilê partiyên me, ma gelo bi qasî aqilê me Afsiyan û pismamên me Omeriyan nakisîne?"

Pir buyerên wisa li welatê me çêbûne, lê belê piraniya wan winda bûne. Em ji gelê xwe dixwazin, ku buyerên wisa ji redaksyona Dengê Êzîdiyan re bibêjin anjî bişînin.

Navnîşana tekiliyê

E-Mail: Isa@yezidi.org

Şewqî Şemo Îsa jiber devê Apê Mûro girtiye

Êzidiyatî û erkên rewşenbîrên Kurd

KEMAL TOLAN

Serax û binaxa Kurdîstanê di bin destên dagirkeran de ye. Wisa jî qedexe danîne ser nav, nasname, ruh û zimanê me. Jibo ku ew karibin gelê me ji dîrok û netewetiya wî dûr bixin, bi her haweyî me ji holê rakin, çi xirabî ji destê wan hatiye, kirine û niha jî dikin. Her çiqas koledaran xwastibe sertên ku em karibin xwe wek evdên kurdên Êzîdî nasbikin, ji ortê hilinin jî, û nehîstibin, ku em li dîrok û mîrata bav û kalên xwe re xwedî derkevin, lê dîsa jî nikarîbûne pêşiya me bigirin. Gava ku mirov bixwaze, mirov kare dîroka xwe û kultura nasbike, her çiqas ev yek zor be jî.

Di rûpelên dîrokê de zelal xwiya ye, ku di dema destpêka civaka mirovatiyê şûnde, hinek mirovan berjiwendiyên xwe yên şexsî di ser yên Xwedayê seranser re dîtine û ji hingê ve mirovên zordar peyda bûne. Wan hêja di wê demê de xwe wekî "Xwedayê qenc (baş) û xirab (nebaş)" anjî fikra ku "Xweda liser rûyê erd û ezman gelek in û ne yekî seranser heye" dane diyar kirin. Van nijedperestan jibo menfêate xwe hebûna Xwedayê seranser, yê ku me û cîhan afirandiye, înkar dikirin. Jibo ku ew karibin daxwaz û berjiwendiyên xwe di her demê de zêdetir bikin, ew timî lidijî evdên ku ji Xwedayê bitenê bawer dikin, derdiketin û wan xwe ji Xwedayê seranser re wek şirîk didîtin. Ji Xweda ve xwiyanî ye, ku em Êzîdî ji berê ve ji Xwedayê bitenê û ji wekîlên Xwedê (Milyaketan; Tawisî-Melek û w.d.) bawer dikin. Gava mirov destê xwe deyîne ser vîjdanê xwe û rast bibêje, eşkere ye, ku me Êzîdiyan bi vê baweriya xwe ya Êzidiyatiyê çanda Kurdî jî liser piyan hîştiye. Lewma jî pêşiyên me timî ji aliyên olperestên menfêatçî û koledaran ve hatin talan kirin û qir kirin.

Kesên ku ji dîroka Kurdîstanê agehdar in, ew zanin, ku ola Êzîdiyan ola Kurda ya herî kevin e. Kevinbûna dîroka Êzidiyatiyê di stran û folklora kurdî û di ilmê ola me de zelal xwiyanî ye. Zane û ilimdarên olan baş dizanin: Ji roja pêsdaketiya Êzidiyatiyê heta vêga gelê me her baweriya xwe bi Xwedayê seranser bitenê aniye. Jiber ku Êzîdiyan ev baweriya rast parastine, timî xof û rahm di dilên wan de hebûye. Êzîdiyan jiber vê baweriya xwe ya paqij ticaran zulm û zora dînî li olên din û netewên cînarê xwe nekirine. Ez gihîştîme vê baweriyê: Jibo mirov bikaribe dîroka Kurdîstanê zelal binêre, sert e, ku mirov pêsîn welatperweriya ola Êzidiyatiyê qenc nasbike!. Dema mirov bala xwe bide dîroka Kurdîstanê, dibîne, ku bi sedan dagerker hatine ser axa Kurdîstanê û çûne. Gava ev ji Kurdîstanê

www.arsiwakurd.org

derketine, wan hingê gelek ji dewlemendiya Kurdîstanê bi xwe re birine. Gelek ji wan li Kurdîstanê de mane, ew heta îro jî li pêsiya tevgera rizgariya Kurdîstanê bûne asteng. Jiber van bîr û baweriyên teng, yên ku mirovan ji Xwedê mezintir dikin, gelek çewtî û valeyiyên mezin ketin nava dîroka Kurdîstanê. Dijmin timî ji kurdên Êzîdî tirsiyane û ew ji xwe re neyar dîtine, pêşîn her xwas tine Êzidiyatiyê ji holê rakin, lewma jî dinavbera Êzîdiyan û olên cînar de neyartiyê derxistine. Wan her wextî tiştên nerast derheqa Êzîdiyan de gotine:"Êzîdî ne Kurd in, qûreşî ne û ew ji hova bawer dikin. Kitabên Êzîdiyan yên muqedes tinin. Kî neferekî Êzîdî bikuje, gunhê wî di axret û îmanê de were afu kirin û ewê li dinya dinê here bihustê û hwd"

« Êzidiyatiyê mafê xwe heye, ku ew jî wek Musilmaniyê û Xiristaniyê ciyên wan yên oldariyê hebin û serbixwe bin û di wan dêran de proganda rêxistinên polîtîk nebe. Partî û rêxistinên polîtîk nabe, ku ola Êzidiyatiyê ji xwe bikin alêtê polîtîka xwe. »

